Navenda Lêkolinên Kurdi

# KURDISTANA İROYİN

(problemên tevgera netewi)

Institut kurde de Paris

Weşanên Roja Nû

Institut kurde de Paris

Navenda Lêkolinên Kurdi

# Kurdıstana İroyin

*(Problemên Tevgera Netewi)*

Institut kurde de Paris

Liv. 7757

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Reçu le 06/05/2021

Weşanên ROJA NÛ

OFFERT PAR JOYCE BLAU

Weşanên Roja Nû : 45
Çapa yekem : Tirmeh 1998

Adres : Gustavslundsv. 168 A, 1 tr
167 51 Stockholm/Sweden

Tel : 46 (08) 26 23 75
Fax : 46 (08) 25 38 57

ISBN 91 7672 044 6

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Reçu le

Navenda Lêkolinên Kurdi

# KURDISTANA İROYİN

(Problemên Tevgera Netewi)

Institut kurde de Paris

WEŞANÊN ROJA NÛ

Yên ku ji bo çapê amadekir: Ünal Yardımcı

Institut kurde de Paris

Pêşgotına weşanxanê

Weşanxana ROJA NÛ, paş "Almanaxa Kurdi" berhemeke dın ya ku Navenda Lêkolinên Kurdi hazır kıriye, çap dıke.

Dı pırtûkê da gotarên zanyarên Rus û Kurd cih dıgrın; bı gotıneke dın ew, berhevokek e. Ilmdaran dı gotarên xwe da, bı çaveki ılmi problemên tevgera netewiya Kurd ya nûdemi analiz dıkın; bir û baweriyên xwe dı vê derheqê da tinın holê.

Gotarên ku dı vê pırtûkê da cih dıgrın, berê bı zmanê Rusi hatıye amadekırın û lı Moskovayê hatıye çapkırın. Û paşê ji hatıye vergerandın. Em ji vergera wan a zmanê kurdi çapdıkın.

Tirmeh 1998

Weşanxana ROJA NÛ

Institut kurde de Paris

## SERECEM

Pêşgotına weşanxanê ..................................................... 5
Pêşgotına Navenda Lêkolinên Kurdi ................................. 7
Bırrê 1
DOZA KURDİ (Bınyad, pêşveçûn û rewşa nûdemi)
**M. S. Lazarêv** ............................................................. 9
Bırrê 2
KURDISTANA BAŞÛR LI SER RÊYA
ÇARENÛSA NETEWİ
**Ş. X. Mıhoyi** ................................................................ 38
Bırrê 3
KURDÊN TIRKİYÊ RADIBIN ŞERKARİYÊ
**(M. A. Hasratyan)** ........................................................ 61
Bırrê 4
KURDISTANA İRANİ Dİ KOMARA İSLAMİ DA
**O. İ. Jigalina** ................................................................ 90
Bırrê 5
FAKTORÊ KURDİ Dİ SÛRİYA NÛDEMİ DA
**A. H. Bagirov** ............................................................. 125
Paşgotın ........................................................................ 150

Institut kurde de Paris

## Pêşgotın

Sal bı sal doza kurdi bêtır bala xelkê ber bı xwe dıkşine. Çarenıvisa nêziki si milyon Kurd, yên ku lı ser qada netewi ya bav û kalên xwe dıjin, bı dırêjıya bêtır jı 2500 sali û roleke wan a berçav heye dı geşbûna dirok û kûltûra gel û welatên Asya Rojava da, lê jı dewleta xwe ya netewi mehrûm ın û mêrane xebat dıkın jı bo azadi û serxwebûnê. Helbet kes nıkare xwe jê bê hay bıke, ne lı welatên rojava ne rojhılat, nemaze ew kesên bı canê dêmokratik û azad perwerde bûne, em Russiya û komarên Yekıtiya Sovyeta berê jı nav wan cuda nakın. Lı nık Russiya pırsa kurdi bı taybeti gıring e û berjewendiya wê geleki bılınd e dı çareserkırına doza kurdi da, angori prensipên mafê çarenıvisê, ku lı cihanê hemi hatiye pıjırandın, jı ber nêzikiya gêografi ya Kurdıstanê û bı saya teqalidên çand û diroki. Bı rasti Russiya dıhate hesabkırın weke welatê kurdolojiyê çawa ilmeki serbıxwe yê rojhılatnasiyê. Û heta demeke ne dûr, nıvisandınên heri hêja û buhagıran dı vi warê ilmi da lı Russiya hatıbû weşandın.

Dı bın bandoriya hın sedemên berçav dı vê dema nû da hın şıkestın û bê tevdiri ketın warê kurdolojiyê. Mırov dıxwaze hêvi bıke, ku ev rewş dem kurt be. Dıgel wısa ji, çapkırına lêkolinên zanyari yên tırxanbûyi jı muşkılên politiki yên Kurdıstanê re, yan bo xusûsiyetên bızava netewi ya kurdi dı 20-30 salên vê dawiyê da, gelek gırıng û gerek ın. Ev berhevoka ku em pêşkêşi dadgeha xwendevanan dıkın hewldaneke jı wi wari ye.

Institut kurde de Paris

Jı ber çend sedemên ne vindar me nekarıbû vê berhevokê çapbıkın dı wexta wê da. Lê disa ji naveroka wê, lı gor ditına me, hê aktûwal e (nûdemi ye), nemaze hın gotarên wê nûjen bûn lı gor demê heta dıgıhê rojeva me.

Navenda Lêkolinên Kurdi

<u>Kora dirokvanên nıviser:</u>

*Bırrê 1:* Profêssor **M. S. Lazarêv**

*Bırrê 2:* Endamê Akadêmiya Armêniya, Profêssor **Ş. X. Mıhoyi**

*Bırrê 3:* Profêssor **M. A. Hasratyan**

*Bırrê 4:* Doktora zanıyariya diroki **O. İ. Jigalina.**

*Bırrê 5:* Kandidatê zanyari, **A. H. Bagirov.**

Institut kurde de Paris

# DOZA KURDİ
## (Bınyad, pêşveçûn û rewşa nûdemi)

M. S. Lazarêv

Heta demeke ne dûr pırsa kurdi hêj nebûbû têma hoyê ragıhandınên cemaweri. Ew mabû, bı awaki gıştî, dı nav gêreke teng a pısporên rojhılatnasan de û politologên ku, taybeti bı pırsên Rojhılata Navin mıjûl dıbûn. Cenga Delava Farısi balkêşiyeke *gıring û mezın* derbareya Kurdıstan û pırsa kurdi de peyda kır lı hofkên rojava û rojhılat û lı gêrên birûrayên cihanê. Lê baweriyeke şaş e, ku mırov vê rewşê dı nêrineke berjewenditiyê de bıbine û şıroveke. Dı rastiyê de, bıhanên aktûalkırına doza kurdi dı vê demê de awayeke himi dıgırın, xudan regezên diroki û kûr ın. Herêma ku gelê Kurd lê dıji, herdem warê dıjwariya politiki bû, ewa ku dı vê dema me de sırûştane gıhaşte nuqta xeterê.

Eger mırov bıxwaze sedema heri sereke ya vê dıjwariyê dıyarbıke, bê guman dê bêje: jıhevperçebûna siyasi ya gelê Kurd û encama wê, nebûna dewleta Kurd a serbıxwe ye. Mılletê, ku diroka wi ya etni dıgıhê 2500 sali û ew bı xwe xudanê wê zeminê ye, ku jı kevnare de lê dımine, herdem mafê wi tunebû serbest bıji û rêça geşebûnê bo xwe dayne. Herdem wêraniyên gıran bı ser de daweşine dı encamê cen-


Institut kurde de Paris

gan, êrişan, parçekırın û parvekırına welatê wi de, û jı destê sıtemkariyên netewi yên cûre-cûre. Mırov dıkare bêje, ku Kurd herdem hevparê hemi bûyerên diroki bûn, ewên ku lı Rojhılata Navin dıqewımin, vi cigehê ku bû dergûşa çand û kûltûra cihanê, gelek salar û serdarên navdar dane cihanê. Û para wan dı çanda gelên herêmê de ne kêm bû, belkû bêhemta bû.

Kurdan qe qima xwe bı rewşa xwe ya diliti û sıtembarıyê netanin, herdem xebat dıkırın da ku serbest û azad bıjin. Ev e taybetiya diroka vi geli, ango ew xusûsiyeta ku gırêbendeke êtnonefsi, canê azadperest û serbestixwaziyeke bêrawestan lı ba Kurda peyda kıriye.

Ev e sedema sereke ya peydabûn û geşebûna bızava azadixwaza kurdi, ew bızava ku dı gelek qonaxan re derbasbûye dı rêça geşebûna diroki û dı nûdemê de gıhaştiye sıncırandıneke zor. Lê jı bo ku mırov xusûsıyetên doza kurdi nasbıke û şıroveke, rola wê bınerxine dı rewşa cihani û nûdemi ya nehesan de, pêwist e em dıyar bıkın wan faktorên ku ev doz jı wan pêkhatiye û bûne sedemê vê dıjwariya tund.

## 1. Faktorên Gêografi

Kurdıstan (yani, "welatê Kurdan") dıkeve herêma rojava, başûra bejaya Asya, ango ew warên ku pıraniya obsolût (mutleq) yan pıraniya nısbi (selefi) ya xelkên (bıneliyên) wan Kurd ın. Kurdıstan ne naveki dewleti siyasi ye, lê tenha naveki etnogêografi ye. Lewra ji ne hêsan e mırov sinorên wê dıyar bıke. Dı navbera xêza 34 û 40 yên panahiyên bakûr û 38 û 48 dırêjayi ên rojhılat, dı nêva herêma rojava ya Asya de Kurdıstan jı rojava ber bı rojhılat ve dırêjaya wê dıghê nêzi 1000

km. Jı bakûr ber bı başûr ve jı 300 heta 500 km. Panaviya Kurdıstanê dıghê 450 hezar $km^2$ (lı Tırkiyê bêhtırê 200 hezar $km^2$, lı İranê bêhtıri 160 hezar $km^2$, lı Iraqê 75 hezar $km^2$, lı Sûriyê nêzi 15 hezar $km^2$). Kurdıstan, welatê Kurdan ê diroki ye; ew cigehê, ku pıraniya gelê Kurd lê dıji. Lê jımarê Kurdên dereke (derveyi Kurdıstan) ji ne kêm e. Çendan sedhezar Kurd lı Xorasanê dıjin, 200 hezar lı Sovyeta berê, bêhtır jı 150 hezar Kurd lı İsrailê dıminın. Nêziki milyonek penaber, pırê wan lı Ewrûpa Rojava dıminın. Gelek jı wan bı çalakiyên siyasi yên aktiv radıbın. Lewra ji dı warê gêografi de pırsa kurdi jı çarçıva Kurdıstan derbaz dıbe.

Taybetiya heri sereke ya rewşa gêopolitik ya Kurdıstanê ew e, ku Kurdıstan berdewam navpara sinorê du-sê dewletan bûye imperiyên (Romi, Vizanti, Osmani, Xelifeta Erebi û İran). Pışti ku Pıştderê Kavkas kete nav impêriya Rûsi, sinorên êtnogêografi yên Kurdıstanê yekser gıhaştın yên wê û hın kesên Kurd ketın nav sinorên Rûsiya. Pışti Cenga Cihanê ya Pêşin, xakê Kurdıstanê lı çar dewlatan belav bû; Tırkiye, İran, İraq û Sûriya, du dewlet jı wan (İraq û Sûriya) demeke dırêj dı bın kontrola siyasi û abori ya Inglıstan û Fransa de man.

Dêmek, Kurdıstan bı warê xwe yê gêopolitik endamane kete nêva jina siyasi ya hundur û ya dereke û pêwendiyên navnetewi yên Tırkiyê, İranê, İraqê û Sûriyê. Rewşa lı Kurdıstanê û lı herêma hawira wê, jı aliyê gêopolitiki ve yekser bala hın dewletan -Sovyeta berê û welatê Ereb yên ciranradıkêşe.

Jı aliyê leşkeri ve warê gêopolitiki ya Kurdıstanê taybetiyên dimenê sırûştiyê wê balê ber bı xwe ve radıkêşın, nemaze pıraniya qada wê, çiya ye. Mıştaxên çiya xakê vi welati jı hev tarmar dıkın bı dırêjayi û pahnaya wi ve. Lewra jı Kurdıstan mina keleheke zor mezıni sırûşti ye, bandora bızavên

Institut kurde de Paris

makina leşkeri ya rûzemini dıji Kurdıstan pır hındık e, nagehên nişanên xwe. Her wıha ji ev şırûtên han gelek alikar ın bo şerê partizaniyê, jı ber ku çıyayên wê bı dar ın û newalên wê kûr ın û bêhejmar ın. Serpêhatiyên çendan sal yên serhıldanên dıjwar diyar kıriye, ku leşkerên nızami zû bı zû serdestiya xwe ya amadê û çekdariyê wenda dıkın gava dıkevın cengê bı partizanên Kurdan ra, ewên ku çêtır hini sırûşta herêma xwe bûne.

Dewlemendiya sırûşti ya Kurdıstanê, hoyeke gıring e jı faktorên doza kurdi. Helbet, neft dı pêloka pêşin de tê. Nefta Kerkûkê (Kurdıstana İraqê) bı pırraniya xwe û awayê xwe gırıngiyeke cihanê dıbine. Neft lı navçeyên dın ji, lı Kurdıstana İraqê derdıkeve (lı herêmên Mûsılê û Xaneqinê), wısa ji, lı ya Tırkiyê (sêçıkê Xerzan, Germık û Raman), lı ya İrani (herêma Kermanşah) û lı ya Sûriyê.

Problêma neftê ya Kurdıstanê xudan taybetiyên gıring ın. Ya pêşi jı wan: erzaniya bê hemta ya derhanin û guhestına wê, nemaze ya Kerkûkê. Birên neftê lı vır rêkoreke cihanê da ye bı dewlemendiya xwe, (bı dayina neftê jı her mıtreke kolayi û bı kılfeta derhanina her bermilek neftê). Gelek erzantır (eger berhevkeve; guhestına neftê bı gemiyan dı Qenalê Sıwêsê re yan lıdor serê Hêviya Xêrê (başûrê Afriqiya) û barkırına wê jı qeraxên Derya Sıpiya Orta zemin ku jı Kerkûkê dı lûla ra neft dıghê beravên rohılatê vê behrê. Xusûsiyeta dûwem ya vê dozê ew e, ku lı Tırkıyê û Sûriyê nefta kurdi yekta ye, bıli wê hiç kanigehên digerên ardûyê ruh nin ın û jı İraqê ji kanigeheke himi ye (heta demeke ne dûr, beri derxıstına neftê lı başûrê, lı wır ji tenha kurdi bû).

Xusûsiyeta sısyan ew e, nefta Kurdıstanê nêziki mezıntırin herêma nefta cihanê yê. Delavê Farısi, ango çı gorrinek bıkeve rewşa nefta Delavê Farısi, wê yekser bandoriyê lı nefta

Institut kurde de Paris

Kurdıstanê ji bıke, û berevaji.

Nabe mırov lı xêrûbêrên sırûşti, yên mayin, lı Kurdıstanê bı nêrineke kêm temaşe bıke. Lı Kurdıstana Tırkiyê fılızzê kromê derdıkeve, ku navdar e lı cihanê, wısa ji fılızzê sıfar û hesın. Lê lı parçê Kurdıstana Başûr (İraqê), beri demeke ne dûr, kanigehên dewlemend yê fılızzên ûrani hatın ditın. Şertên gelek baş lı Kurdıstanê hen ın jı bo durustkırın û geşkırına berhemên darıstana û aboriya çandıniyê. Vehêjeke (ıhtiyat) mezıni abori ya hêzê şipan, hêzên rûbar û çemên Kurdıstanê yêd bêhawe mezın ın. Lı Kurdıstana Tırkiyê tenê bêhtıri 90 milliard kw. saet heye.

Bı vi awayi, çı dı warê gêopolitiki da (yê leşkeri ji dı nav da) û dı yê xêrûbêrên sırûşti (dıgel bıkaranina wan, yan ji twanayên wan) Kurdıstan bûye herêmeke gıring û buhagıran ne tenê dı Rojhılata Navin, lê dı cihanê gışti da.

Institut kurde de Paris

## 2. Faktorên Etnodemografi

Çendi dimenê Kurdıstanê, bı pıraniya xwe çiya ye, lê disa ji bı saya deşt û nıhêlên wê yên dewlemend hejmara mırovên lı ser her $km^2$. Pêlûkeke orte dı nav welatên Asiya da dıgre (45 mırov /$km^2$). Lı gor texmıneke gelek rast jımarê xelkên Kurdıstanê dı dema nuha da bêhtıri 25 milyon mırov ın. Hejmara Kurdan ji ne kêmtıri vê reqemê ye.

Şexsiyeta netewi û pêşveçûna mılleti ya Kurd weke hev; zanısti (ılmi) û sıyasi ne. Pêşveçûna mılli-netewi ya Kurdan dı rewşeke bê hemta û dıjwar re derbas bûye, herdem dı şırûtên parçebûna sıyasi da bı hoya sinorên dewletên çar hawêr. Lewra ji netewa Kurd, ku taze pêkhatiye, bı saya qewarekarên etni yên himi, hê ne yeksa ye, mozayka wê hê zor dewlemend e.

Mebest, pêşi her tışti, zıman e. Nêziki 60% Kurdan lı Kurdıstana Bakûr û Rojava, Rojava, Başûr-Rojava û hınek jı ya navendi lı Tırkiyê, İranê, Sûriyê û parçeyê Bakûrê Kurdıstana Başûr dialekta (zarava) kurmanci bıkartinın û bı awaki sereke bı tipên latini dınıvisinın. Lê nêzi 30% Kurdan lı Kurdıstana Başûr û Başûr-Rojhılat (İrana Rojava û Başûra Rojava; Bakûr-Rojhılat û Rojhılatê İraqê) dıpeyıvın û dınıvisın bı dialêkta sorani (bı tipên erebi). Bıli van, dı nav Kurdên Zaza da dı herêma wilayeta Dêrsım, lı Kurdıstana Tırkiyê, ku ew bı xwe Elewi ne, zaravê zazi, ango dımıli dıpeyıvın û bı latini dınıvisinın. Lê lı herêma Kermanşahê (Baxtaran) dı nav Kurdan da dialêkta gorani (bı tipên erebi) bıkartê.

Çendi ku zaraveyên goti jı hev cawazın ne tenha bı tipên nıvisandınê, lê bı hın formên gırameri ji, emma dısan ev rûdan nabe sedemê ku êdi Kurd jı hev fam nekın, çunke ew cawazi ne wıqas mezın ın. Kurd bıxwe balkêşiyeke wıha mezın nadın vê rûdanê, qet qebûl nakın, ku roleke parçekırına etni jê ra hebe. Hê bêhtır, dı çarçıvê wan dewletên çarhawir da yekitiya Kurdan pêktê bı saya zanina du zımanan û sê zımanan; zımanê sereke yê dewletê (tırki, farısi yan erebi). Zanina du-sê zımanan lı nava Kurdan tışteki normal e, nemaze dı nav wan Kurdên ku xwenda ne û lı bajêran dıjin. Dıgel vi tışti ji, disan ew sêncên zaraveyan, mina dıyarkerê kevnaretiya cıvata Kurdan, dıminın weke faktorên ne tenha xudan mebest û gıraniyeke kultûri, lê politiki ji. Çarenıvisa gelê Kurd ya diroki wısa bû, ku ol (din), nemaze dı vê nûdemê da, heyhat karıbe bıbe hoyek bo pêkanineke etnê jı Kurd ra. Çendi Kurd, kıri bı tevaya xwe ve musılman bın û pıraniya wan ji sunni ne. Cıvata Kurd, ya teqlidi, hê behtır ya nûdemi ne ewqas korewerê olperestê ye. Jı vê bêhtır, ol ne tenê Kurdan nake yek, car heye ku wan jı hev dûr dıke. Bı pêlûka

Institut kurde de Paris

yekem dı warê çandê û exlaq da. Mebesta me pê Kurdê şii ne, (pıraniya wan alikarê mezhebê Ahlê Heqq ın, yan Eli-İlahi ne. Lı Tırkiyê nısbeta wan dı nav Kurdên mayin da 20-30%. Û Kurdên Yezidi, ku lı ser ola pêş-islami, bı awaki giştî ola xwe dıparêzın. Dı vê olê da hın baweriyên olên Rojhılata kevnar dıminın.

Dı vê dema me de cawaziyên oli û etnokûltûri lı ba gelê Kurd hiç mebesteke bıryardar nagırın dı terazûya borcên wan yên sereke de, ango çalakiyên politiki û têkoşina azadixwaz. Lê bêguman, pêvajoya cıvandına etni ya gelê Kurd ew bı derengi dıxe. Dıjmınên wi yên der û yên nav xwe vê rewşê bıkartinın.

Heta nuha, hin pırsên yeksatiya etni ya gelê Kurd dıminın objêktê guftûgoyê û derûneke naverokên politiki werdıgırın. Yek jı van pırsan ew e, ku Lor û Bextyaran, ku lı Başûr-Rojavayê İranê dıjin, bı Kurd dıjmêrın.

Dıgel hebûna nêzikiya etni ya bêguman dı nav Kurd, Lor û Bextyariyan da ji, bı hemi saloxan, heta yên zıman ji, yeksayetiya etni dı nav wan da gelek caran şırovekırınên cûre-cûre derheqa wan da rûdane.

Lê dıgel van pırsa tevan ji, pırsa "Kurditiya" Lor û Bextiyaran nabe qapat bıbe, çunke pêvajoya êtnonetewi ya tevaya Kurdıstanê û tıxûbên wê hê berdewam e û berê wê û rêbaza wê dı nûdemê de hê kes nızane, hela çawa dıbın.

Kurd bûne "objêkt" û "xud"ên pêwendiyên netewi (etnopolitiki), pırsa netewi; kevırê qoziyê ye dı diroka gelê Kurd da, ya nû û ya nûjen. Pırsa vi gelê duali ye; fıreh û teng. Doza kurdi ya netewi bı awayê fıreh; dı welatên ku Kurd ketıne nav sinorên wan yên dewleti, û awayê teng; pêwendiyên netewi dı Kurdıstanê bı xwe da. Dı vır da ji pêwist e xusûsi-

Institut kurde de Paris

yetên taybeti yên wan em dıyar bıkın.

Kurd mezıntırin kêmasinetewe ye dı hemi başûr-rojavayê Asya da û belki dı hemi welatên Kurdıstan dı nav wan da belav e. Tenha lı İranê ew jı Azerıya hındıktır ın, lê berevaji wan, Kurd kêmtır ketın bın bandora bışavtına farısi û lewra ji lı pêlûka serti ya jina netewi, pêşi hemi dı warê politiki da, Kurd dıkevın pêşiya hemi kêmnetewên İranê tevan.

Bı saloxên xwe yên netewi Kurd bı xurti cawazın jı wan gelên ciran, yên fermandar (Bı zıman, nemaze lı Tırkiyê, İraqê û Sûriyê; bı olê, lı İranê û hıneki lı İraqê û Tırkiyê; bı pêkhatına cıvaki, bêhtır lı İranê û İraqê). Ev cawazi dıbın astengên xurt dı rêçên pışaftına Kurdan dı nav netewên Tırk, Ereb û Farısan da, lema ji bûne kanigeha şer û nelıheviyên êtni yên dıjwar.

Rewşa etnonetewi û etnodêmografi lı dewletên ku Kurd lı wan belaw ın û lı Kurdıstanê bı xwe xudan lebatek û guhartıneke taybeti ye. Hejmara gıştı û pıraniya hêwırandına Kurdan hatın guhartın dı bın bandora, beri her tışti, faktorên politiki da. Kurd gelek caran tûşi qewıtandın û gênosidê bûn û dı encam da qada wi kete bın gorinên mezın, û gelek mırov ji candan. Dı vi wari da bırçiti û halê ji rola xwe dıditın.

Dı qonaxa nûdemi da bandorıya rewşa siyaseta bêpergal lı problêma êtnodêmografi dı herêma kurdi da ranewestiye (bı taybeti lı ciyên serhıldan û çalakiyên bızava azadixwaza kurdi), çendi ku belki jımarê wan kêmtır bûye ji. Vê rewşê wa kır, ku bandoriya faktorên cıvaki-abori lı pêvajoka dêmografi deha xurtır bıbê, çawa lı hemi welatên "Alema Sêhem". Lewra dı nav Kurdan da ji zêdebûneke sırûşti berçav dıbe; nêziki 3% her sal, dı encamê da jımarê gelê Kurd baş zêdetır bûye.

Institut kurde de Paris

Bı vi awayi, em dıkarın bêjın, ku Kurd mezıntırin "kêmasinetewe ye" dı Asya Rojava da, neteweke heri mezın lı cihanê ku bê mafê çarenıvisê maye heta iro.

Kurd dı welatên hêwıriyê da ne mina hev bı ci û war bûne. Pıranıya wan lı Tırkıyê dıminın (nêzi 47%). Lı İranê Kurd nêzi 32%, lı İraqê nêzi 16%, lı Sûriyê 4%, lı komarên Yekitiya Sovyêt 1%. Lı Kurdıstanê bı xwe (dıgel ku sinorên wê tenha texmini ye) jımarê Kurd lı gor hın nıvıştan jı 84 heta 94%, lı gor hınên dın nêzi 74%-79%. Dêmek lı Kurdıstanê pıraniya obsolût Kurd ın.

Gorrinın ketın pêkhatına nıjadi ya Kurdıstanê dı 1000 salê dawi da bı hoya pêvajoyên politiki yên mezın. Dı encama gênosid, bûyerên çekdari û tevdirên şovinistên deshelatên Tırkiyê lı Anatoliya Rojhılatê, ango Kurdıstana Bakûr dı heqiqet da cemawerên Ermeni jı kok ve neman, terazû ya etni yekser bû lı aliyê Kurdan. Lê êtnosê kurdi ji êşiya dı encama qewıtandınên cemaweri da, ku fermandarên Tırkıyê bıkar anin dı salên 20, 30 û bı saya wan qewıtandınan etniya Tırk yekser mezıntır bû. Lê etnosa kurdi derveyi çarçıva welatê xwe bı awaki fırehtır hêwıri û lı wır hin ji têne pışavtın dı nav Tırkan da.

Guhartınên pêkhatına êtni lı Kurdıstanê têne kırın dı roja nıha da ji, bı taybeti lı der û cıhên ku bızava netewi ya kurdi lê bı hêz e.

Lı Kurdıstana İraqê û ya Sûriyê fermandarên welat tevdirên bı armancên taybeti bı ci tinın dı cıyên ku gırıngiyeke stratêgi ya wan heye (bı awaki sereke) lı herêmên nêzi sinoran Ereban tinın ciyê Kurdan.

Bı vi awayi, çendi ku Kurd pıranya obsolût ın ji, lê êdi maddeyek êtni peyda bûye, ku dıkare dıjberiya netewi bine holê.



Institut kurde de Paris

Lê ew bûyêrana nıkarın lı wan welatên ku Kurdıstan lıhev parvekırıne, buhayê doza kurdi, wek dozek netewi û sereke, kêm bıkın yan ji, jı rêbaza wê derxinın.

## 3. Faktorên Cıvaki-Abori

Heremên kurdi lı Tırkıyê, İraqê, İranê û Sûriyê xudan asteke nızm e dı geşebûna abori, têkeliyên cıvaki û rêxıstınên cemaweri de, wısa ji ya kûltûri. Eger mırov wan bıde ber gelên van welatên bı awaki gıştî û bı taybeti, bı navçeyên wan ra, ewên pêşvaçûyi. Ev rewş şırovebe bı wan sedemên deha dıjwar, yên nav xwe û yên derva, ku gelê Kurd tuşi wan dıbû bı dırêjaya hemi diroka xwe ya dûr û kevnar (cengên bê dawi, raperin, bêdengi, şıkestına rêçên bazırgani yên teqlidi ku dı Kurdıstanê ra derbas dıbın, dawi û belki ev heri serekebe ji, nebûna dewleta xwa ya netewi; ev şertê heri gıring bo her pêşveçûnekê).

Rêxıstına cıvaki ya cıvata kurdi hê saloxên kevnare dıparêze. Hê dı wê da paşmaveyên pêvendıyên malbati û eşiri eşkere dıyar ın, dı çarçıva vê rewşê da sistema fêodali ya teqlidi hê rola xwe dıbine. Ev pêvendiyên cıvaki yên kevnare dı hemi heykelê cıvata kurdi da heye, dimenê xwe yê nemalışti dıde etnopsikolojiya gel.

Rasti goti, bı saya bandoriya peşveçûna nûdemi dı cıvata Kurd da, nuha pêvendiyên kevnare jı cıvata kurdi zû-zû wenda dıbın. Dı herêmên Kurdıstanê da, ewên ku hıneki pêşveçûyi ne, tenha biranin maye jı pêvendiyên malbati-eşirtıyê.

Lê dıgel wısa ji, dı hın cıyên Kurdıstanê, pêşveçûna cıvaki-abori hê rêça xwe nû vedıke. Ew formên teqlidi yên cıvaki êdi wêneyê roja buhurti ye jı welat re. Helwestên abori û



Institut kurde de Paris

bandori ya sıyasi yên malbatên dunyevi û oli êdi hıldıweşın, lı Kurdıstanê çin û qatên cıvaki yên serdemi peyda dıbın û ci dıgırın mina bûrjûwaziya bazırgani û senetkariyê (lı gund û şeheran) û çina karkıran.

Gorinên pêşverû dı cıvata kurdi da bıngeh danin jı bo peydabûna nasyonalizma kurdi, ya sıyasi û idêoloji û bı hêzbûna wê. Lê paşmaveyên awayên teqlidi cıvaki hê astengarî peyda dıkın lı pêşiya modern kırına cıvata kurdi.

Serokên teqlidi yên Kurdıstan nûdemi bı malbata xwe; paşmaveyên gêrên fêodali-oli û eşiri ne, û heta nuha ji bandoriya xwe ya dıyar dı aboriyê, nemaze siyasetê û idêolojiyê da dıparêzın. Rasti goti, dı nav liderên Kurdên nûdemi da gelek peyrewê bir û baweriyên demokratik û rêbaza çep henın. Jı vê bêhtır, ew ın, yên ku rûyê cıvaki-politiki yê gelê Kurd û bızava wi qeware dıkın.

Lê bandoriya politiki-ramyari û teqlidên kevn, wek berbertiya oli, partiti, ciwari, rûmetiya malbati û gêrên cıvaki û tımayêndeshelati û serdanin lı pêşiya serokên navdar. Ev e sedemê wan bûyerên xırab dı jina cıvaki da, mina qulopaziyên politiki û bêprinsipi, cengên bırakuji û h.t.d.

Helbet, saloxên berçav yên paşketına pêvendiyên cıvaki gırêdayine bı bıngehê aboriya kevnar û kêmafırandın ve û nemaze dı vê demê da, ku guheztına jı kevnaretiya ber bı sermıyandariyê, ber bı nûdemiyê ve ketiye rewşeke krizê.

Demên koçeriyê êdi neman (gava dı germê da bı çıya ve bıjor dıketın û zıvıstana da dadıketın newalan) û bıngehê aboriya teqlidi ya cemawereki zor jı xelkên Kurdıstanê wısa bû, mêtodên aktiv dı aboriya gundan da nebıhêsani dıbûn. Senet û tevdirên geşebûnê lı Kurdıstanê kêm pêşve çûne, û ci jı bo karkeran zor hındık e, ne angori pêwıstiyên gundiyên mal-

Institut kurde de Paris

wêran bûyi ne. Kurdên ku bê kar û hoyên jinberdewamiyê mane, berê xwe dıdın şeheran û bêhtır jı yên Kurdıstanê, dıçın yên navendên mezın lı welatê ku lê dijin û wısa ji bo welatên dereke. Lı wan dera jı ber nızmıya asta hosteyi û bêxwendıniya xwe, Kurdên penaber karê bêpıspori dıkın, dıkevın bın barê kedxurıyeke dıjwar. Bı kurti, herêmên kurdi têne temaşekırın, çawa rexên paşmayi dı hemi welatên ku Kurdıstan lıhev parvekırıne.

Dı warê cıvaki-abori da gelek elametên (nişanên) kedxuriya kolonyali ya qada Kurdan lı ber çava ne, ew kedxuriya ku dıbe bı destê çinê gelên fermandar lı Tırkiyê, İranê, İraqê û Sûriyê. Paşketına aboriya Kurdıstanê, encama vê politika kedxuriyê ye û sedemê hêsaniya wê ye. Heta dı wan herêman da, ku çend dehsalên paşin baranên neftdolaran bı ser İran û İraqê da barin (çendi pıraniya nefta wan jı Kurdıstanê derdıkeve ji) eşkere navçeyên kurdi paşketitır ın jı wan navçeyên ku cemawerên netewa fermandar lê dıjin.

Lê lı Kurdıstanê bı xwe ji pêşveçûna abori û rewşa bazara abori ya gıştì ne yeksa ye. Ta despêka salên 70 aboriya Kurdıstana Tırkiyê zûtır pêşve dıçû, çawa lı Tırkiyê hemi, çendi ku hê dı salên 60 da bı gavên geşebûna aboriyê İran êdi gıhaşte Tırkiyê, pışti ku nerxê nıftê bılınd bû rewşa İranê û İraqê gelek çak bû, û wısa ji ya Sûriyê. Çendi ku herêmên Kurd lı İranê û welatên Ereban fêdake ne pır mezın jı wê hılpeqina neftê wergırtın, lê dıgel wısa ji hınek jı cobara neftdolar bıser aboriya Kurdan da ji herıki.

Bı vi awayi, lı ber pêvendiyên cıvaki-abori lı Kurdıstana nûdemi du problêm hene: hiç û pûçkırına paşketına dıjwar û newekheviya geşebûnê. Van herdû problêman bandoriyeke nêgativ kırıne lı pêvajoya yekitiya netewiya Kurd û lı sûdkariya xebata wi, ya ku lı pê mafê xwe yên netewi dıke.

Institut kurde de Paris

## 4. Faktorên Siyasi Yên Navxwe

Kurdıstan, herêma dıjwariyeke politiki ya berdewam e, sedemê wê ji herdem ew bûye, ku dıjberiyên çinayeti û netewi bı xurti lı hev hatıne pêçan. Dı vi wari da dıvê mırov bala xwe bıde van momêntên hati:

Jı pêşi ve, asta xelkê, cemawerên lı jêr dı cıvata Kurd da pır nızm e dı warê xanedaniyê da, rewşa jin û hebûna rojane primitiv e. Angori wê ji, sistema nûdemi ya parastına tendurustiyê, perwerdeyê û çandê wındaye. Herdem newekheviya abori û cıvaki-kultûri dı navbera Kurdan û xelkên gelên fermandar lı wan welatên ku Kurd lê dıjin berdewam dıke û heta ew cawazi mezıntır dıbe. Ev hemi dıbın ardûyê hılmışti bo pêkhatına serhıldanên xurt dı nav cemawer da û bızavên gelêri û fıreh.

Duwem, dı hemi bızavên cemaweri da yên lı Kurdıstanê, sırûşta wan çawa be ji, disa momêntên êtnonetewi dı wan da xurt ın, çendi ne beloq ın ji, lê hın sedemên cıvaki pıçeki wan pıştperde dıkın. Dı vê pırsê da paşmayên sistêma malbati û eşirtiyê rola xwe listın, dema serokên teqlidi hınekî nermayi û nehini dıxıstın dıjberiya çinayeti dı cıvata kurdi da, nerazibûna çinên jêr jı yên jor vedıgerandın û sıst dıkırın. Serhıldanên teqlidi yên cemawerên Kurdên hejar rû nedan. Û sedemên wê ji, êtnocıvakiya heykelê Kurd bû, gava ku xanedaniya çini bı xwe û ya netewi dıbın yek. Lı Kurdıstana Rojava û Bakûr lı Tırkıyê, jı kevnare da karê kırrin û fırotınê, yê Ermenan bû. Lê fêodal û xanedan bı pıraniya xwe ve Kurd bûn, serokê eşiran bûn. Lema ji Fıla (Ermen û Asûriyan) bı çavê fêodalên tebayi û talanker lı hemi Kurdên musılman temaşe dıkırın. Lê Kurdan û hın musılmanên mayin bı çavê ke-

Institut Kurde de Paris

dxur, dunyaxur û nokerên bıyaniyan lı hemi Fılan temaşe dıkırın, çendi ku Fıle ji û musılman ji bı pırraniya xwe hejar û perişan bûn. Lê heykelê etni yê Kurdıstan, namaze ya Tırkiyê bı awaki xurt hate guhartın, emma teqlida "êtnekırına" bızavên cıvaki, ku bıbıngehê xwe mılli ne, hê wısa maye.

Sêyem, Kurdıstan berê ji û hê wısa dımine meydaneke klasiki ya bızavên netewi yên lı xwerû, ku armanca wan ya sereke berjewendiyên azadiya netewi ye, lema ji bı cewherê xwe dımının dı ser çinitiyê re. Çalakiyên derveyi van bızavan (yan dıji wan be) , mırovan bê rûmet dıkın dı nav cıvata kurdi da, nemaze, ewên jı ber hın sedeman dıçın ali fermandarên welatê koledar yan lı Kurdıstanê xwesteka dewletên derve bıci tine.

Dı demên pêş da, dı vê herêmê da, gelên diger ji têkoşina xwe dıkırın jı bo vedestxıstına mafên xwe, mina Ermenan. Lê dı dema iro da bızava kurdi dı herêmê da ne tenha sereke ye, belkû yekta ye ji lı Kurdıstana Tırkiyê û Sûriyê, dı ser hemi bızavên mayin re ye bı gıringiya xwe (çı ya Azeran, Ereban û Asûran).

Çarem, welatên ku Kurdıstan ketiye nav wan, dı çend dehsalên paşin da mılmılaneyek politiki ya xurt ketiye hundurê wan, jı ber dıjberiyeke cıvaki-politiki tûj û dıjwar. Dı wan dewleta tevan da ınqilabên sêrial çêbûn dı rêjiman da, lê lı İranê şorışeke kıbkıbe pejıqi dı bın bêreqa keska musılmanên Şii da. Dı encamê wan da, lı wan welatan zû hêzên êkstrêmist û nasyonalist (yan deshelati gırtın, yan ketın çalakiyên xurt; mina yên netewi lı İraq û Sûriyê û yê olperesti lı İranê) û rêjimın avtoritar lıdarxıstın.

Ev hejandınên politiki yekser bı problêma kurdi va gırêdayi ne. Çunke yek jı sedemê wan yên heri sereke ew bû, ku gêrên fermandarên teqlidi nedıkarin, yan nedıxwestın pır-



Institut kurde de Paris

sa netewi (ya kurdi beri gıştıkan) çareser bıkın. Jı aliki di va, her guhastınek dı rejimê fermandar keve lı welatên Rojhılata Navin yekser doza kurdi hartır dıke, mina xeleka heri qels dı sistema wan ya politiki da. Lewra ji bızavên kurdi bûne mina hışyarkarê tofanên siyasi dı welatên Rojhılata Navin da û sedemê kırizên pêşveçûna pêvendiyên politiki, yên hundurê wan dewletan.

Lê tışteki balkêş e, ku tu grûpek, jı yên ku deshılata wan çêbû dı encama ınqılabê da, negıhıştın çareserkırına doza kurdi, ne jı dûr ne jı nêzik. Tenha lı İraqê dı sala 1970 herêma otonomiya kurdi çêbû û ew ji bû bıngeheke gıring, ku hêvi peyda kır dı pêkhatına hınek daxwazên têkoşerên kurdperwer. Lê bûyerên bı dû de, çı yên nav xwe, çı yên derveyê İraqê dıyar kırın, ku ew xeyalek xav bû.

Ev tışteki sırûşti ye. Çunke sistêma pêvendiyên cıvaki-politiki, ku bı fermana dirokê dı welatên Rojhılata Navin û Asya Rojava da cigır bûye, asteng xıstın rêça çareserkırıneke nivçe ji dı warê doza kurdi da. Rewş hê dıjwar û krizetır dıkır wê rûdanê, ku hêza netewi ya kurdi nûhati, ewa hê dı nav xwe da taze bınyadê yekitiya netewi datine, berê xwe dıda hêzeke nasyonalist (ango şovinıst) ya netewa fermandar, ewa sıtewiyayi û xurtbûyi dı encamê xebata ku dıji kolonyalizmê kıriye û Kurd doza çarenıvisa xwe jı wê dıxwazın.

Sedemek jı yên ku pêvendiyên navnetewi xurt û dıjwartır dıkın dı welatên parvekırên Kurd, ew rêjimê otoriter ın (stemkar) forma wan rê lı ber wan fıreh dıke bo çewsandınên şovini. Vê rewşê jı aliki va bızava kurdi radıgırt, lê jı aliyê diger kela beroşa Kurd xurtır dıkır, rê dıda, weki Kurd lı pê mafên xwe yên netewi hemi formên xebatê bıkarbinın (Raperin lı Kurdıstana İraqê, İranê û pêşveçûna bızava partizani lı Kurdıstana Tırkiyê).

Institut kurde de Paris

Rewşa cıvaki û politiki dı van welatên goti da ne mina hev ın, lema bandoriya wan ji lı bızava netewi ya kurdi ne yek e, û rewşa Kurdên Tırkiyê, İranê, İraqê û Sûriyê ne yek e. Ev e bıngehê gêografi, yê parçebûna bızava (lebata) kurdi û newekheviya wê ya diroki.

Dı demên cawaz da parçên Kurdıstanê yên cawaz lı ser şanoya xebata azadixwaza gelê Kurd dadıketın meydanê. Dı sedsalê paşin da jı diroka impêriya Osmani ev bû rewşa Kurdıstana Bakûr, paş kutasiya Cenga Cihanê ya Pêşi Kurdıstana Başûr (İraq), jı nivê sala 20, bı dırêjaya dehan sal disa Kurdıstana Bakûr (Tırkiyê). Dı dema Cenga Cihanê ya Duwem da û pışti wê; Kurdıstana İranê, pışt şorışa Tirmehê sala 1958 lı Bexdadê navenda berxwedena Kurd kete Kurdıstana Başûr, yekser pışti "şorışa İslami" lı İranê kete başûrê Rojhılat, lê dı dema me da bızava Kurd dı rojhlatê-başûr ê Tırkiyê da ji gûr bûye.

Mina vi awayi bı xwe, diroka bızava kurdi ji tûşi qulopaziyên mezın bûye. Krizê navnetewi û heremi kêm-zêde, geh bılınd kırıne, geh ji xıstıne. Vê nelıheviya gêografi û xıronoloji herdem sedema yekem bûye jı astengên bızava Kurdati re, ewa ku heta nuha negıhaşt serxwebûneke bıryardar, ne dı parçeyeki û ne dı tevaya Kurdıstanê da. Mumkın e mırov behsa hın serkevtınên hûrık bıke, lê ew ji demkurt bûn û berevaj bûn.

Ev bûn, xusûsiyetên teqlidi yên pırsa kurdi jı aliyê siyasihunduri ve. Lê belê dı demên paşin da rewş tête guhertın. Gorineke berçav kete helwesta gêrên femandar derheqa doza kurdi dı welaten Rojhılata Navin da. Eger berê bı awaki fermi xwe pê agahdar nedıkırın, lê nuha, bere bê dılê xwe, û bı "egeri", lê mecbûr ın bı wê qayilbûna xwe binın, çawa bı rêaleke jini. Ew sıfetên caran, ku bı hemi bızavên kurdi va

Institut kurde de Paris

dızeliqandın; mina kevneperesti ne, fêodali ne, impêriali ne, komûnısti ne, yan bı destê ecnebi ne, êdi kêm bıkar tên. Dı nav gêrên fermandar yên wan welata da dıjberi peyda bûye dı helwesta jı bızava kurdi, dıbe mırov mujdebırê helwesteke rêalistik dı pırsa kurdi da lı kın wan bıbine. Ev hemû dıdın zanın, ku kırize ketiye helwesta şovinistên teqlidi jı pırsa gelê Kurd.

Dı dema me da bızava netewi ya gelê Kurd hılkeşi pêlûkeke taze. Bızavên kurdi yên nû dı siyasetê û dı rêxıstınê da bêhtır pıjyayi û zana bûne, çawa dema iro dıxwaze. Prinsipê hevalbendiya eşiri dı nav hêzên pêşmerga de bı dema xwe re çû û derbas bû. Rola rêberên fêodal û serokên oli êdi lı ber çavan kêm dıbe dı gêrên pêşewayên xebata gelê Kurd da. Dı cıyê wan da êdi rêxıstın û partiyên politiki rêbertiyê û têkoşinê dıkın. Dı nava wan da canê netewayeti, dêmokratik û şoreşgêriyê ci gırtıye. Lı dor wan hersê ramanan pıraniya gelê Kurd cıvandıne û xıstıne rêça xebatê bo mafên xwe yên netewi. Derve jı vê eniya fıreh dımının tenê grûpên bê bandor yên kevneperest û êlêmêntên nerêalist. Dı gel vê yekê ji , disan mırov dıkare bêje, Kurd hê dûr ın jı yekitiya heqiqi û ev ji ayina wê paşvemayina gışti ya gelê Kurd e û taybeti ya asta kûltûra politiki ya nızm e. Ev bınyadê wê bêberhemi ya encampûç a hemi serhıldanên Kurdan dıji sıtemkariya netewi dı demên kevn û nû de. Tenê pışti Cenga Cihanê ya Duwem dı temamiya bızava kurdi de awayê rêxıstıni jı nû peyda bû bı peydabûna "Partiya Demokrata Kurdıstan" (PDK) û lıqên wê yên İraqê, Tırkıyê û Sûriyê û bı serokatiya Mustefa Barzani. Bı serokayetiya wi, lı İraqê, jı sala 1961 heta 1975 revinga agırê berxwedana kurdi berdewam kır, lê dawiya dawi hate vêsandın, emma fermandarên Bexdadê neçar kırın, kareki nayab bıkın; avakırına herêma otonomi ya kurdi.

Institut kurde de Paris

Şıkestına serhıldana Kurdıstana Başûr bı serokatiya Barzani, bû qonaxeke wısa, ku êdi awayê têkoşina netewi bı rêbertiya serokên eşiran û malbatên ku hini mêtodên zordariyê bûbûn, çûn bı dema xwe re. Dı wê demê da ji dı diroka têkoşina gelê Kurd da ya azadixwaz qonaxa xebata siyasi ya plûrali destpêkır.

Dı vê dema taze da, lı her parçeyeki Kurdıstanê dûzineyek partiyên kurdi xebat dıkın (her yek jı wan lıqên xwe lı derveyi welat serpereşt dıkın) û heryek, kêm-zêde programa xwe ya politiki dıyar kıriye lıgor hın çin û grûpên cıvaki yên jina gelê Kurd ya nûdemi. Hın caran nehêsan e mırov cawaziyê dı nav wan da bıbine, çı dı warê stratêgi û çı yê taktiki da. Hın jı wan partiyan dêmokrat ın û ecelê wan geleki nêzik e. Parçebûna sıyasi ya bızava netewi ya Kurd dı vê nûdemê da pêşandanê rewşa kırizeya nûjen e.

Lê belê, ev kırizeyeke wısa ye, ku dı vê dema zor gıring da jı bızava kurdayeti, tışteki sırûşti ye, û helbet nemana wê dê Kurdan derbaske pêlûkeke deha bılındtır. Nişanên vê guhertınê lı ber çavan e.

Pêş her tışti diyar e, ku bızava kurdayeti iro lı herçar parçên welatên Kurd pêşve dıçe, hevrayeke wısa, berê kesi nedibû. Rasti goti, sertiya wê lı herçar parçan ne mina hev e, lê bêguman, êdi ew sısti û sariya dûr û dırêj nema berdewam dıke.

Berdewam kultûra sıyasi ya cıvata kurdi bılıtır dıbe û dıgel wê ji bızava Kurdayeti êdi rêkûpêk dıbe û yekitiya tengpartitiyê paş de davêje. Pêvajo ya pêkanina cebhe û eniyên siyasi rêçên xwe vedıkın dı nav partiyên kurdi da; pêşin yê Kurdıstana İraqê û Tırkiyê. Pêkanin û bıhêzkırına yekitiya dı xebata siyasi da, problêma sereke ye bo bızava kurdi ya nûdemi û dıyar e çareser dıbe.



Institut kurde de Paris

Dawiya dawi, doza kurdi êdi nema dıbe "tışteki dı xwe da", gıraniya cewherê wê mezın dıbe, şeripane bı dozên mayin re, ew ên rawestine lı ber dewletên Rojhılata Navin, ew ên Kurdıstan lıhev parvekırıne. Wısa ji ferehtır dıbe fêmkırın wê rastiyê, ku bê çareserkırıneke dêmokratik ya vê dozê ne mumkın e hêmıni û aşti bıkeve van welatan.

## 5. Faktorên Politika Derveyi

Dı vê dema me da hemi pêvajoyên cıvaki-politiki bûne navnetewi dı welatên cihanê tevan da. Doza kurdi, bı saya xusûsiyetên ku me gırtın, bûye yek jı wan pırsên heri navnetewekıri. Pırsa kurdi, bû pırseke navnetewi hê dı 30 salên sedsalên 19 da û nêzi tıxûbe sedsalê XX êdi bı awaki berçav bû pırseke aktûel.

Lê pışti kutasıya Cenga Cihanê ya Yekem ew bû pırseke serbıxwe û cıyê xwe gırt dı pêvendiyên navnetewi da.

Jı wê demê ve pırsa kurdi dı çend qonaxên şênbûnê re derbas bû, angori wan gorinên ku dı rewşa cihanê da rûdan, nemaze dı terazûya hêzan lı ser şanoya Rojhılata Navin, ta kutasiya Cenga Cihanê ya Duwem sê helwestên sereke dı pırsa kurdi da hebûn:

1. Ya Britanya û Fransa ku helwestên xwe yên kolonyali dı Kurdıstanê û herêmê da hebûn.

2. Yekitiya Sovyet, bı saya cigehê wi yê gêografi û berberitiya wi dıji "impêrializmê". Tırkiye û İranê, du dewletên tenha serbıxwe mabûn dı wê demê da lı herêma Rojhılata Nêzik.

Britanya û Fransa mina wesiyetkar jı Koma Mılletan (Liga Neteweyan) İraq û Sûriya dıgel parçeyeke mezın jı gelê Kurd

Institut kurde de Paris

xıstın bın destê xwe. Xwestın bızava kurdi bıkarbinın da ku helwestên xwe yên kolonyali dı herêmê da bıhêztır bıkın. Û lı Kurdıstanê qonaxeke dıji Sovyet ava bıkın, mina gıringtırin movıkê dı "berxwedana tendurustiyê" da, ku peyda bûbû pışti sala 1917 dıji gazi û propagandeyên dagırkıri yên şorışgêri, ku jı Sovyêt derdıketın. Û ya dawi ji, astengıyan peyda bıke jı Tırkiyê û İranê re û vê paşiyê ji, jı İraqê re, ango van welatên xwestın, ku deshelata xwe serbıxwe bıhêz û xurt bıke. Politika koledaran derheqa Kurdên İraq û Sûriyê da tenha çewsandın û sıtembari bû, çendi ku car-caran dıxwestın ku bızava kurdi ya nıştımanperwer bıkın berberê ya Erebi dı van welatan da.

Helwesta Yekitiya Sovyêt dı pırsa kurdi da heta dema paşin berevajiya welatên Rojava bû, dıji berjewendıyên wan û hêzên kevneperest dı Rojhılat Navin da. Jı ber bandoriya gelek sedemên objêktiv û sûbjêktiv siyaseta Sovêtıstanê dı pırsa kurdi da zor caran ne yek rû bû. Jı aliki ve, Sovyetê nedıxwestın, ku lı Kurdıstana ciran herdem ûcaxê dıjwariyê dadayi be, ku dıjmınên wi yên herêmê û yên Rojava, dıkarın dıji berjewendiyên Sovyetıstanê bıkarbinın. Dêmek, bı awayê pırinsipial, Sovyetıstanê dıxwest, ku pırsa kurdi çareser bıbe û hemi sedemên şerên ku lı ser pırsa netewi dıbın, lı Kurdıstanê neminın. Jı aliyê di ve, jı ber nebûna şırûtên nehıştına wan sedeman, ango pejırandına mafê gelê Kurd yê çarenıvisê, çunke deshılatên welatên Rojhılata Navin û koledarên Rojava qet nedıpıjırandın, Moskova alikarıya Kurd dıkır bı awaki, ku lı gor çepitiya bızava Kurd a netewi, dıji gêrên kevneperest û şovini dı Rojhılatê da û dıji politika welatên koledarê Rojava dı vê herêmê da. Ev kınareke têra xwe tenık û hayane bû, lê siyaseta Sovyetıstanê dı pırsa Kurdi da lıser keviya wê balansê xwe berdewam kır heta destpêka çerxa pêrêstroykê.

Hukûmeta Tırkiyê û İranê, ku xebat dıkırın jı bo bıhêzkırına serbestiya xwe ya taze. Rê nedıdan, ku pırsa kurdi sedeman bıde koledarên Rojava, daku ew ji xwe tevlê bıkın. Bı vi awayi, em dıkarın bêjın, ku hemi hewldanên xwe tevlêkırınên dereke, dı bın çı navi ji bûbana, dı nav şerên ku dıbûn dı navbera Kurdan û deshelatên welat da dawiya dawi dıbûn hoyên tundiya sıtemkari û çewsandınan derheqê Kurd da. Dı politika "kurdi" ya İran û Tırkiyê da momênteke taybeti ji heye hemi dozên sinori yên ku ew lı hev dıkın (pêvendın bı qada kurdi ve), xudan dirokek kevnare ne û roleke stratêci-leşkeri dılize. Lê derbarey İraqê û nemaze Sûriyê û helwesta wan dı doza kurdi da heta salên 50 ji rewşê hê dimeneke navnetewi wernegırtıbû, çunke serxwebûna dewleti ya van welatên Ereb dı demeke dırêj da, hê formal bû (bı nav hebû) lê bı cewherê xwe ev dewlet bê vin û bende bûn.

Paş kutasiya Cenga Cihanê ya Duwem helwesta van welatên me gotın bı awaki pırinsipial dı pırsa kurdi da nehate guhertın, lê hejmarê xudan berjewendi dı doza kurdi da û nêt û meremên wan helbet bêhtır bû. Jı aliyê Rojava rola Yekitiyê Dewletên Amêriki bû ya sereke, bandoriya Ingêltıra û Fransa kêmtır bû. Dı rewşa cenga sar da heta raddeyeke berçav rola Yekitiya Sovyet mezıntır bû, helwesta wi dı pırsên Rojhılata Navin û yên kurdi da xurtır bû. Dawiya dawi, dı kutasiya salên 50-60 da, İraq û Sûriyê dest bı politika xwe ya kurdi kırın, bı awaki serbıxwe.

Gırıngiya Kurdıstanê dı sıyaseta Amerika ya Rojhılata Navin da, çı ya paş cengê û çı ya nûdemi bı berjavendiyên gêopolitikê ve û aboriyê ve gırêdaye, me ev pırs pêşda gotiyê. Lê rola serbıxwe ya Kurdıstanê jı bo Amerika dı 40 salê paşin da ne yeksa bûye. Heta dewletên parçekerên Kurdıstanê hevalbendên Amêrika bûn (dı peymana NATO û Bexdadê

Institut kurde de Paris

da) jı Amêrikiyan re ne pêwist bû bızava kurdi gûrr bıkın. Belki berjewendiya wan dıxwest, ku ew bızav sıst û bêdeng be, daku Tırkiyê, İranê û İraqê, çawa welatên dost, nehejhıjine.

Lı gora şênbûna hevaldariya peymana sovyeti dıgel neteweperestên dıji koledarên Rojava lı Asya Rojava, nemaze jı nıvê salên 50 balkêşiya Amêrika ber bı pırsa kurdi ve dıyar bû. Mina aleteki pêwist jı bo bandoriyê lı welatên herêmê bıke. Lewra ji vedestxıstına bızava kurdi, bû yek jı borcên sıyaseta Ameriki ya Rojhılata Navin.

Helwesta Ingêltera jı pırsa kurdi ra, mina ya Ameriki bû. Bandoriya wê ya leşkeri-siyasi û ya abori lı Kurdıstanê eşkere qels bû (jı ber herıfandına sistêma wê ya kolonyali).

Fransa vê paşiyê dıxwaze rola xwe ya carên kevnare dı pırsên kurdi de vegerine. Bı awaki gışti berjewendiyên wê û welatên Rojava, yên me bınav anin ser zıman, lı Kurdıstanê bı awaki sereke dı hêla abori da ne: şırketên Ingılizi, Hollandi, Fransi, Japoni, Elmani, İtali (û helbet yê Emêriki ), mina pêşin gotına pırgıran û belki ya bıryardar dı hemi karûbarên nefta Rojhılata Navin, ya Kurdıstanê ji dıgel de, jı bo xwe parastın.

Bı vi awayi, mırov dıkare bêje, ku sıyasetek navpari ya welatên Rojava bı serokayetiya Amêrika dı pırsa kurdi de hebû. Gelo çı bûn nemazeyên wê sıyasetê û pêvajoya wê bı çı mêtodan dıbû bı dırêjaya pıraniya demên paş Cenga Cihanê û heta dema nuha?

Pırsa kurdi dıkete binoka vê sıyasetê. Lê hukûmeta her welateki Rojava lı pırsa neteweya gelê Kurd temaşe dıkır lı gor berjewendiyên welatê xwe. Ev bû sedemê;

1. Alikariya nivçe û bendewer, ku dıkırın jı hın bızavên kurdi re (dema ku ew dıbûn dıji rêjimên neyar jı Rojava re);

Institut kurde de Paris

2. Hewldan bo bıhêzkırına hêzên kevneperest dı nav gelê Kurd de û rakışandına wan bı ali dewletên rojava de jı qoziya ditına welatên rojava, kûrçûn dı pırsa kurdi de gelek xeter e, kes nızane wê çı fıtne û tevlıhevi bıkeve vê herêma heri germ û xeter lı ser rûyê erdê.

Lewra ji sıyaseta Amêrika û hevalbendên wê dı pırsa kurdi de ne serkevtibû. Dı cewherê xwe de ne bêhtıri hın qulopaziyên nızm bû. Ew ji ne dıhat pıjırandın ne jı aliyê bızava kurdi ve û ne jı aliyê berberê wan ve.

Pışti Cenga Cihanê ya Duwem sistema pêwendiyên navnetewi hın êlêmêntên taze xısün helwesta Yekitiya Sovyêt dı pırsa kurdi de, çendi ku bı cewherê xwe ew helwest mabû ya caran. Mentıqê "cenga sar" dı vır de rola xwe dıdit dıgel rakêş û vekêşên wê "germi" û "ferrıkin" û h.w. Pışti ku Tırkiye, İran û İraq ketın feleka welatên rojava, metırsiyeke bınyade lı bal Moskova çêbû, nek Amêrika qada Kurdıstanê dıji Sovetıstanê bıkarbine. Lı gor wê rewşê Sovyêt berew pıştgıriya kurdi kır, lê ne bı awaki eşkere ku dı nav Sovyêt û wan dewletên cinar de fıtneyeke kûr peyda bıbe.

Serhıldana Kurdan sala 1958 lı İraqê borcên teze danin pêş sıyaseta Sovyeti dı pırsa kurdi de û ne mina pêşin bergıri û parêzgır, lê bı awaki êrişane. Rêbaza wê ya dıji Rojava xurttır bû û dıgel vê yekê ji gıringıya wê ji mezıntır bû; weke hoyeke ku Sovyeti bıkarıbinın, da ku bandoriyê lı politika hundurê welatên herêmê bıkın. "Şorışa islami" lı İranê û şerê navbeyna İran-İraqê û wısa ji nerıhetiya siyasi lı Tırkıyê salên 60 û destpêka 80 û mezıntırbûna dıjwariyê lı Kurdıstana Tırkiyê pırsa kurdi lı nık Moskovê deha aktual kırın.

Rêbaza dewletên parvekırên Kurdıstan dı pırsa kurdi de eşkere dıji Kurd e, bı dırêjaya dema pışti cengê mina berê. Konkrêt em bêjın; hevkariya navdewleti çêkırın lı dıji ser-

Institut kurde de Paris

hıldanên kurdi, ewên ku herdem wısa bûn dı diroka Kurdıstanê de, sinorê dewleti nema nasdıkırın hemi hukûmet û partiyên pêşewa dı van welatan de eşkere bûn dıji duruşma sıyasi ya bızava netewey kurdi, çı bı awayê gıştì ("azadiya Kurdıstan") û çı bı awayê kati û normal ("otonomiya kurdi, ewa ku şırovedıbû mina xapandıneke politiki-amadekırın jı bo wê azadiyê bıxweye, bı kêmani imkani dıditın jı bo pûçkırın û hiçkırına wê, mina rewşa wê lı İraqê").

Dı welatên ku Kurd lı wan dıjin û dı sıyaseta wan ya derve de roleke aktiv û yarmetkar pırsa kurdi werdıgre. Ew bı kartê mina huceteke politiki dı nelıheviyên navdewleti de, ewên ku geleki dıqewımın dı herêmê de û dı çareserkırına wan de, helbet, pırsa Kurd û berjewendiyên wan ên netewi hiç nedıketın hesab û balnekêş dıman.

Ev rewş wısa bû dı dema serhıldana Kurdên İraqê de bı serokatiya Mustefa Berzani sala 1961-1975, dema ku hukûmeta Şah hewl dıdan bo ku İraq serê xwe jê re deyne û dozên wê yên sinori dı herêma başûr de, rêçên avi û bejayi (şet-el Areb) bıpıjırine, yarmeti da bızava çekdara Kurdan, (dı wê demê bı xwe de ji dıxwest Kurdên nav xwe ji "kedi" bıke). Lê hema Bexdad, çawa xuya kır vê paşiyê bı nêta taktikê bû, bıryar da ku daxwazên İran wê bıci bine lı gor lıhevhatına Cezayirê, sala 1975 İran dı ci de sinorê xwe û İraqê gırt lı ber Kurdan, yarmeti rawestandın. Kurd neçar bûn şerê xwe heta demekê rawestinın. Dı cenga Êlûna sala 1980 de, ku dı navbera İran û İraqê de gurr bû, disa Kurd êşiyan. Gelek caran şerê herdû terefan lı ser xaka Kurdıstanê dıbû. Bıli vê ji, herdû aliyan, çı İran, çı İraq yekser propaganda xwe dı nav Kurdên welatê dıji xwe dı kırın, ku bû sedemê zıyaneke mezın dı warê yekitiya hêzên netewi û rêberên Kurda.

Doza Kurd parçeyek bû û hê dımine parçeyek jı pêvendi-

yên nav İraq û Sûriyê û İraq û Tırkiyê dı warê pêşin de bı kar hat dı berberiya herdû dewleta û herdû partiyên fermandar (komiteyên herêmi yên Bees lı Sûri û İraqê). Dı warê duwem de roleke berevaji list: bû hoyê nêziktiya herdû welatan, hevkariya wan lı dıji gelê Kurd. Faktorê kurdi dı pêvendiyên Tırki-İraqi de bı rola lexma katkıri radıbe.

* * *

Ev bûn xêzên bıngehi yên pırsa kurdi heta vê dema dawi. Lê dı nivên duwem de yê sala1980 yan elametên gorrineke mezın dı rewşa nûdemi ya vê pırsê û dı awayê wê de xuyakırın û dı despêka 1990 ew gorrin qewımin. Helbet lı vır, pêvajoyên navxweyi, ku rewş gıhandın modernkırına temamiya gelê Kurd rola xwe listın, çendi ku hêj dûr e jı kemala xwe. Lê tıştê heri sereke ew e, ku gorrinên diroki, xudan pesendên navnetewi, çı dı warê gışti û çı dı warê Rojhılata Navin de êdi destpêkırın. Dıvê lı vır em bala xwe bıdın du haletan:

1. Dı vê demê de bı saya Kremlin gorrinên bıngehi ketın têkeliyên Rojhılat û Rojava û bûne sedemê nemana "cenga sar" dı rêbazên wê yê heri sereke de, her wısa ji, bınyad danin bo vemırandına ûcaxê dıjıwariyê dı wê demê de, gava herdû dewletên bêhemta berberitiya hev dıkırın.

2. Dı despêka salên 1980 de, lı parçê bakurrê herêma Rojhılata Navin, ango lı herêma ku nıştımanê Kurdan perçeyeki wê ye ûcaxên mılmılandıneke taze û xeter peyda bûn. Ev encama wê yekê bû, ku jı nışkêva baskên heri fanatik û zordar û serseri yên politikê bıhêz bûn lı ser bınyadeki netewi yan olperesti lı İraqê û İranê; têrrorizm bı hemi rengê xweyi kırêt ve geş bû, pışti ku kete ranga (pêlûka) politika dewletê lı van herdû welatan. Ev rêbaza hılweşandınê dı sıyaseta navxweyi û dı ya derveyi welat de gewde bû dı rejimê Saddam Hûsên de lı İraqê û yê diktatûra melan dı bın bêreqa

Institut kurde de Paris

Xumêni lı Îranê. Hêzên netewi û leşkeri lı Tırkıyê ji ketın çalakiyan. Lê jı hemiyan hovtır sorokvanên Îraqi xwe pêşandan, lı ser sinorê Îraqê cengek wısa lı darxıstın, ku bêhemta bû jı demên kutasiya Cenga Cihanê ve heta roja nûdemi-cenga dıji Îranê, ku bı dırêjaya salên 80-an tevi berdewamkır, cenga ku bê fêde kuta bû û bı dû de dagirkırına Kuwêytê dı 2 Tebaxê dı sala 1990. Ev bûyer bûn sedemê wê yekê, ku dı Kanûna 2 û Sıbata sala dınê hêzên Encumana Netewên Yekgırti ENY, bı serokayetiya Amêrika û beşdariya wê ya bıryardar cengek dıji Îraqê lı darket û Îraq tê de şkest jı koka xwe ve.

Cenga Îran-Iraqê yekser qada kurdi dıxıst çarçıva xwe. Bıli jı wê yekê, herdû terefan hewl dıdan, ku faktorê kurdi dı welatê hemberê xwe jı xwe re bıkarbine, lewra ji Kurd tûşi gelek azar û wêraniyan bûn jı destê stemkariyên rejimê herdû welatan. Bı taybeti kırınên Saddam, hov û nemırovayeti bûn, çendan car çekên kimyawi dıji Kurdan bıkaranin.

Cenga Delavê tırajêdiyeke nû lı Kurdıstanê peyda kır. Kurdan dı hılweşandına leşkerê Îraqê de şanseki xwe ditın û dest bı raperineke gelêri kırın, dı demeke kurt de hemi navendên sereke lı Kurdıstana Başûr kete bın kontrola wan.

Dı wê demê de ji, lı başûrê Îraqê cemawerên Şiiyan seri hıldan. Wısa diyar bû, ku roja azadiya Kurd tirêjê xwe berdan.

Lê vê carê ji bı dıjwartırin awayi sê faktorên teqlidi rola xwe ya wêran listın: qelsiya leşkeri, neamadekariya siyasi û nebûna alikarıya derve. Ev faktorên ku hevalbendên berdewamın jı têkoşina azadixwaza Kurdan re. Hêzên rêjimê Bexdadê, yên jı herıfandına fılıtibûn û çak amadekıribûn jı şerrê navxweyi re, tıwanin raperrina Kurdan, ewa ku perwerde nebûbû dı warê politiki û leşkeri de, bı hêsani bışkinın lı Ba-

Institut kurde de Paris

kurê İraqê, çunke jı ber nêtên "siyaseta bılınd" dı dema teng de, dema pêwıst bû, alikari nekete destê Kurdan jı ali hevalbendên dıji Saddam. Dı encama wê tırajêdiyê de, lehiyek penaberên Kurd ketın Tırkiyê û İranê, bı deh hezar mırov mırın (bêhtırê wan zarok) jı bırçiti, sermê û nexweşiyê.

Çendi ku qurban û goriyên Kurda gellek gıran bûn ji, lê Cenga Delavê bû qonaxeke gıring û nû dı diroka geşebûna doza gelê Kurd da. Jı nişkave xuya bû, ku ev pırs:

1- Hate pêşeniya şanoya jina siyasi (ne tenê dı çarçıva herêmê de, lê jê fırehtır);

2- Xuya bû, ku ew bı tundi bestiye bı pırsên sereke yên Rojhılata Navin ve, ango sogırandına aşıtiyê dı herêma Delav da û doza Fılestınê. Kuştına ketberi ku rêjimê S. Hussên dıji Kurdan û Şiieyan û fortên destpêkırına jênosid lı Kurdıstana İraqê, pêleke wısa jı protêsta dınyayê peyda kırın, kıri bûba sedemê têkdana hemi encamên pozitiv lı ba Amêrika û hevalbendên wê yên Ewrûpa û Rojhılata Navin, ew encamên ku cenga Delava hevrayê qazanc kırıbûn. Hevalbendan yekser tevdiran bı cianin dı warê leşkeri û politiki de, tevdirên wısa ku helwesta İraqê dı ci de hılweşandın dı herêmên bakûr da, bo vegera penaberên Kurd hesani peyda bû, ew hemi vegeriyan malê xwe, rê vebû bo avakırına hukûmeta dêfakto (emrê waqi) lı Kurdıstana Başûr "Kurdıstana azad" dı bın sêywana Nato (ya rast; Ameriki) da.

Dı dema nûjen da lı dor doza Kurdi rewş bı vi awayê hatiye.

1. Rojava bı awaki xurt cıyê xwe çêkır lı Kurdıstanê (jı destpêkê lı ya Başûr) bı dezgayên xwe yên leşkeri û sıyasi ve. Ev rewş bı xwe asta pırsa kurdi bılındtır dıke, wê dıbestine bı pırsên mayin yên Rojhılata Navin ve, ewên ku çalakiyên pır

Institut kurde de Paris

mezın û ne kêmfêde dı cihanê da dıbın jı çareserkırına wan re.

2. Doza kurdi dı jina hundurê welatên parvekırên Kurdıstan da bû xudan aktûaleke wısa, ku jı faktoreke jenandınê bû yeki berdewam, ku dezgayên fermi yên van welatan êdi nema dıkarın bê balkêş bıhêlın.

3. Lı pêş çavan lebat kete navnetewekırına pırsa kurdi, ne tenha bı mebesta politiki lê jı aliyê balkêşiya berhevraz ya birûraya cıvata cihanê derheqa wê de. Dı gelek hoyên ragıhandınê (xwendın, ditın û bıhistınê), lı dezgayên fermi û parlemanan, ne tenê xeyda xwe dıyar dıkın dıji tawanbarıyên xwinayi yên dıji gelê Kurd lı İraqê, lê pêşniyarê xwe dıdın bo ditına çareyekê jı doza kurdi re bıbinın, çendi nivçe be ji.

Dêmek, rewşa Kurdan dı vê demê de çendi gıran e ji, zor sedemên himi henın, ku pêşeroja wê hêvidar be. Lê hê astengên mezın henın lı ser rêça geşebûnê dı çarserkırına doza kurdi da.

Yek jı wan astengan ew e, ku dıjberi dı navbera du alitiyên doza kurdi ya navxweyi da heye, mina pırseke hundurê wan welatên Rojhılata Navin ên, ku lı gor normên mafên navnetewi yên lı Hêlsinki hatın pıjırandın, kes nıkare dest dırêji wan bıke. Û jı aliyê dın, navnetewekırına vê doza nayabe. Lê pışti, jı ber ku Kurdıstana gêografi bı sinoran jı hev parçe kırıne. Yê dûyem; jı ber ku doza kurdi dı çerxa nûdemi de bûye dozeke navnetewi jı sınıfên xebatên bo mafên mırov ("pivanên merıvi"). Çareserkırına vê dıjberiyê mumkın e, eger ev bêdengiya cihanê dı pırsa kurdi de nema berdewam bıke, dıvê ku lı Encumena Netewên Yekgırti ENY, komiteyek taybeti durust bıbe, da ku çareseriyê lı rewşa Kurdan bıke (belku ne tenha Kurd, yên kêmnetewe û olperestên mayin ji lı Rojhıla-

Institut kurde de Paris

ta Navinê), hewl û çalakiyên wê bıbın yarmeti bo çareserkırına doza kurdi û dozên netewi yên diger dı herêmê de.

Astenga duyem ew e, ku hê bızava kurdi negıhiştiye wê pêlûka yekitiya siyasi, ku karıbe lı Kurdıstanê û lı derve, lı ser şanoya navnetewi, bı çalakıyên rêbazeke siyasi ya hevrayi rabe. Qet bê vê yekitiyê, doza kurdi nabe navnetewi (mina asta doza Fılıstinê ). Bı kurti, jin dıde zanin, ku pêwıst e dezgeyeke siyasi ya gıştí bo Kurd organize bıbe, ku karıbe serpereştiya bızava kurdi lı Kurdıstanê bıke û lı derve bı navê wê bıpeyıve.

Dêmek helwest jı doza kurdi ra pêwist e bı vi awayi be:

1. Pırsa kurdi gereke bı qonaxan çareser bıbe jı qonaxekê pêkhati dı nûdemê da here yeke tezetır. Qe nabe sısti, yan serseriti tê da peyda bıbe. Jı bo Kurdên İraqê armanca heri meqbûl dı vê dema teze da, avakırına İraqeke fêdêrativ e, ango bıbe komara Ereb û Kurdan, mafên Kurd û Ereban tê de mina hev bın.

2. Pırsa kurdi gereke berdewam çareser bıbe, bê çıv û qulopazi, paşxıstın û bêhnfırehi. Bı bina fıreh lı gorrinên mumkın dı bızava Kurdayeti de bêne temaşekırın.

3. Pırsa kurdi gereke çareser bıbe dı bın kontrola navnetewi da; kontroleke xurt, çı jı aliyê dezgayên fermi û çı jı aliyê birûraya cihanê ve.

Institut kurde de Paris

# Kurdıstana Başûr
# lı ser rêya çarenûsa netewi

Prof. Ş. X. Mıhoyi

Institut kurde de Paris

Despêkên buyerên siyasi yên nûjen lı İraqê jı salên 60-70 tên. Lema jı bona ku fıkreke tam bê çêkırınê derheqa van qewmandınan û pırsgırêka Kurda bı taybeti, pêwist e ku em lı ser çend pırsên siyaseta Partiya Bees, taktika û stratêjiya wê lı hundur û dervayê welat bısekının.

Gava sala 1968-a Bees cara duda bû partiya hukumdar, ewê disa wek berê (sala 1963-a) siyaseta dıji rêxıstınên dêmokrati û pêşverû dımeşand; çı Ereba, çı Kurda, ewên ku dewa otonomiyê dıkırın. Partiya Bees lı welêt karê siyasi kır monopolıya xwe tek-tenê, mêtodên hukumdariya diktatori da rıkınkırın, jı bo çareserkırına pırsgırêka Kurda xwe bı rêya zorê û çekdariyê gırt. Lê belê rêjima diktatoriyê zûtırekê mecbûr bû hın guhastına bıke nava siyaseta xwe, illahi dı pırsa Kurda da. Mıxabın, serê seri da dıhat kıvşê, weki ev gûhastın tıştne taktiki ne û bı mecburi tên kırınê. Rewşa welêt ya wê demê rêjima beesiya dıdehfand ber bı vê siyasetê. Ewa, dawiya sala 1969-a û destpêka sala 1970-a du cara xwestın hukûmetê welgerinın. Beesi bere-bere dıketın rewşeke weke rewşa sala 1963-a, gava rêjima wan têk çû. Bona rejima xwe

bıparêzın beesi mecbûr bûn dı siyaseta hundur û der da hınek guhastına bıkın. Dı wê demê da êdi eşkere bû, ku normalkırına rewşa welat nıkare bê seri, eger pırsa Kurda neyê çareserkırınê. Usa ji rewşa İraqê ya navnetewi bı vê yekê va gıredayi bû.

Dı vi hal-hewali da rêjima Bekır-Huseyn bıryar da ku bı Kurda ra dest bı guftûgoyê bıkın derheqa çareserkırına doza kurdi da. Bı saya van guftûgoya 11-ê Adarê sala 1970, derheqa otonomiya Kurda lı İraqê dêklarasiya hat holê.

Pêwist e bê gotınê, weki rast e, hukûmeta İraqê peymana aşiti bı Mıstefa Barzani ra gırêda, lê çawa dıbêjın, kevır jı destê xwe ne avêt. Hukûmetê dest jı mıxenetiyê û durûtiyê nekışand. Siyaset û taktika rêjima Bexdadê bı xwe iznê dıde bona vê fıkrê. Bı vê yekê va gırêdayi pêwist e bê biraninê, weki gava sala 1968-a beesiya hukum hıldan destê xwe, wan disa siyaseta xwe ya berê meşand, ya helkırına pırsa Kurda bı destê zorê. Eva hat isbatkırınê bı wê yekê va, ku nava sal û nivekê da rêjima beesiya şereki berk kır dıji pêşmergên Kurd.

Bı xwe têoriya beesiya qet nehat guhastınê. Angori prinsipên wê "dunya Ereba nayê parçekırınê" û tu rê-derge jı bo hukmê serxwebûnê, yan ji otonomiyê jı mıleteki wek Kurda ra tune. Bı ditına xudanên vê têoriyê Kurdıstana Başûr "beşeki niştimanê erebayi neperçekıri ye," lê Kurd, zef-zef, weke mıleteki bıçûk, hınek mafên çarenûsi dıkarın bıstinın.

Kırınên beesiya, ên wan sala, dane kıvşê, weki programa hukûmeta İraqê ya çareserkırına mesela Kurd bı serûbınê xwe va gaveke taktiki bû. Armanca wê ew bû, ku alikariyê bıde hukûmetê bona ew jı kriza politiki derkeve, lê paşê disa wek berê siyaseta hışk hındava Kurda da bıkarbine.

Gava em vê yekê hıltinın ser hesêb, em nıkarın dina xwe nedın şaşike PDK taktiki, ya dema guftûgoyên derheqa pey-

Institut kurde de Paris

mana 11 Adarê sala1970. Me êdi got, weki têori û praktika beesizmê rê ne dıda gelê Kurd bıghê mafên çarenûsi. Eva yeka serokên PDK ra diyar bû. Eşkere bû, ku rejima Bexdadê jı mecbûri bı Kurda ra pêwendiyên otonomiyê dıkır. Lema ji dıbe şaşi bû, ku PDK qail bû, weki jı bo hazırkırına zagona otonomiyê demeke dırêj, weke çar sala bıdın hukûmetê. Eşkere bû, weki bona hazırkırına zagona otonomiyê sal-salnivek pır bes bû. Dema dırêj (a çar sala) jı hukûmetê ra bona nêta xırabiyê pêwist bû...

Em bınêrın, ka wan çar salên bona hazırkırına zagona otonomiyê çı alikari dan rejima beesi? Gava lı Kurdıstanê şer sekıni, beesiya şanseki baş stendın ku eşkere xwe bı gıştı bı çek bıkın. Sala 1972-a nava İraqê û Yekitiya Sovyêt da peymana dostiyê û hevkariyê hat gırêdan. Bı saya vê peymanê pêwendıyên İraqê-Sovyetê yên politiki, êkonomiki û leşkeri xurt bûn. Rêjima beesiya weki rejimeke "dıji imperyalizmê û pêşketi" hat naskırınê û lı ser vi esasi welatên sosyalist û yên dostên wan, jı herali alikari dan İraqê. İraqê bı çapeke mezın çek stend. Paşi çar sala silahdariya eskerê İraqê bı çend qatan bılındtır bû. Dı nava van salan da pêwendi û tevgırêdanên dostane saz bûn û pêşda çûn nava partiya Bees û Partiya Komunist ya Yekitiya Sovyetê da. Bı saya vê yekê qedr û şerefa rêjima beesi lı welatên sosyalist û yên "oriyêntasıya sosyalistiyê" bılınd bû. Sala 1973-a lı İraqê cebha "nıştimaniya netewiya pêşverû" saz bû. Vê cebhê bı destûr û qanûnnama xwe va bı yekteref kar dıda beesiya. Şırikê beesiya yê sereke lı cebhê Partiya Komunistên İraqê, jı prinsipê xwe yê berê paş da vekışiya û dı pırsa cebhê da hat ser riya beesiya. Partiya Komunist ya İraqê dı bername û gelek dokûmentêd mayin da ser wê bir û bawariyê bû, weki "Cebha weteni" gerek organizake usa be, ku endamên wê bı extiyariyên xwe weke hev bın û bı hevra kar bıkın bona armacên tomari. Lê vê carê komu-

Institut kurde de Paris

nistên İraqê ketın bın hêgêmonya beesiya. Çawa tê kıvşê, dı vê pırsê da komunistên İraqê bın zordariya Partiya Komunist û hukûmeta Sovyêtê da jı pozisya xwe paş da vekışiyan û ketın bın bandora beesiya, bona alikariyê bıdne zorbûna rêjima beesiya, dostê Yekitiya Sovyetê. Rejima Bexdadê her teheri dıxebıti Partiya Komunist a İraqê û Partiya Dêmokrati a Kurdıstanê rake dıji hev, nava wan da dıjmınatiyê kûrke.

Beesi dıjmınê van herdû partiya bûn. Lê bı meneyên taktiki rewşên cuda da beesiya xwe nêziki yekê jı wana dıkır dıji ya dın. Beesiya ra lı hev hat dıjitiya nava herdu partiyên opozisyon kûr bıke. Tışteki balkêş e, weki paşi dêklarasya sala 1970-a derheqa otonomiya Kurda da heta destpêka sala 1972-a Beesiya dıda kıvşê, ku ew dostaniyê bı PDK ra dıkın û dıji PKİ ne. Hela serda ji Beesiya gazi PDK dıkırın bı hevra dıji Partiya Komunist şerkın. PDK ev yek nekır. Lê meha Nisanê sala 1972-a (paşi peymana Sovyetê-İraqê), gava pêwendiya PDK û Beesiya xırab bû (jı bo şertên otonomiya Kurda) beesiya û hukûmeta İraqê xwe nêziki komunista kırın û kampanyeke mezın destpêkır dıji PDK. Bona temamiya vê kampanyê dıji PDK û Mıstefa Barzani efûkırınê bı fırehi propaganda dıji wan meşandın. Lı rojnamên İraqê yên resmi, rojname û pırtukên Sovyetê û welatên sosyalist, Barzani dıhat gunehkarkırınê çawa "mıroveki paşverû" û "dûrnediti", zagona hukûmetê derheqa otonomiyê da dıhat qimetkırınê çawa dokûmênteke tam û bêqusûr. Lê rasti ew bû, weki hukûmeta Bexdadê nuqtên dêklarasiya 11-ê adarê sala 1970-a nivero qedand, lema ji Barzani û PDK ew rexne kırın û qebûl nekırın.

Zagona 11-ê Adarê sala 1974-a geleki jı peymanên sala 1970 dûr ket. Beesiya dewsa otonomiya rasti hının extiyariyên xwe xwetiyê dıdane Kurda. Evê yekê nerazibûnek mezın pêşda ani nava seroketiya Kurda da.

Institut kurde de Paris

Bona sıfetê vê pırsgırêkê tambe û bı gışti bê ber çava, pêwist e em binın bira xwe, weki hukûmeta İraqê û seroketiya PDK peymana 11-ê Adarê sala 1970 pıjırandın çımki herdû terefa xwestına xwe diyar kırın bı vi teheri "pırsgırêka bakûra İraqê" helkın, çımki bı rêya çekdariyê herdû terefa ji nıkaribûn bıghiştana safıkırına vê pırsê. Wê demê da rêjima Bexdadê nıkarıbû bı destê zorê xwestına xwe stuwê Kurda bıaline. Bı vê sedemê hukûmetê wedeli dest jı mêtoda çekdariyê kışand û pêwendiyên aşitiyê bı Kurda ra despêkır. Gava em bı vi teheri pırsê dınhêrın, tê xuyakırın weki pozisiya beesiya sala 1974 a durûti û mıxeneti bû, çımki ew jı gotıyên xwe yên sala 1970 paşda vekışiyan. Ev ne tışteki nışkêva bû. İdêya, birbaweriya otonomiya Kurda dıji konsêpsiya beesiya bû. Bı vi cûreyi rewşeke ne standart çêbû: bı izbati extiyariya otonomiya Kurda bı destê xwe, xebat û şerê xwe qazanc kırın, jı "jêr va" hat dastaninê, lê zagona darheqa vê pırsê da "jor da", yanê bı destê hukûmetê, bı zorê stuwê Kurda alandın.

Fêmdari ye, weki eva wê bıbûya bıngeha konflikteka nû. Çawa eşkere ye dı wê konfliktê da Kurd ser neketın. Paşi buyerên salên 1974-75 a eşkere bû, weki armanceke zagona No: 33 -(1974) ew bû, ku konfliktê bı PDK çêkın, mehna sazkın da ku disa lı Kurdıstanê şer destpêkın. Bona bı vi teheri hukum û tesira PDK lı Kurdıstanê bıdın hıldanê. Rewşa wê demê ne weke ya salêd 60-i bû. Şansên serketına rêjima beesiya eşkere bûn. Beesiya alikariyek mezın jı Yekitiya Sovyetê û terefdarên wê dıstend. Esker û hêzên mayin ên çekdari bı gışti silahê nû va hatın xınekırınê. Dı nava tevgera Kurda xwe xwe da hukûmetê grûpeke nû amedekır, ya ku dıji Barzani û PDK dıxebıti. Propaganda zor destpêbû dıji hêzên Kurdaye netewi. Serokê wan Barzani hat gunekarkırınê wek siyasetvanê "dûrnediti" û "paşverû". Serê ser da ji mûxaberat û casûstiyên Amerika û İranê roleke pis listın. Bı hoya xapandın û

Institut kurde de Paris

provokasyonê wana tevgera kurdî dehfande nava şaşiya. Evan gışka bı hevra tevgera Kurda ajotın zaboqê, dergeki teng.

Bı van problemên xwe va hêzên Kurdaye netewi pêşberi dıjmın sekının, ewê ku "heta dırana silahkıri bûn". Beesi êdi ne tenê bûn, wek sala 60-i. Hevalbendên wan pır bûn. Dı vê rewşê da PDK tek-tenê, bê pıştevan ma. Serda ji yekitiya PDK terıbi. Grupeke endamên PDK jı Parti veqetiyan. Rast e, dı vê grupê da kêm mırov hebûn û tesira wê lı Kurdıstanê pır kêm bû, lê ew bû izbatiya dutiretiyê û jı navê PDK "resmi" pêşdahatına evê grupê hat karaninê bona rûmeta Parti û M. Barzani bêxın.

Sertaca van hemû bedbextiyên Kurda mıxenetiya lı Aljirê (Cezayir) bû. Peymana Adara sala 1975-a lı Aljirê nava seroketiya İraqê û İranê da derheqa wê yekê da, ku bı hevra dıji tevgera Kurda derkevın, hêzên Kurda kırın nava rewşeke gıran. Seroketiya PDK mecbûr ma şer bıde seknandınê. Eva rupeleki şerkariya Kurda heri gıran û dramatik bû. Çend pırsên van qewmandına hela hê lı hêviya bersivên xwe ne...

Pışti qewmandınêd sala 1974-1975-a lı İraqê û Kurdıstana İraqê rewş bı carekê va hate guhastın. Bı saya şkandına tevgera Kurda beesi bûn xwey-xudanên welêt ên tam. Diwanên İraqê Kurd û tıfaqdarên wan ceza kırın. Berê pêşin derbên xedar dan wa goti "rastên" Kurda, paşê ji dora wan "çepa" ket, yêd ku tevi hukûmetê dıji M. Barzani û PDK kar kırın.

Dıjmın derseke mezın da Kurda: eşkere bû, weki bona rejima şovini hemû Kurd hesab dıbın dıjmın, çı "ên rastê", çı "yên çepê". Salên pêşwextiyê ev yeka dane izbatkırın. Paşi sala 1975 a têror û cezakırın lı Kurdıstana İraqê bı cemaweri û çarhawêr bû. Zordariya diwanê, xelayi, tunebûna ciyê jiyinê û komekdariya doxtıriyê bı deh hezara malêd Kurda mecbûr kırın derbazi Kurdıstana İranê bın. Hındava xwe da

Institut kurde de Paris

diwanên Şah eva yeka dıxebıtand dı dan û stendınên xwe yên siyasetiyê da bı Bexdadê ra.

Paşi şkandına tevgera Kurda ya çekdari û cemaweri, beesiya her teheri dıxebıtin usa bıkın, ku ew careke mayin serê xwe raneke. Bona vê meremê berê ewlin wana dest bı ciguhastına Kurda kırın. Bı hezara Kurd jı ciyê wan, ê kal-bava radıkırın û dışandın navçeyên İraqa navin û başûr. Kurdên ciguhasti ketın haleki geleki gıran. Nexweşi û mırın gıhiştın çapeke here mezın.

Pêwist e bê biraninê, weki siyaseta guherandına strûktûra bıneliyên Kurdıstanê hela hê jı dema Qasım da dıhat derbazkırın. Ev sıyaset hertım dıhate derbazkırın. Xên jı vê, hukûmet dıxebıti ser sinorê Tırkiyê, İranê û Sûriyê wa goti "*Kembera Erebi*" çêke. Jı wan herêma Kurd derdıxıstın û dewsa wan Ereb ci-war dıkırın bona tevgırêdanên herçar perçên Kurdıstanê bı hevra tunebın.

Bı tebayi, jı 700 hezari zêdetır Kurd jı ciyê wan derxıstın.[1] Jı sala 1976-a diwanên Bexdadê herêma wa goti "No mans land" (Axêd bê kes ) sazkırın, beraya wan 20 km ser temamiya sinorê İraqê-Turkiyê. Hukumetê merem danibû pêşiya xwe temamiya gundên vê kemberê wêranke, weki pêşmerge alikariyê nestinın û mecala wan a çûyin-hatına sinora tunebe. Bona Kurdên ciguhasti diwanên İraqê "komplêksên jiyinê" yê mexsûs çêdıkırın, yêd ku jı aliyê diwanê da dıhatın kontrolkırınê. Kurdên vê derê izna malbatên wan tunebû hevra têkelbın, (bên gırêdanê) rasti hev bên. Dêmonstrasıya, yanê ji cıvinên şıkayetkırınê (pırotêsto) bı nemerdi dıhatın perçıqandınê. Şedetiya xezeba ku dıanine serê Kurda ew fakt dıde, ku herêmên Kurd jê derxıstıbûn bı eqara xwe va beramberi qada Lubnanê bû.[2] Jı sala 1974-a heta sala 1987-a lı mentiqên Diyalê, Suleymaniyê, Hewlêrê, Kerkûkê, Dı-

hokê û Mûsılê 1222 gund wêran kırın û kes lê ne ma; beşeki wan hat şewıtandın yan ji bı buldozera jı rûyê dınyayê hılanin. Hukûmetê qırar da, weki dıbıstanê Kurda dadın û dewsa wan ên Ereba vekın. Temamiya hinkırın û perwerdıkırına zaroka bı rûhê beesizmê dıhat amedekırın. Tenê izna Partiya Bees hebû jı navê welêt û mılet pêş da bê. Sala 1978-a Akademıya Kurdaye zanıstiyê hat gırtın. Paşi xweşkırına pêwendıyên xwe tevi Iranê, rejima Bees xebıti bı Tırkiyê ra ji nêzik be. Sala 1987-a Ahmed Hesen Bekr çû Tırkiyê û peymana Iraqê-Tırkiyê hate gırêdan. Angori vê peymanê (nûqta 4 - a) herdû dewleta qırara xwe kırın yek, weki şerkariya xwe dıji Kurda tevdir bıkın û hevra bıdın qailkırınê. Sala 1979-a meha Nisanê serokê ordiya Tırkiyê Kenan Evren çû Iraqê û vê derê pırsa bı tevayi dıji tevgera netewiya çekdari ya gelê Kurd hate enenekırınê.

Jı payiza sala 1979-a nava siyaseta Iraqê dı pırsa kurdi da hınek guhastın hatın kırın. Ew yek bı tıvdir û amadekariya şerê bı Iranê ra gırêdayi bû. Payiza sala 1979-a Sadam Husêyin hate Kurdıstana Iraqê. Lı Sulêymaniyê ewi got, weki "ew terefdarê otonomiya Kurda ye". Wêra tevayi ewi got, weki bı hezara Kurd wê iznê bıstinın bo jı başûra welat vegerne Kurdıstanê. Sala 1980 lı Kurdıstana Iraqê bıjartın derbaz bûn bı hesabhıldana "otonomiyê". Şêwra qanûndariyê da 50 dêpûtat hatın bıjartın, himli jı wan merıva, êd ku bı hukûmetê ve gırêdayi bûn.

Sadam tıvdarekê şerê Iranê ra dıdit. Dı bıngeha vê siyaseta diktatorê Iraqê da ev mehne hatıbûn danin:

1) Eskerê Iranê helwaşiya bû, rewşa welat ne baş bû, emiratên Xelicê bı rêjima Iranê ra dıjmınati dıkışandın, welatên Rojava, illahi Dewletên Amêrika Yekbûyi (DAY) pıştevaniya Iraqê dıkır, dı konflikta bı Iranê ra. Bı saya vê yekê Iraqê dıxwest Iranê alt bıke

Institut kurde de Paris

û wê govekê da roleke sereke bılize;

2) Bı wê yekê ve rêya belabûna şorışa islami lı İraqê wê bıhata gırtınê, çımki lı İranê eşkere dıgotın, weki bı destê Şiiyên İraqê wê wi karê xwe binıne seri;

3) Evê rewşa hanê bıkar binın bona wê yekê, ku ew deynên İraqê bı peymana Aljirê 6- ê adarê sala 1975-a dabûne İranê, paş da bıstinın.

Şerê İran-İraqê, ku sala 1980-an destpê bû, bû bareki nû û gıran bona gelê Kurd. Beşeki mezın ê pêşeniya şer dı Kurdıstanê ra derbaz dıbû. Çawa dı navçeyên kurdi yên İraqê, usa ji êd İranê da gelek eskerê herdû dewleta ci-war bıbûn û wana lı vır rola cezakırına "Kurdên xwe" dıqedandın. Şerê herdu dewleta rewşa Kurdıstanê ya cıvaki-abori dıha xırab kır. Diwanên İraqê dıxebıtin Kurdên İranê bı kar binın dıji diwanên wê, êd İranê, hındava xwe da, dıxwestın Kurdê İraqê bıdın xebatê dıji rêjima Sadam. Muxaberat, Savak û casûstiyên van welata bı vi teheri Kurd dıjberi hev dıkırın, ne dıhıştın ew bıbın yek bona safikırına problêmên xwe.

Gelek Kurd, illahi beşê Kurdıstana İraqê, xezeba here gıran bı ser wan da hat, sertaca wê ji trajêdiya Helebçê bû. Dıji wê çeka kimyawi bıkaranin. Pêwist e bê gotınê, weki hê sala 1984-a pêşekzan-pısporên Ameriki agahdari bela kırın, ku eskerên İraqê nava şer da gaza jehrê "iprit" û "tabûn" bıkartinın. 16-ê adarê sala 1988-a bı êrişa çeka kimyawi nava çend seeta da Helebçeya 70- hezari bû cehnema rasti. Gazêd jehrê bajar bı xwe û nehiyên dora wê wêran kırın. Merıv û heywan bı tevayi hatın qırê. Yêd sax mayi seqet û nıvişkan bûn û dızêriyan. Angori gotın û ditınêd rojnamevanên welatên Rojava, ku hatıbûn herêma Helebçê, laşê bı hezara zaroka, jına, kalemêra û heywanan lı soqaqa û mala da mabûn.

Eva hesab dıbû akta jênosidê dıji gelê Kurd. Çeka kimyawi



Institut kurde de Paris

dıji Kurda hat xebıtandınê usa ji Tirmeh û Êlûna 1988-a.

Lı dınyayê pêla protêstoyê destpêbû dıji gunehkariya rejima Saddam lı Kurdıstanê. Navê Helebçê lı cihanê tevi bû çawa "Hiroşima duda". Yekıtiya Sovyêtê, welatên sosyalist û tıfaqdarên rejima Saddam, jı vê protestoyê der man. Tışteki balkêş e, weki temamiya "dınya İslami" û rêxıstınên İslami yên navnetewi tu bes û deng nekırın bona trajêdiya Helebçê. Tenê İranê bona vi kari İraq gunehkar kır. Lê belê, ev yek hat kırınê ne bo xatırê Kurda. Tehranê bı vi teheri dıxwest dıjmınê xwe, Saddam û rêjima wi lı dınyayê rûreş bıke. Sed mıxabın, kırınên welatên Rojavayê ji jı sinorên gunehkarkırına İraqê derneketın. Bı vi teheri diktatorê İraqê bêceza gunehkarike mezın dıji gelê Kurd kır û ev yek ji bû faktorek, ku ew bı kırınên xweyê mayin va rewşa temamiya heremê tevlıhevke.

Rêjima Saddam eşkere dıxwest bı destê zorê pırsa Kurda safîke. Şerê İraq-İranê şanseki baş dıda wi. Tenê bı formal qanûna otonomiya Kurda dıhat xweyikırınê û wê ra tevayi hukûmetê hemû cûre û mêtodên çekdariyê û êd mayin bı kar dani bona tevgera Kurda ye netewi jı holê bıde hılaninê û nehêle ew paşwextiyê serê xwe bılındke. Rêjima Bexdadê wek berê siyaseta guhartına strûktûra dêmografi ya Kurdıstana İraqê miaser dıkır. Bona "dêkurdizasiya heremên kurdi" mecal-mıkanê Kurdaye etno-kûltûriyê jı holê dıhatın hılanin. Bı vi teheri hukûmetê dıxwest problêma kurdi ya netewi bıke problêma mıletê bıçûk (mınıorıty), mıletê bê sinor û axa xwe ya kal-bava.

Bı vi awayi rêjima diktatori dıxwest problêma Kurda, ku problêma temamiya mılleteki bû, ku lı ser axa xwe dıjit, bıke problêma mıletê bıçûk û bona wê ji cûre û mêtodên nû bıbine. Bı çapên pır mezın bajar û gundên Kurda wêran dıkırın.

Institut kurde de Paris

Pıraniya gundên Kurdıstana İraqê bı buldozêra hatın wêran kırın. Hêşnayi payê pır bı qınyatên jehrê va hate xırabkırınê, kaniyên avê bı bêtonê va hatın xıtımandınê, bona ku merıv û heywan nıkarıbın lı wır bıjin. Heywanetê gundiya yan bı destê zorê hıldan, yan ji qırkırın. Welatê heywanatxweykırınê -Kurdıstan, pênc sal berê lı wır 7 milyon pez lê hebû. İro lı wır tenê 50 hezar pez maye, ew ji lı herêmên ku nehatıne wêrankırınê. Bı deh hezara kewarê hıngıv xırab kırıne û bı wê yekê va tradisiya hezar sali ya xweyikırına mozê hıngıv jı holê hat hıldanê".[5] Temamiya bıneliyên bajara û gunda jı ciyê jiyinê derdıxıstın. Pıraniya wana lı "ciyê jineyê nû" ci-war dıkırın. Gelek awareyên Kurd bı mecburi lı lagêrên rex sinorê Urdunê ci-war bûn.[6]

Rexıstınên navnetewi ("Emnisti intêrnêyşıl" û yêd mayin) rojname û kovara gelek deng û bas çapkırın, ên derheqa rêprêsiyêd dıji bıneliyên Kurd. Tenê sala 1988-a bê dad û mehkeme bı hezara Kurdên ham-tam hatın cezakırın (dıgotın ku ew pıştgırên pêşmerga ne).

Meha sıbate sala 1989-a "Emnisti Intêrnêyşıl" dakladeke mezın (70 rûpel) belakır derheqa zarokên Kurd, ku bı wehşiti hatın kuştın. Jı faktên ku dı vê dokumêntê da hene merıv sawê dıkşine: diwanên İraqê ber çavê dê û bava zarên wan dızêrandın, zarêd 12-13 sali, ku şık lı ser dê û bavê wan hebûn, gıva dıji hukumetê ne, dıkuştın. Serda ji laşê wan her wê demê dıdane dê-bava, gava wana "heqê kuştınê" dıdan dewletê. 30 hezıranê sala 1983-a 8 hezar jın û zarokên jı herêma Barzanê ku lı kampa rex Hewlêrê bûn, bın kontrola eskerê İraqê kes nızane kuda bırın. Rêxıstınên humanisti û "Xaça Sor" çend cara xwestın pê bıhesın ka kuda bırın ew jın û zarok, lê mıxabın negıhiştın tu tışti. Nava axaftıneke xwe da Saddam Huseyin got, weki "evan xayinana nıha idi lı cıhenemê ne". Angori dengbesên jı serekaniyên Kurd bersıvdarên hukûmeta İraqê ew

jın û zarokên Kurd bı kar anibûn bona cerbandınan çekên kimyayi û baktêrologiyê û paşê gışk hatıbûn kuştın.[7] Rêjıma xwinrêj disa karê gênosidê kır dıji gelê Kurd.

Şerê İran-İraqê kuta bû. Dı vi şeri da İraq ser neket. Lê propaganda rejima Bexdadê her teheri dıda bawerkırınê, weki "Saddam altındarike mezın bıriye û kareki mezın kıriye jı bo mıletê Ereb...". Rasti ew bû, weki Saddam dı vi şeri da ne gıhişt armanca xwe, lê rejima wi ordike here mezın amade kır, bı çekê heri nû va. Jımara ordiya İraqê dıgıhişte nêziki milyoneki (dı cihanê de ê çara jı aliyê mezınaya xwe va).

Diktatorê İraqê dıxwest evê qewatê bıkar bine bona armancên şerûdiyê, agrêsiv. Usa hat stendınê, weki ew welatêd ku alikariya Saddam dıkırın, nıha bı xwe dıbûn obyêkta kırınêd wi yên agrêsiv û dıjmınatiyê. Gıli derheqa Erebiya Suudi û Emiratên Delavê de ye.

Welatê pêşin, ku kete bın derba rejima Bexdadê, Kuwêyt bû. Bı zevtkırına Kuweytê Saddam dıxwest bıbûya xudanê dewlemendiyên vi welati ên neftê û finansên bêjımar. Ya duda, bı vê yekê va Saddam wê geleki helwesta xwe qewin bıkıra lı Delavê Farısa û lı vê herêmê gıştı.

Destpêka tebaxê sala 1990, İraqê nışkêva êriş bır ser Kuwêytê û nava du roja da ew welat zevtkır. Welatên Rohılata Ereba û dewletên mezın karê Saddam hesab kırın çawa agrêsıya û her teheri ew gunehkar kırın. Welatêd Ereba (xên jı Urdunê, Yemenê, Aljirê û serokê OAF Yasir Erefat) zeftkırına Kuwêytê berk gunehkar kırın. Temamiya nivsalekê têma Kuwêytê jı rûpelê rojname û kovara ne dıhate xwarê. Saddam û rêjima wi bı kırınêd xwe va İraq kırın bın bareki gıran.

Encumena Netewên Yekgırti (ENY) û şêwra wê ya bêqeziabûnê lı ser esasê pêşniyara DAY (USA) û pırraniya dewletêd mayin qırar derxıstın, weki İraq goti bêegle jı axa Ku-

Institut kurde de Paris

wêytê derkeve. İraqê ev pêşniyar inkar kır. Paşi wê DAY dest bı karê bıcianina bıryara ENY kır, weki bı destê zorê agrêsor ceza bıkın.

Şerê herêma Delava Farısi da bû meydaneke nû, kiderê plan nêt-meremêd dewletên dûr û nêzik hatın xwanêkırın. Lez-bez koalisiya diji İraqê hat sazkırınê. Helbet, ev helwest ne haqas jı bo wê yekê bû, weki evan dewletana heyra serxwebûna Kuwêytê bûn. Koalisiya dıji İraqê weke blokekê bû û her endameki wê armanca wi hebû, ku ne weke hev bûn. Her yek kara xwe dıgeriya. Bı vê pırsê va gırêdayi geleki hewaskar e em bınhêrın ka dewletên cinar çı planên wan ên dûr û nêzik hebûn dı konflikta Delava Farısa da. Balkêşiya me berê ewlın tê ser pırsa Kurda, çımki eşkere bû, weki eva pırsa bıxazi-nexazi wê daketa holê.

Em dina xwe bıdne helwesta dewletên cinarê İraqê; Tırkiyê, İranê û Sûriyê, ên ku geleki xemkêş bûn bona pırsa Kurda. Eşkere bû, weki aktivtiya van welata bı wê yekê ra gırêdayi bû, weki herçar dewletên ku Kurdıstan perçekırıne, pır-hındık vê konfliktê ra gırêdayi bûn. Dı pırsa Kurda da pozisia (helwesta) wan pır cûre bû. Armanca wana kevn û stratêjik ku ser dereca pêşın bû; her teheri rê nedıne pêşdahatına pırsa Kurda ya netewi. Bı wê ra tevayi, her yek jı van dewleta armancên wan yên taktiki hebûn, ku dı wê demê da goti bıhatana hesabhıldanê û miaserkırınê.

Bı gışti dewletên İranê, Sûriyê û, illahi Tırkiyê, hesabê xwe dıkırın, weki xezeba ku anine serê Kurdê İraqê, siyaseta gênosidê dıji gelê Kurd dıkarın bıbın sedema wê yekê, ku dewletên xerbê paşi şerê Delavê pırsa Kurda ya netewi pêşda binın bona guftûgoyên navnetewi û axaftına ser naskırına mafê Kurda yê çarenûsi. Jı bo vê yekê diplomatiya Tırka kûr-dûr dıdit, weki bona dı pırsa Kurda da xwe bêqeza (asayış) bıkın

pêwist e berê ewlin pêwendiyên xwe bı Amerikiya ra hê xweştır bıkın. Ankarê nıkarıbû nedita, weki dı dawiya "şerê sar da" rewşa nermbûna pêwendiyên xerbê-şerqê, deha rast DAY û Yekitiya Sovyetê, rola Tırkiyê dıkare bıkeve, ew weke berê wê nıkarıbe nava dewletên mezın da lıstıkên diplomatiyê bıke. Konflikta İraqê-Kuwêytê şansek da Tırkiyê, weki buhagıraniya xwe bıparêze. Çıma? Vaşingtonê û tıfaqdarên wê yên Avropi dı aliyê koalisya dıji İraqê da geleki dıxwestın, weki nava yekitiya dıji İraqê da dewletên Rohılata Nêzik û Navin ji hebın. Tırkiyê xwe bı vê rê gırt. Lê wê ra tevayi ewê işaret da Amerika û hogırêd wê, weki şertê vê tevbûna wê ew e, ku paşi şêr pırsa Kurda neyê hola enenekırına navnetewi.

Hukûmeta Tırkiyê tevi yekitiya dıji İraqê bû û tıfaqdarê xweyi aliyê şerê dıji Kurda - hukûmeta İraqê "fıro". Bı saya vê yekê Tırkiyê xwe ra rê vekır meydana pırsa Kurda da. Tışteki balkêş e, weki Ankara haqas fırnaq bû, weki xwest plana Kemaliya ya vegerandına wilayeta Musılê (Kurdıstana Başûr) nava dewleta Tırka jı gorê rake. Prêzidênt Ozal elamkır, weki plana fêdêrasya Tırkiyê û Kurdıstana Başûr dıkare bê holê. Lê belê, eva fıkra serê seri da tıştki bê pêrspêktiv û pûç bû. Paşi alçax bûna vê planê Ozal agahdari da, weki ew dıji otonomiya Kurdaye tame lı İraqê û naxwaze, weki pırsa Kurda lı hola navnetewi bê enenekırınê.

Tışteki balkêş e, weki çıqas navbera dewletêd Tırkiyê, İranê û Sûriyê da gelek nelıhevi û dıjiti hebûn ji, lê gava peyv dıgıhişt pırsa Kurda ewana gışk dıbûne yek. Awa mesele, hûkûmetên hersê dewleta peyhev elameti belakırın derheqa "yekitiya İraqê, axa wê, dewleta wê". Eşkere bû, weki vê derê peyv derheqa avtonomiya Kurda bû...

Hersê dewleta, her yek hındava xwe da, her teheri, dıxe-

Institut kurde de Paris

bıtin weki pırsa Kurda dernekeve meydana navnetewi. Dı vê pırsê da xên jı Tırkiyê hukûmeta İranê ji kar dıkır. Jêrê emê bınhêrın, ku çawa Teheranê siyaseta xwe ya dıji pırsa Kurda angori pêşdaçûyina qewmandınên lı Kurdıstana Başûr dımeşand. Diyar bû, ku Amerika û welatên Avropi bı resmi mêla Kurdên İraqê dıkırın, ku bûbûn şehidê rêjima Saddam. Dı wê demê da, gava Kurdê İraqê ditın, ku rêjima faşist qels bûye, wan gumana xwe dan ser dewletên xerbê û bı hevra rabûn dıji rejima Bexdadê. Beri wê Waşingtonê û hogırên wê elam kırın, weki nahêlın ku Saddam artilêriya gıran û fırokeyan dıji Kurda bıkarbine. Serhıldana Kurda cemaweri bû û bı saya wê bawer bıki temamiya Kurdıstana Başûr aza bû.

Evan bûyerana Tırkiye, İran û Sûriyê geleki nerehet kırın û wana bı cûreki nû dest bı karê dıji Kurda kırın. Tırkiyê û Sûriyê faktorên siyasetê-diplomati yên cûre cûre dane xebatê. Lê rêjima İranê ya fûndamêntalist "faktora Şiietiyê" bıkar ani. Nava karê xwe dıji Kurda da rêjima İranê ciki taybeti dıda vê faktorê. Lê bı çı teheri?

Pêwist e em binın bira xwe, weki Şiieyên İraqê konflikta wan bı rêjima Saddam ra hebû, lê wana bı rastane Kurda ra hogırti nedıkırın. Xasma, ewana dıji mafên Kurda yê çarenûsi derdıketın, usa, çawa hukumeta İranê bı xwe. Tışteki geleki hewaskar û ecêb çêbû: tevrabûna Kurda bû şerteki gûrbûna hereketa Şiieya, lê ew bı obyêktivi dıbû asêgeh ser riya tevgera Kurda ya netewiyê. Gava lı Başûrê İraqê Şii dıji rêjima Saddam rabûn û İranê rola xwe aktiv kır dı vi kari da, Amêrika û dewletên Avropa jı tırsa mehkembûna pozisiya fundamentalizma islami dest jı Kurdên İraqê kışandın. Dewletên Xerbê, illahi Amêrika, destê Saddam aza kırın bona perçiqandına tıfaqdarên İranê; Şiiêya. Kurd tek-tenê man dı nav lepê diktatorê Bexdadê yê xwinxar da. Saddam ji lı hiviya wê yekê bû. Paşi şıkestına xwe ya bı rezili dı şerê Delavê da ewi



Institut kurde de Paris

dıxwest rumeta xwe rake, ciyê xwe mehkem bıke.

Dest bı pêla gênosideke nû bû dıji gelê Kurd. 2,5 milyona zêdetır Kurd ketıne bın agırê bomba û artilêriyê. Jı tırsa bı karanina çekên kimyawi xelkê, mal û hebûna xwe hıştın û ber bı sinorê İranê û Tırkiyê reviyan. Bı hezara Kurd bı taybeti zarok û pir bûn êm û xurê mırınê.

Tragêdiya Kurda ya nû lı temamiya dınyayê hêrs û protêst pêşda ani...

Paşi şerê dıji Kurda Saddam vegeriya ser Şiieyên İraqê. Tevgera vana ji dı nava xwinê da hat xenıqandın. Nenıhêri wê yeke, weki tevgera Şiiya, ku İranê pıştovaniya wê dıkır, hat perçıqandın, lê Tehran jı kırına xwe razi ma, talaşa wê nin bû. Şıkestına Şiiya û xezeba ku anin serê wana bona rêjima islami bıhayeki sıvık bû, ne tu tışt bû. Bona wê, ya sereke ew bû, weki jı wê ra lı hev hat derbeke gıran bıghine tevgera Kurda, ku deha ferz bû. Bı vi teheri çıqas ji welatên Xerbê û rêjima İranê ne bı hevra bûn, lê disa xainti, neyartiya dıji Kurda jı herdû aliya hat.

Hukûmeta Bûş bı izbati Kurd fırotın û alikari da Saddam ku rêjima xwe bıparêze bona kara dawleta xwe, lı goveka Delavê Farısa, dıji İrana islami. Usa hat stendın, weki listıka taktiki ya "Kurda-Şiiya - Saddam Husêyin", bû nımûneki nû ya siyaseta ku Kurd nava da hesab dıbın "perê hûr".

Kuştın û mırına Kurdên İraqê, rewşa gıran ya bı hezara penaberên Kurda lı welatêd xerbê protêsto û hêrseke mezın pêş da anin. Dı vê demê da hukûmeta İngliz bı pıştovaniya hukûmetêd Fransayê û Almanyayê pêşniyar kır: bona Kurdêd İraqê vegerıne ciyê xwe yê jiyinê yê berê, pêwist e "lı bakura İraqê herêma asayışi (kembera parastınê) saz kın." Ev herêm, goti, parastına wê ya navnetewi hebe û bıbe bıngehê otnomiya Kurda ya rasti. Helbet, bı hêlana Amêrikayê.

Institut kurde de Paris

Dewletên ku Kurdıstan perçekırıne, geleki bêsebır acız bûn. Wana disa dest bı propaganda xwe kırın derheqa "sêparatizma" Kurda. Lê evê yekê bandori ser pêşdaçûyina qewmandına nekır.

Hukûmetêd Angliya, Fransa, Almanyayê bı pıştgıriya (Dewletên Amêrikayê Yekbûyi) DAY û çend dewletên Awropiyê mayin pêş da hatın çewa grewdarên yê asayışiyê Kurdêd İraqê. Bı rêberiya ONY (Organizasiya Netewên Yekgırti) herêma bakûrê xêza 36-an hat elamkırın çawa hêla asayışa Kurda û parastına wan e jı terefê hêzên navnetewi da. Bı vê yekê ra gırêdayi pırsa rewşa Kurdıstana Başûr vır hada, hate meydanê. Hêzên Kurdıstana başûr yên dêmokrati du rê lı pêşiya wan hebû: yan tevi rêjima Saddam rûnên û rê-mecalên safikırına pırsgırêka "Bakurê İraqê" bıbinın, yan ji bı xwe riya mafên çarenûsi yên Kurdên İraqê bıbinın, lê dı nav sinorên İraqê da. Lê bı hesabhıldana rewş û qewl-qırarên wê demê. Berê pêşin serokên Kurda xwestın bı rejima Bexdadê ra zman bıbinın.

Serokên cebha hêzên Kurdıstanê yên netewi-demokrati gaziya Saddam qebûl kırın û rasti wi hatın. Hêzên Kurdaye demokratiyê ew rasthatın ne wekhev qebûl kırın. Aliki va ev rasthatın hat hesabkırın çawa gaveke bona ditına rê-mecalên helkırına mesela Kurda, aliyê dın va, ew rasthatın hat gunehkarkırın. Bı taybeti dıhat gotın, weki serokên Kurda bı vê rasthatınê va qedrê bı hezara şehidê siyaseta gênosidê ya Saddam Husên negırtın.

Diktatorê İraqê bı xwe zûtır nişan da, weku tu xwestınên wi jı bo bı aşiti û dêmokrati safikırına mesela Kurda tune. Bêbextiya Saddam zutırê da kıvşê, weki axıriya van guftûgoyan pûç e. Ser da ji tırs hebû, weku Saddam dıkare disa êrişeke mezın bine ser Kurda.

Nava hêzêd Kurdaye netewi da pıraniya merıva dıhatın ser wê bir-baweriyê, weki pêwist e rê mecalên nû bıbinın bona çareserkırına pırsa Kurda. Hukmê zati, yan otonomiya Kurda lı İraqê eşkere kır, weki ev cûre safikırına mesela Kurda bı kêr ne hat. Bı hûrgıli şırovekırına vê problêmê jı sinorê vê mıqalê der e. Tenê pêwist e bê gotın, weki welateki ku lı wır qayde-qanûnê dêmokratiyê tunen û hukmê diktatoriyê heye, hındava xwe da dinê islami ji gıranıyê dıde ser "umma" islami, lê ne mafên çarenûsi yên netewi, û ne problêmê weke ya Kurda bı wi teheri nayên çareserkırın.

Dı praktikê da zagona (Qanûna) No: 33, ya 11 ê adarê sala 1974-a derheqa otonomiya Kurda da, ku bı xwe geleki qutkıri û teng bû, kırınêd Saddam yên paşwextiyê, zordari û têrora dıji Kurda, bir-baweriya otonomiyê bêrûmet kırın. Eger rasti bê gotın, tışteki paradoks e, ecêb e, weki mıleteki cıhanêyi heri kevn, bı sıfetê xweyi netewi va, xwedanê kultura netewiyê dewlemend jı riyê siyaseta dewletên herêmê yên varvêşiyê û bêdengi û carna ji pıştovaniya dewletên mezın rê-derge pêşiya serxwebûna Kurda gırtıne. Ew, çı ku bona mıletên mayin hesab dıbe tışteki qanûni, jı bo Kurda qedexe ye. Lê emır bı xwe rastkırına dıke nava pêşdaçûyina bûyera. Nesafikırına pırsa Kurda û nivero ne çareserkırına wê pêlên nû pêş da tine lı Kurdıstanê. Lı vê derê em nıkarın aksiomeke (rastiyeke) jineweri bir neyinın: "Çareserkırına her pırsgırêkê, tê hesabkırın, gava ew rast tê çareserkırın"...

Evan hemû faktorên der û hundur hatın hesabhıldan û angori wan rêxıstınên Kurd yên netewi hatın ser wê bir-baweriyê, ku bê perçebûna dewleta İraqê usa bıkın, ku dewleteke fêdêrativ bê sazkırın, kiderê Ereb û Kurd weke du gelên xweyi dewlet sinorê dewletekê da hevra bıdebırın. Ev praktika jı diroka gelek welata eyane û inthama (ezmûna) çax û deman derbas kıriye.

Dı ve rewşê da 19-ê gulanê sala 1992-a lı Kurdıstana İraqê hılbıjartınên parlamênta Kurdıstanê çêbû. Hılbıjartın bı ruhê dêmokrati û aza derbas bûn. Komisiya rêxıstınên Kurda û ya navnetewi kontrola derbaskırına hılbıjartına kırın. Çawa dıhat texminkırın lı parlamentê himli nunerên herdû partiyên sereke; PDK û Yekiti Niştiman hatın hılbıjartın. Nunerên mıletên bıçûk, bı taybeti, Aşûriya lı parlamentê ciyê xwe gırtın. Bona parastına êxtiyariyên mıletên bıçûk, bıryar hat dayin, weki selefa derbaskırına dêpûtatê (mebûs) wan bê nımzkırınê. Bı saya vê yeke 5 dêpûtatên Aşuriya hatın bıjartın.

4-ê Heziranê sala 1992-a Parlamena Kurdıstanê ya netewi hukûmet amadekır. Lı hukûmetê kursiki wezira nunerê Aşuriya stend. 4-ê kanûna pêşın sala1992-a parlamênta Kurda dêklarasya qebûlkır derheqa yekıtiya federe da, wek bıngeha dewleta İraqê. Lı wır dıhat gotın, weki dı rewşa iroyin da "gelê Kurd wek merıveki bıryar da, ku pêwendiyên xwe bı hukumeta navendi ra ser bıngeha fêdarativ saz bıke lı İraqa demokrati da".

Dêklarasiya parlamênta Kurda lı welatên dınyayê ne weke hev hat qebûl kırın. Hêzên dêmokrati û libêral ew dêklarasiya begem kırın û hesab kırın çawa tışteki normal û heqi. Evê dêklarasiyê geleki hukûmetên ku Kurdıstan perçe kırıne, acız kır. 12-15 Kanûna Pêşin sala 1992-a lı Ankarê wezirên karên der ên Tırkiyê , İranê û Sûriyê pırsa derheqa "bûyerên lı Kurdıstana Başûr ("İraq") enenekırın û dıgel dıjitiyên nava wan da bı yekdengi hatın ser qırarekê. Wezira elam kır, weki ewana geleki xemkêş ın bona "rewşa Kurdıstana İraqê û dıji perçekırına axa İraqê ne". Rast e, pêwendiyên hukûmeta İraqê bı van hersê welata ra xırab bûn, lê Bexdad, çawa hertım, bı bıryara wan ra qail bû. Pırsa Kurda mereza herçar dewleta bû û her gaveke dıji Kurda bı yekdengi dıhat begemkırın.

Jı 27-31 Kanûna Pêşin sala 1992-a lı bajarê Seleheddinê

rêxıstınên opozisyon ên İraqê cıvina xwe çêkırın. Vê derê agahdariya tevayi hat qebûlkırın û lı wır dıhate gotın, weki "ew pêşda tên çawa pıştovanê dêmokratikırına Kurdıstana İraqê, bı taybeti dı pırsa hukûmeta fêdêre da lı Kurdıstanê. Parlamenta Kurda û rêxıstınên opozisyon elam kırın, weki dı bıngeha nızama siyasi ya İraqê de gereke prinsipa "yektiya İraqê, dêmokratizm, pırpartiti û fêdêralizmê bê danin".

Prosêsa dêmokratikırına Kurdıstana İraqê, sazbûna deshelatên netewi yên serxwebûnê, dı rewşeke siyasi gıran û dıjwar de derbas dıbûn.

Herêma dewlemend, Kurdıstana İraqê, seri-bıni wêran bûbû. Bı milyonan Kurd bê mal û hebûn mabûn û ebûra wan ne dıbû. Ekonomi herıfi bû. Malhebûna gunditiyê ketıbû rewşeke gıran. Rêjima Saddam berk siyaseta tarkırına Kurdıstanê derbaz dıke. Tırkiyê hındava xwe da dıjwari çêdıkır û çêdıke dıji stendına alikariya mırovayeti bona Kurda jı Avropayê û Amêrikayê. Dıjitiya Navbera PDK û YN aliki da û ya wana û PKK aliyê mayin da bû kaniya trajêdiya û bedbextiya Kurda.

Dı vê rewşa han da pêşdaçûyina prosêsa serxwebûna Kurdıstana İraqê nıkarıbû normal bıhata seri. Ser vê rê asêgehên mezın hebûn; çı êd der, çı êd hundur. Wêranbûna êkonomiyê, xelayi, kesibti û tunebûna mal-hebûna bı hezara Kurd xıstıbûn rewşeke usa, weki her demekê tıştê heri xırab dıkarıbûn bıqewımın. Pêwendiyên sert û xırab yên navbera PDK û YNK da bûne bıngeheke sereke bo gıraniya rewşa herêma kurdi. Bı rasti dezgayên diwana netewi lı Kurdıstana Başûr dıkarıbûn yekitiya rasti çêkırana. Lê mıxabın ew pêş da neçûn, qewin nebûn û ciyê xwe negırtın, kar nekırın bona tamkırına cıhazê dewleta netewi. Dı wan dergeh-diwana da gelek cara karê partitiyê dı ser yê dewlet-diwana netewi ra dıhat danin.

Institut kurde de Paris

Sertbûn û xırabiya navbera herdû partiyên sereke lı Kurdıstana başûr deha zêde bû gava dema hılbıjartınên parlamênta Kurda nêzik bû. Gerek bû ew dı gulana 1995 an da derbaz bıbûna. Bı vê pırsê va gırêdayi hewaskar û balkêşên elametiyên serokên herdû partiyên mezın lı Kurdıstana Başûr dı derheqa hılbıjartınên parlamêntê da. Awa, nava elametiya seroketiya PDK da ew bir-baweri dıhat kıvşê, weki nava hılbıjartınên nû da kompromis û prensipa "wekhevtiyê" goti nebe asêgeh lı ser riya encamên hılbıjartınê objêktiv û parêvekırına ciya lı dezgayên dewlet-diwanê. Serokê YNK hındava xwe da havinê sala 1993-a agahdari da derheqa wê yekê da, weki encamên hılbıjartına çı dıbın bıra bıbın, lê Yekiti Niştiman wê bıxwaze ku ciyên lı parlamênta Kurd û lı dezgayên diwanê bên parevekırın bı prensipa 50:50. Çawa tê texminkırın, hiviya herdû partiyan jı encamê helbıjartına ne weke hev bûn û bı vê yekê prinsipa 50-50 dıkete bın pırsê. Eva hesab dıbû sedemeke esasi bona xırabbûna pêwendiyên PDK û YNK.

Pêwendiyên nava herdû partiyên sereke da xırab dıbûn usa ji bı sedemên mayin. Xasıma lı ser pırsa parevekırına kara ku jı gumrıka dıhat stendın. Bı vi teheri rewşa sıyasi lı Kurdıstana Başûr sert û dıjwar bû, menike bıçûk dıkarıbû ew bıgihanda tehlûkeyeke mezın. Dewletên cinar bı guhdarike mezın dina wan lı qewmandınên Kurdıstanê bû û şansê xwe bernedıdan bona konflikt û şer çê bıkın dı nava hêzên Kurda da. Em binın bira xwe hukûmetên Tırkiyê, İranê û Sûriyê (dı vê pırsê da İraq ji bı wan ra bû) jı Gulana sala 1992 da her şeş meha carekê cıvinê xwe dıkırın, pevguhastına fıkra dıkırın, weki çawa asêgeha çêkın lı ser riya serxwebûna Kurdıstana Başûr. Ewana bı hostati dıjwariyên Kurdıstanê bı kar dıanin, bı destên agêntên xwe pêwendıyên PDK û YNK hê xırabtır dıkırın, her teheri dıxebıtin, weki dıjitiya herdû partiya derbazi şerê çekdari bıbın.



Institut kurde de Paris

Usa ji qewımi. Destpêka Gulanê sala 1994-a navbera hêzên PDK û YNK şerê çekdari destpê bû. Eva kareki malwêrantiyê bû, diyarike bêqimet bû jı dıjmınên Kurd û Kurdıstanê ra. Kurdıstan kete nava agırê xwekuştınê.

Şerê dı navbera herdû partiyan da lı herêma Qeladizê destpê bû, lê zutırıkê derbazi herêmên mayin bû. Paşi şerê çend meha YNK himli mentiqên Soran kontrol kır, lê êd PDK lı mentiqên Behdinanê. Xêlekê şûnda YNK Hewlêr hılda destê xwe. Parlamênt û hukûmeta Kurda şerpeze û betal bûn. Evan qewmandına derbeke gıran lı tevgera Kurda ya netewi xıst. Rewşa Kurdıstana Başûr hevpıçıki hê gıran bû, gava PKK ji kete nava vê dozê. Destpêka sala 1996-a hêzên PKK tevi yên YNK êriş bırın ser hêzên PDK. Temamiya hêzên netewi yên Kurda berk gunehkar kırın ev şerê bırakujiyê, deha rast ê xwe kujiyê.

Her hêzeke netewi, her merıveki nıştimanperwer kete nava mıtalên kûr û dûr. Çawa, çıma bı çı sedemê hêzên Kurda yê sereke şansêki "jı ezmana hati" jı destê xwe berdıdın û pexlemê lı karê sazkırına dewleta Kurda dıxın? Wêra tevayi ragıhandınên M. Barzani û C. Talabani wextê destpêka şerê xwekujiyê bala merıva dıkşının ser xwe. Wan herduya ji gotın, weki hazır ın vi şerê malwêraniyê bıdın seknandın. Merıv nıkare neyê ser fıkrekê, ku qewmandın jı serê seri da heta radeyeke mezın jı bın kontrola serkarên YNK û PDK derketın. Gûrkırın û fırehkırına şer da kareki qırêj quwetên hundur û illahi yên derva dıkırın.

Tışteki eşkere ye û ferıh tê texminkırın, weki tıliya qewetên dereke nava van qewmandına da heye. Bıryarên hukûmetêd cinar derheqa nehıştına sazkırına bıngeha dewleta Kurd ya federe bı desê casûsên wan dıhat mûyesserkırın. Vê rewşê da qewet û hunerê herdû partiyên sereke bı kar danin ne ku bona pêşiya vi şerê malwêran bê gırtın, lê bona

hevkuştınê. Hukûmeta İraqê û hogırên wê aliyê şerê dıji tevgera Kurda ya netewi da her teheri dıxebıtın pıştovaniya Kurda ya navnetewi, vi şertê zor û bıhagıran, jı holê bıdne hıldanê. Ewana her tışt dıdan karaninê bona Avropayê û Amerika bıdne inankırınê, ku "Kurd ne gıhiştıne fêmdariya hemmıletiyê" û şerê wani nav xweyi wê wan ra bıbe "Afxanistana duda".

Bı vi teheri em dıbinın, weki axıriya qewmandınên Kurdıstana Başûr çı dıbe bıra bıbe, lê derseke wê yi sereke ber çava ne: şertê sereke bona serketına tevgera Kurd ya netewi çawa hertım, usa ji vê demê da hesab dıbe yekbûn û tıfaqa hêzên Kurd. Sed mıxabın qewmandınên vê demê nişan dıdın, weki qenckırına vê nexaşiyê dereng û bı bıhaki geleki gıran pêş da dıçe.


1. "Avanti", 20. 09. 1980.

2. "Ireqi letters", 1979, N1, r. 27-28.

3. Disa lı wır.

4. Artur Mgoyan, Tragediya Helebçê (kov... "Kurd" No: 2, Alma - Ata, 1992).

5. "Yazya Kurda lı İraqê", 1990, r. 4.

6. Disa lı wır, r. 7-8

7. Disa lı wır.

8. "Armanc", N: 133, 1992

9. Disa lı wır.


Institut kurde de Paris

# Kurdên Tırkiyê radıbıne şerkariyê

M. A. Hasratyan

Van salên dawiyê rola bızava Kurda lı Tırkiyê bılınd dıbe. Meniya wê ye bıngehi ew e, weki rûyê politika varvêsiyê herêmên Kurda aliyê aboriyê, çandıyê, emrê cıvaki da paş da dıminın, extiyariyên Kurdaye netewi, tên pêpes kırınê.

Pırsgırêka Kurda ciki berbıçav dıgre nava emrê weletê cıvaki da, çımki ew geleki hukûmi ser rewşa politiki û cıvaki dıke. Serokên komara Tırkiyê bı pırsgırêka Kurdaye netewi ra hesab rûnanên û nava dema dûr û dırêj ya hebûna komarê tu akteke qanûndariyê ser mesela Kurda qebûl nekırıne. Bı vê sebebê salên 20-30 gelek tevrabûnên kurdi çêbûn. Ev şerkariya netewiyê-azadariyê dıha gumreh bû paşi inqlaba 27-ê Gulanê sala 1960, gava emrê politiki-cıvaki hıneki pêl da, pêşva çû.

Goveka şerkariya netewiyê-dêmokratiyê lı Kurdıstana Bakûr dawiya salên 70-a dıha fıreh bû. Dı wê demê eşkere û niveşkere lı welêt nêziki deh parti û grûpên Kurdaye netewiyê karê xwe dıkırın. Wana bı zmanên tırki û kurdi rojname û kovar derdıxıstın û bı destê wan aspêktên pırsgırêka Kurdaye cûre-cûre zelal dıkırın. Politika hukûmeta Tırk, dı pırsa Kurda da dıhat rexnekırınê, xwestınên gelê Kurd yên cıvaki û politiki dıanine holê.

Institut kurde de Paris

Evi karê netewi lı Kurdıstana Bakûr hukûmeta Tırk geleki acız û bêsebır dıkır. Hukumetê dest bı teror û şereki fıreh kır dıji tevgera Kurda. Ev têror û şerkariya dıji Kurda bêhtır gumreh bû paşi inqılaba ilonê sala 1980-i, ku bı destê gênêralên Tırk hat kırınê. Tevgera Kurda yê netewi, wê demê derbên gıran xwarın. Angori qanûnên halê eskeriyê bı seda nıştımanperwerên Kurd hatın kuştınê. Bı sedhezara Kurd hatın hebskırınê. Diwanên eskeriyê nûnerên parti û organizasyonên Kurda dane dadgehê. Bı vi teheri gelek endemên Partiya Sosyalist a Kurdıstana Tırkiyê (PSKT), Partiya Karkerên Kurdıstan (PKK) û yêd mayin hatın cezakırınê. Gelek mıletperestên Kurd jı welat derketın û çûn himli lı welatên Avropa Xerbê, Rojhılata Navin û Nêzik. Vıra wana karê xwe berdewam kır.

Nenıhêri politika hukûmeta Tırk ya paşverû ya asimilasiya û undakırına gelê Kurd, evi gelê pırmilyon reng-rûyê xweyi netewiyê, zmanê xwe, çand û erf-edetê xwe xweykır. Hukumeta Tırk reqemên resmi derheqa Kurda nabêje, statistika vê pırsê nayê holê. Dı ruyê vê yekê da çetın e merıv reqema Kurda a rast lı Tırkiyê bêje. Dı diroka komara Tırkiyê da hesabkırına bıneliyê vi welati 13 cara hatiye derbazkırınê. Yên paşin dı van salan da hatıne derbazkırınê: sala 1970, 1975, 1980, 1985 û s.1990. Lê jımarên derheqa wê yekê da, ku mıletên ne Tırk çıqas ın, ne hatın diyarkırınê. Meremê vê politikayê ew e, weki hebûna Kurda û zmanê kurdi bê inkarkırınê. Çawa mesele em izbatike awa binın: gava sala 1985-a hesab kırına (jımartına) bıneliya hate derbazkırınê, diwana Tırk jı bo wan merıvê, ên ku vi kari wê bıkın, dokûmentek hazırkır. Lı vır pırseke awa hebû: "xên jı zmanê xweyi dê, hûn çı zmanên mayin zanın?" Tê ra hatıbû ditınê, weki wek bersiva vê pırsê da navê zmanên inglizi, fransi, erebi yanê ji

Institut kurde de Paris

kurdi bıdın. Bona wê yekê, ku vê dokûmentê da navê "Kurd" hatıbû nıvisarê. Dadxwazê bêqeziyabûna dewletê 11 merıvên quluxdar da dadê, çımku bı ditına wan ewan merıvana xwestıne hesina Tırkaye netewiye zeif bıkın, propaganda kurdizmê bıkın. Dadaxwaz jı van quluxdarara hebskırına jı 5-a heta 8 sala xwest. Serda ji, angori besên çapemeniya Tırka pırsa derheqa zmanê dê jı kaxeza hesabkırıne derxıstın (ew hesabkırın sala1990-a derbaz bû). Diwana Tırk dıtırsiya, weki gelek bajarvanên Tırkiyê dı bersiva xwe da, ya derheqa zman da, wê bınıvisiyana "Kurdi" û bı saya vê yekê reqema Kurdaye rast wê bıhata holê.

Angori serekaniyên kurdi sala 1991 lı Tırkiyê nêziki 15 milyon Kurd hebûn. Lê bı hesabê me, reqema Kurda lı Tırkiyê jı 10 milyona ne zêdetır e (17% temamiya bıneliyê Tırkiyê).

Pıraniya Kurda tevayi (kompakt) lı wilayêtên rojhılatê, lı Agriyê, Adiyemanê, Bingolê, Bitlisê, Hekariyê, Wanê, Entabê, Diyarbekırê, Elezizê, Erzincanê, Erzûrûmê dıjin. Lı wilayêtên Agriyê, Bingolê, Bitlisê, Diyarbekırê, Hekariyê, Merdinê, Wanê, Kurd pıraniya bıneliyan ın.

Jı derveyi Kurdıstana Tırkiyê, Kurd, lı Stembolê, Enqerê û usa ji hınek bajarên Anatoliya Navin û Rojavayê (Cihanbeyli, Tokat, Çankiri û ciyên mayin) dıjin. Nenıheri wê yekê, weki hukûmeta Tırk politika asimilasyona Kurda dımeşine, dıbıstana kurdi tunene, rojname û kovarê bı zmanê kurdi qedexe ne, lê disa 80% Kurda, bêtır ên gunda, zmanê tırki nızanın û tenê bı kurdi xeberdıdın. Xên ji wê, Kurd ne tenê bı zmanê xwe xweyi dıkın, lê usa ji çanda xwe yê netewi, sıfetê netewi dıparêzın.

Di nava emırjiyina Kurda da ol roleke kıvş dılize. Kurdên Tırkiyê himli ser dinê islamê ya mezheba sunni ne. Xenji wê



Institut kurde de Paris

250-300 hezar Kurdên Êzdi hene. Kurdên şihi (Elewi yan Qızılbaş) pıraniya xwe va ser mezhebeke (sêkteke) şihizmê Ehlê Heq (merıvên ser riya rastiyê) yanê ji Eli-İlahi. Ewana himli lı Dêrsımê (wilayêtên Tuncêli, Elazig, Malatya, Maraş û êd mayin) dıji.

Cudatiya oli bı temami lı ser tevgera Kurdayê netewiyê hukım kıriye. Lê dı dema iroyin da tesira wê ne weke bere ye, çımki nıha bıngeha sereke ku Kurda dıke yek; femdariya netewi ye, ku dı van salên dawiyê pêş da dıçe.

Wêra tevayi, oliya, ilahi çend sêktên (rêbazên) sofiya hela hê rola wan dı nava emırjiyina Kurdaye ruhaniyê da heye. Evê yekê jı bo xwe dıxwazın bı kar binın ne tenê diwanên Tırka, lê usa ji hınek axa û şêxên Kurda, ku hela hê tesira wan lı ser Kurda heye.

Kurdıstana Tırkiyê wek berê, hesab dıbe herêma welatê here paşdamayi bı spêsifika xwe va. Teritoriya wê weke 1/5 Tırkiyê ye, lı vıra 18% bıneliyên welêt dıjin. Ser her kilomêtreke çargoşe ya Tırkiyê sala 1985-a 66 merıv dıjit, lê lı Kurdıstanê ser wê aqarê 46 merıv dıjit. Jı sala 1980 heta 1985-a reqema merıva ser her km. çargoşe lı temamiya Tırkiyê bı 8 merıva zêde bû. Em wê yekê ji bêjın, weki zêdebûna bıneliya (bûyina zaroka) nava salê da lı Kurdıstanê 3% û ev selef ya welête gışti bılındtır bû. Bı vi teheri em dıbinın, weki reqema bıneliya ser her km çargoşe lı Kurdıstanê zêde nabe. Kijane meniya vê? Meniya sereke ew e, weki hertım bıneliyên Kurdıstanê welat dıhêlın û dıçın herêmên Tırkiya rojavayê, himli lı bajara, çımki êkonomika Kurdıstanê sıst e û kar tune. Nava sala 1989-a tenê jı sê vilayêta (Qers, Agri, Erzurûm) 100 hezar merıv çûn herêmên rojavayê. Sala 1990-a jı Kurdıstanê 663 hezar 500 merıv çûne Stembolê. Ciguhastına bıneliya jı wilayetên rojhılatê ber bı yên rojavayê, paşê ji berdewam bû.

Institut kurde de Paris

Nêziki 70% Kurda lı gunda dıjin, 30% lı bajara (lı temamiya Tırkiyê 50% bıneliya lı bajara dıji).

Bınaxa Kurdıstana Tırkiyê pır dewlemend e. Vıra neft, xromit, fosfat, medenên hesın hene. Lı vır usa ji rêsûrsên (mecalên) ênêrgêtikê hene: tenê istasyona êlêktrikiyê ya Kebanê 11% êlêktroênêrgiya bajarên usa mezın dıde, çawa Edene, İzmir, Stembol. Lı Kurdıstanê fabrike û obyêktê senayê kêm ın. Lı vır tenê 10% karxanên senayê ên dewletê û 2,7% ên privat hebûn. Senaya gıran vê derê tune. Vê herêmê da 18% şekırê welet, 14% sêmêntê û 10% tıştên ris û perçe tê hazırkırınê. Lı Kurdıstanê nêziki 40% heywanetê hûr (himli pêz) tê xweykırınê. 21% axa welêt, ku tê becerkırınê, lı wilayêtên rojhılatê ye. 15% berhema (prodûksiya) malhebûna gunditiyê Kurdıstan dıde. Nıha mexanizasya xwelibecerkırınê lı Tırkiyê û Kurdıstanê berdewam dıbe. Lê lı Kurdıstanê ew kar dereng pêşda dıçe. Awa mesele: lı mentiqên Tırkiyê rojavayê 47% temamiya traktorên welêt kar dıkın, yên navin 43%, lê Kurdıstanê 10%-ê traktora kar dıkın. Eger lı rojavayê Tırkiyê 70% axê bı traktora tê şovkırınê, lı herêmên navin 40%, lı Kurdıstanê ew selef ancax dıghije 20-i.

Bı gışti Kurdıstana Tırkiyê 8% temamiya berhema senayê û 19% berhema malhebûna gunditiyê dıde.

Hılbet, ew çı hat gotınê nade kıvşê, weki lı Kurdıstanê emırjiyin û pêwendiyên cıvaki-politiki nayêne guhastınê. Herêma Kurdıstanê bere-bere dıkeve goveka kırin-fırotana der û hundur. Nıha lı her dera form û cûrên kapitalistiyê ên êkonomikayê tên holê, çawa lı bajara, usa ji lı gunda.

Dewlet dıcêrıbine bıkeve nava karê ciwarkırına qewatên deraninê, dıxwaze zêdetır hebûn û qewatên vê herêmê bı kar bine.

Institut kurde de Paris

Nava planên pênc saliyên Tırkiyê da tê plankırınê ku goti guhdariya taybeti bıdne ser pêşdabırına herêmên paşdamayi, ilahi yên rojhılatê û başûr-rojhılatê. Hukumeta Ozal ji wedê xwe da programeke taybeti çêkır derheqa pêşdabırına herêmên Anatoliya Başûr-rojhılatê. Bı vê programê tera hatıbû ditınê 15 golên avêye mezın, 18 hidroelektristansiya çêkın. Bı baweriya hukûmetê bı saya van çêkırına êlêktroênêrgiya wê bı 2 cara zêde bıbûya, 18 milyon hêktar xweli wê bıhata avdanê.

Lê pıspor û pêşekzana baweriya xwe bı van programa nedıanin, çımku programên usa berê ji dıhatın qebûlkırınê, lê ne dahatın seri. Prêzidêntê Tırkiyê ya nıha Sûlêyman Demirel sala 1990-i meha gulanê wextê seredana xwe lı herêmên başûr-rojhılatê got, weki ew bawer nake ku ev plan wê bên seri.

Pêwist e bê gotınê, weki tenê 10% perê ku dıkın nava karê pêşdabırına êkonomika welêt, lı Kurdıstanê tê xerckırınê. Bı taybeti gıli derheqa kapitalê privat da ne. Çıqas ji bona wi kapitali peymanên baş tên sazkırınê xudanên wê xwe nadın ber wi kari. Meniya sereke ew e, weki lı Kurdıstana Tırkiyê rewşa politikiyê ne baş e. Hındava xwe da bûrjûvaziya Kurda ji kapitalê xwe dıha zû dıke nava karê herêmên rojavayê. Bı vê yekê ew dıbe hevkarê firmên Tırkaye privat.

Diwanên Tırk xwestın bona pêşdabırına herêmên başûr-rojhılata Tırkiyê kapitalê welatên dereke bıdın karaninê. Awa, meha gulanê sala 1986 mêclisa Tırkiyê qanûnek qebûl kır, ya ku izın dıda kompanyayên dereke lı Tırkiyê xweliyê bıkırın.

Van salên paşin nava cıvaka Kurda da guhastın çêdıbın.

Bıneliyên Kurd himli nava malhebûna gunditiyê da kar dıkın. 72% Kurda xebata gunditiyê dıkın. Hewaskar e em dina

Institut kurde de Paris

xwe bıdne teşkila karkerên gund. Tırkiya rojhılatê 22 wilayêtên wê hene; salên 70-i 30% gundiya xweliya wan tunebû; dı wê demê da 42% temamiya xweliyê destê 5,3% mılkedara da bû. Lı gunda tenê 3% malhebûnên xwelibêcerkırınê dıkarın têxnika malhebûna gunditiyê bıkar binın.

Lı Kurdıstana Tırkiyê çawa lı gunda, usa ji lı bajara gelek guhastınên cıvaki çêdıbın. Lı gundên Kurda pêwendiyên fêodaliyê jı holê tên hılaninê. Bere-bere bûrjûvaziya Kurdaye gund tê holê, malhebûnên kulaka kar dıkın.

Pêwendiyên cıvaki yê kevn tên guhastınê û reqema gundiyên bê xweli zêde dıbe. Gundiyên bê xweli nıkarın lı gundan jı xwe ra kar bıbinın û bı mecbûri dıçın herêmên Tırkiyayê rojavayê pêşdaçûyi û Avropa xerbi. Vê derê ewana karê heri gıran û erzan dıkın.

Kurda hertım nava emırjiyina Tırkiyê politiki dewletê da roleke aktiv listiye. Hela dema İmparatoriya Osmani da Kurda gelek qulıxêd bılınd da kar dıkırın, sereskerên navdar bûn. Bı aktivi ewana tevi bûyerên salên 1919-1922-a bûn.

Pêwist e bê biraninê, weki sala 1920-i gava lı Ankarê meclisa Tırka hat damezırandınê dı nava wê da 70 Kurd hebûn. Eva izbatiya dıde kıvşê, weki Kurd qeweteke aktiv bûn dı nava emırê Tırkiyê politiki da.

Lı Tırkiyê partiyên Kurdaye politikıyê qedexe ne. Lema ji lı meclisa welêt, organên diwanêye ci nunerên Kurda tên bıjartınê bı navnişên partiyên Tırka, yanê ji çawa nûnerên "serbıxwe". Bı vi teheri lı parlamênta Tırka her tım nûnerên netewê Kurd hebûne. Rast e ew tên bıjartınê himli jı terefê bajarvanên Kurd, lê ewana nıkarın pıştgıriya Kurda bıkın, çımki bı zagonên Tırka dêpûtat hesab nabe nûnerê heremekê, ew hesab dıbe nûnerê welêt gıştì. Ya sereke ew e, weki lı diwa-

na herêma da û lı parlamentê Kurd nıkarın karê xweyi netewi bıparêzın, çımku ew yek bı zagonên Tırka qedexe ye.

Dı nivê salên 70-i emırê politikiyê lı Tırkiyê aktiv bû, tevgera Kurda gurtır bû. Dı vê demê da serbajarên çend bajara lı rojhılatê Kurd hatın bıjartın. Lê paşi inqlaba sala 1980-i, gava esker hat şerê hukûmetê ewana hatın hebskırınê û gunekarkırınê bona propaganda "kurdizmê", "sêparatizmê" û tevi gelek Kurdên mayin bı demeke dırêj lı hebsxana bûn.

Rêprêsiya dıji Kurda paşi derba eskeriyê ya sala 1980-i hê zêde bû. Lê nenıheri vê yekê kar û xebata partiya û organizasyayên Kurda nesekının.

Vê gavê tevgera Kurda ketiye heyameki nû. Eger berê salên 20-i serokatiya tevgera Kurda himli serokeşira û serokên ruhaniyê (oli) dıkır, nıha ew serokati ketiye destê partiya, ên ku bernamê wan jı bo safikırına pırsa netewi hene.

Dema iroyin lı Tırkiyê û welatên Avropa xerbi nêziki 10 partiyên politiki yên Kurdên Tırkiyê kar dıkın. Jı wan partiya ên sereke hesab dıbın: PSK (Partiya Sosyalist a Kurdıstan, lidêr Kemal Burkay) û PKK (Partiya Karkerên Kurdıstan, lidêr Abdullah Ocalan).

Hebûna gelek partiyên Kurda şedetiya wê yekê ye, weki nava tevgera Kurda da yekıti tune, rêxıstınên idêologi û politikiyê cûre-cûre hene (jı çepên ekstrêmist hema nasyonalistên rastê). Rêxıstınek jı vana pêşda tê bona serxwebûna Kurdıstanê û bona destanina vi meremi şerê çekdariyê dıke. Refê mayin yê tevgera Kurda pêşda tê bona yekbûna (tıfaqa) bı qewatêd welêt û yên herêmêye çepê. Ew rêya safikırına pırsgırêka Kurdaye netewiyê nava pêşketına şerkariya qewetêd progrêsiv, ên Rohılata Navin û Nêzik da dıbinın. Safikırına pırsgırêka Kurda bı ditına wan bı cûrê otonomiyê yanê ji fêdêrasyonê dı nava dewleta Tırka dêmokrati da goti bê seri.

Institut kurde de Paris

Jı Tırkiyê qutbûna Kurdıstanê dema dirokiyê iroyin da ew borcli hesab nakın. Qewata sısiya lı tevgera Kurdaye Tırkiyê da pêşda tê bona otonomiya çandi (kûltûri) dı hıdûdê Tırkiyayê da. Perçeki rewşenbirên Kurda ji ser vê fıkrê ne. Nûnerên vi terefi berbıri cıvak û organizasyonên navnetewi dıbın û dıxwazın, weki diwanên Tırk halê eskeriyê lı herêmên Kurda bıdne hıldanê, iznê bıdın ku Kurd zmanê xweyi dê kar binın, çanda xweye netewi pêşda binın, lêtêratûra xwe aza çap bıkın.

Hınek Kurd hene, ku naxwazın tu guhastın dı cıvaka Kurda da çê bıbın. Evana ew merıv ın, ên ku xweyê karxanê mezın ın lı bajarê mezın (Ankarê, İzmirê, Stembolê), mılkedarê xweyê hebûneke mezın ın û hukûmê wan ser beşeki bıneliya heye. Ewana serkariya welet ra gırêdayi ne û qulıxê mezın destê wan da nın, endamê meclisa welêt ın.

Lê pêwist e bê gotınê,weki bın hukmê tevgera Kurdaye netewi da nava vi perçê netewê Kurda da ji guhastın tên kırınê, hısina wane mıletiyê tê holê, bere-bere dıkevın nava politika pırsgırêka Kurdaye netewiyê.

Guhastına berbıçav nava tevgera Kurdaye netewiyê da nivê salên 80-ê pêşda hat. Dı wê demê partiyên Kurda û Tırka yê çep, nava wan da usa ji Partiya Komûnist a Tırkiyê, bı hevra pêş da hatın. Van partiya bı tevayi meha Çıleyê Pêşin sala 1984-a organizasyonek bı navê "Yekıtiya Çep ya Tırkiyê û Kurdıstana Tırkiyê" çêkırın. Lê dı navbera terefên wê dıjiti (hevra qailnebûn) çêbûn û ew dawiya sala 1988-a bela bû.

Dawiya sala 80-i partiyên Kurda xwestın karê xwe bıkın yek (hevra bıdın qailkırınê). Meha Hezîranê sala 1988-a lı Cebhê hat çêkırınê bı navê "Tevgera Azadariya Kurdıstanê (Tevger)". 8 parti û komên siyasi ên Kurda ketın nava wê. Cephê gazi hemû nıştımanperverên Kurd kır, ku bıbın yek û

şerkariyê bıkın bona azadiya gelê Kurd. Ewê name şand jı bo Encumena Netewên Yekbûyi, organizasyonên ku bı wê ra gırêdayi ne, welatên dêmokrat, komelên hûmanistiyê, organizasyonên jına û ciwana, hemû merıvên xêrxwaz, ku pıştgıriya şerkariya gelê Kurd bıkın. Lê mıxabın, ev name bêdeng ma.

7-ê Çıriya Paşin sala 1982-a rêfêrêndûm hat derbazkırınê û ser himê wê destûra Tırkiyê teze hat qebûlkırınê. Dı vê destûrê da politika hukûmeta Tırkiyê şovinistiyê bı qanûndari hat izbatkırınê.

Destûra Tırkiyê iroyin, weke ên berê, mafên çarenûsi ên gelê Kurd nas nake, extiyariyên wê ye netewi hılnade ser hesêb. Ev destûra bı qanûndari politika Tırkiyê ya asimilasiya mıletên bıçûk tine holê.

Bı formal destûra sala 1982-a extiyariyên hemû bajarvanên welat weke hev dıbine. Awa mesele, pêşgotına destûrê da tê gotınê, weki "her bajarvaneki Tırk (Türk vatandaşi) izna wi heye emreki layiq derbazke dı nava çanda netewi da, pêşketınê da (progrêsê da) û dı vê rewşê da halê xwe abori û çandi xweş bıke." Dı mıqala 10-a tê gotınê, weki "merıv gışk ber qanûnê weke hev ın, bê fırqiya zmên, rasayê, rengê cerm, bir-baweriyên politikiyê, dınêditına filosofiyê, din hebandınê û êd mayin".

Lê gava merıv mıqalên destûriyê mayin ra dıbe nas, tê diyarkırınê, weki lı wır wekhevtiya usa tune. Awa, mesele, dı pêşgotınê da tê gotınê, weki "sûvêrênitêt (serxwebûn) bêyi tu şert û peymana ya mıletê Tırk e". Ev fıkra dı mıqalên mayin da berdewam dıbe: "Kompêtênsiya (izın, extiyariya) qanûndariyê jı navê mıletê Tırk" Cıvina Netewiyêye Mezın ya Tırkiyê (CNMT) miaser dıke (mıqala 7); "Kompêtênsiya mehkemê jı navê mıletê Tırk tê miyaserkırınê". (mıq.9); "Her Tır-

Institut kurde de Paris

kek izna wi heye bıkeve qulıxa dewletê" (mıq.70); "Her Tırkeki, ku 30 saliya wi temam dıbe, dıkare çawa dêpûtat bê bıjartınê" (mıq.76).

Lê rewşa wan merıva, ên ku ne Tırk ın, çawa dıbe? Angori destûra Tırkiyê usa tê stendınê, weki lı vi welati tenê Tırk dıjin. Lê ew ku lı vır nêziki 30 mıletên başqe-başqe hene û reqema wan jı 15 milyona zêdetır e, mıqala 66 dıbêje: "Her merıveki ku pêwendiyên bajarvaniyê va bı dewleta Tırk ra gırêdaye; Tırk e". Lê dı mıqala 42-a tê gotınê: "Tu zmaneki mayin, xên jı yê tırki, nıkare dı xwendegehan da çawa (wek) zmanê dê". Bı gıliki mayin, zarokên mıletên ne Tırk, nava wan da usa ji ên Kurda, izna wan tune bı zımanê xweyi dê hin bıbın.

Rast e, paşê dı wê mıqalê da tê gotınê, weki "bıryarên peymanên navnetewi tên xweyikırınê". Çawa tê kıvşê gıli derheqa Peymana Lozanê ye ya sala 1923-a. Mıqalên vê pêymanê yên 37-44-a derheqa extiyariyên mıletên Tırkiyê nemısılman da nın. Angori mıqala vê peymanê 37-a, Tırkiyê borc hıldaye ser xwe, weki qewl-qırarên ku dı mıqalên 38-44 da hene tên hesabkırınê çawa qanûnê esasi û izna Tırkiyê tune tıştê usa bıke, ku dıji van şerta bın... Pêwist e bê gotınê, weki diwana Tırka hertım van borcedariyên Peymana Lozanê dıterıbine. Derheqa vê yekê da çend mıqalên destûra sala 1982-a şedetiyê dıdın. Lı destûra Tırkiyê nuqteke taybeti (ya 26-a) heye, lı wıra tê gotınê: "Bona belakırın û diyarkırına bir-baweriyên xwe izın tune zmanê qedexekıri bı kar binın". Lı vır, helbet, gıli derheqa zmanê kurdi da ne. Lı nuqta destûrêye 28-a tê gotınê: "İzın tune bı zmanê qedexekırê tışteki çap bıkın". Lı destûra sala 1961-a nuqta usa tunebû. Berê bı zımanê kurdi geleki kêm, lê disa tışt dıhatın çapkırınê. Lê nıha destûra sala 1982-a bı qanûndari wi kari qedexe dıke.

Institut kurde de Paris

Destûra Tırkiyê ya iroyin terefê politiki da armanca wê ya sereke ew e, weki riya tevgera gel, ya qewetên dêmokratiyê bıgre, nehêle, ku şerkariya Kurdaye netewiyê pêş da here. Bona wê ku eva yeka baş bê xanêkırınê em çend nuqtên destûra Tırka binın:

Nuqta 12: "Tu extiyari û azadiyên bıngehi, ên vê destûrê nıkarın bên karaninê bona xırabkırına yekitiya dewletê, welat û mılet, pêşdahatına xeterê jı bo dewlet û komara Tırka...". Nuqta 68-a: "Qanûnname û bernamên partiyên politiki nıkarın dıji yekitiya dewletê, welat û mılet bın..." Nuqta: 122-a "Eger karê çekdari destpêbıbe û qeziya çêbe bona yekitiya welêt û mılet, şêwra wezira dıkare halê taybeti elamke çawa lı hınek wilayêta, usa ji lı temamiya welêt. Nuqta 143-a rê tê ra dıbine, weki mehkemên bêqeziyabûna dewletê bên sazkırınê. Ev mehkeme wê wan şuxula bınêrın, ên ku gırêdayine bı kar-xebata dıji yekitiya welêt û mılet ra, dıji bêqeziyabûna dewletiyê hundur û der."

Bı izbati destûra Tırkiyê iroyin extiyariyên mıletên ne Tırk pêpes dıke. Serokên Tırk bı qanûndari bıngeh çêkırıne bona asimilasyona Kurda. Angori vê destûrê sala 1983-a meha Gulanê, zagon hat qebûlkırınê derheqa ci-warê jiyinê ("Milli İskan Yasasi"). Ser himê vê qanûnê xwedêgıravi bona "bêqeziyabûna netewiyê" diwanên Tırk izna wan heye bıneliyên welêt jı ciki rakın û buguhêzın ciyê mayin. Bı vê qanûnê gelek malên Kurda hatın sırgûnkırın û şandın herêmên xerbê.

Çıriya Pêşin sala 1983-a lı Tırkiyê zagon qebûlkırın derheqa karê çapemeniyê, ya ne bı zmanê tırki (Zagona No: 2932). Heyşt nuqtê wê zagonê hebûn. Angori nuqta pêşin izın tune, ku bı zmanê qedexekıri bir-baweri bên çapkırınê. Nuqta duda qedexe dıkır çapkırın û belakırına ditın û bir-baweriyên merıva bı zmanên ku ne resmi ne lı dewletên ku

Tırkiyê naskıriye, lê ew zman lı ba me qedexe ye. (Lı vır eşkere tê kıvşê, weki gıli derheqa zmanê kurdi da ne -werger-). Nuqta sisiya zmanê dê, bona bajarvanên Tırk hesab dıbe zmanê tırki. Xên jı zmanê tırki tu zmanê mayin nıkare bê hesabkırınê zmanê dê. Angori nuqta 4-a, kesê ku van qanûna dıterıbinın, tên cezakırınê (hebskırına heta 3 sala).

Bı izbati zagona No: 2932 karanina zmanê kurdi dı hemû derecên cıvaki-politiki û çandê da qedexe dıke. Xên jı wê gelek zagonên mayin ji hatıne qebûlkırınê, ên ku mafên çarenûsi ên gelê Kurd pêpes dıkın.

Dewletê da Tırk gelek karê mayin ji kırın dıji gelê Kurd. Awa mesele, angori deng-basên çapemeniya Tırka paşi inqılaba eskeriyê (sala 1980) navê 80% gundê Kurdıstanê hatıne guhastınê. Bı taybeti lı wilayêta Agri navê 376 gundê Kurda (jı 558) hatıne guhastınê, lı wilayêta Wanê 426, lı wilayêta Mûşê 289, lı wilayêta Bedlisê 229. Bı gotına diwana Tırk eva yeka tê kırınê bona "reheti û bêqeziyabûna welêt."

Destpêka nisanê sala 1985-a ser Zagona derheqa gunda da tışt hatın zêdekırınê. Angori wan "parastına gunda" hat çêkırınê. "Parastına gunda" (Qoruci) goti gıva hebûna gunditiyê û wana bı xwe bıparêze. Diwanê çek dane wana û wana ra heqiyata hermeh kıvş kır. Evan "qoruciya" bı meniya şerkeriya dıji "terorista" dest bı tıştên xırab kırın dıji bıneliya. Evê yekê şıkyat pêş da ani ne tenê nava gelê sade da, lê usa ji nava serokatiya Kurda da. Awa mesele, serokê qebila adiyan Dûrmaz axa (Bilên) lı Sêrtê meha sıbatê sala 1986-a tevi komeke Kurdaye mezın hat Ankarê û ber diwanê şıkyatê wan "qorûciya" kır û xwest weki bıneliya jı wana bıparêzın.

Bona kırınêd xweye nemerdi dıji gelê Kurd efû bıke, dewleta Tırk bı destê propagandayê şer-buhtan avitıne tevgera Kurda. Gunekariya wane sereke ew bû, weki Kurd "dıxwa-

Institut kurde de Paris

zın dewleta Tırk perçekın". Van salên paşin propaganda xweye dıji Kurda ra tevayi, dewleta Tırk qeweta eskeriyê da karaninê. Tevi vi kari dıbûn eskerê Tırka, hêzên dewletiyê bêqeziyabûne, texbûrên "komandos", "qoruciyên" kırêkıri. Derheqa van kırınên xweye dıji Kurda diwana Tırka dıgot û dınıvisi, weki ew şerkariyê dıkın dıji "sêparatista", "qeziya yekitiya welêt," "komên komûnistiyê", "marksistiyê", têroristiyê, ên ku pışta Kurda dısekının. Agêntiya Anatoliyayê deng-besa hertım informasyon dıda derheqa wê yekê da, weki lı Kurdıstana Tırkiyê rewş gıran e. Deh sala zêdetır lı vır şerê çekdariyê dıçe nava eskerê Tırka, "qoruciya" û komên Kurda, payê pırê terefdarên Partiya Karkerên Kurdıstanê (PKK). Diwana Tırk dıbêje, weki PKK û terefdarên wê êrişi ser gunda, obyêktên eskeriyê dıkın, merıva dil dıgrın, aktên teroristiyê dıkın.

Angori deng-basên rojname û radyoya Tırka 10-ê hezirane sala 1990-i lı gundê Gêrê (Çevrimli) qeza Şirnaqê bı destê gerilên PKK 26 merıv hatın kuştınê, nava wan da 12 zarok û 7 jın. Diwanê dest bı kampanya dıji Kurda kır. Nûnerên Tırk agahdari dıdan welatên dereke û dıgotın, weki ew goti pıştgıriya van "têrorista" nekın, kırınên wan goti bên gunekarkırınê.

Lê izbati hene derheqa wê yekê da, weki ew xunrêtın ne ku bı destê PKK, lê jı terefê "komandosên Tırka da" hatiye kırınê. Derheqa vê yekê da nunerê PKK lı Avropayê 13 hezirane sala 1990-i agahdari da. Tışteki balkêş e, weki hukûmetê ne dıhişt, ku bı paki izgeriya vê gunekariyê bê amedekırınê. Evan kırınên diwana Tırka hatın gunekarkırınê jı aliyê serokê Partiya Gel a xebatkara Fehmi İşiklar, zanyarê Tırk ya navdar İsmail Bêşikçi, nunerên partiyên Kurdaye netewiyê, nava wan da usa ji ew parti û rêxıstın, ên ku kırınên PKK

êkstrêmistiyê rexne dıkın. Bona zelalkırına vê gunekariyê komisyonek hat amedekırınê, ewê ci da izgeri kır û hat ser wê fıkrê, weki lı Şirnaqê xwina Kurdên am-tam bı destê Mit´a Tırka hatıbû rêtınê. Pêwist e bê gotınê, weki tıştên vi teheri jı terefê diwana Tırka da berê ji dıhatın kırınê. Armancê propaganda Tırka derheqa şerkariya dıji "têrorista da" ew bû, weki hemû rêxıstınên welêt bıke yek dıji tevgera Kurdaye netewiyê, bona efûkırına politika şovinistiyê dıji gelê Kurd. Dewleta Tırk êdi nıkare bê qeweta eskeriyê serkariyê lı herêmên Kurda bıke. Lema ji 9 sala lı wilayêtên Diyarbekırê, Sêrtê, Mêrdinê û Hekariyê halê eskeriyê hatıbû çêkırınê. Tenê 19 Tirmehê sala 1987-a ew bıryar hate hıldanê. Lê paşi wê hukûmetê bıryar da weke zagonê. Gori wê 8 wilayêt: Diyarbekır, Sêrt, Mêrdin, Hekari, Tûnceli, Bıngol, Wan, Elazig dıketıne nava goveka herêmekê û ew herêm dı bın hukmê diwana eskeriyê bû. Serokatiya vê herêmê extiyariyên wê pır mezın bûn. İzna wê hebû:

1. Temamiya ci-warê karkırınê, avayi û xani, transport, xebatçiyên organizasiyayên cıvakê ên ser axa vê herêmê bın hukmê xwe da bıhêle;

2. Serokatiyê lı organên parastına dewletê bıke;

3. Eger pêwist be gazi qewetên eskeriyê bıke;

4. Merıvên quluxdar jı xebatê derxe yan ji kıvşke ser xebatê (xên jı cendırma, qadiya û dadexaza). Destê vê diwanê da gelek tıştên mayin hebûn, xwey-xudantiya temamiya emırjiyina vê herêmê destê vê diwanê da bû û her tışt dıhate kırınê, weki kontrola berk lı ser Kurda bê kırınê.

Bı vi teheri qaymeqaymê halê eskeriyê lı vê herêmê temamiya diwanê hıldabû destê xwe, izna wi hebû bı her teheri tevgera Kurdaye netewi xısarke.

Institut kurde de Paris

Destpêka meha gulanê sala 1990-i evê diwanê bıryar da, weki lı wan wilayêta, yên ku dıkevın bın hukmê diwana eskeriyê (Bingol, Diyarbekır, Elazig, Hekari, Mêrdin, Sêrt, Tuncêli, Wan, Adiyaman, Bêdlis û Mûş) bê izna diwanê boykot, kar berdan, dadana karxana qedexe ye. [6]

Meha gulanê sala 1990-i meclisa Tırkiyê "bona şerkariya dıji têrorizmê" zagon qebûl kır. Angori wê zagonê herêmên Şırneqê û Batmanê dıhatın hesabê wek wilayet. Xên jı wê, angori wê zagonê pênc qezayên teze hatın sazkırınê lı Mêrdinê, Sêrtê, Hakariyê, Erzûrûmê û Qeyseriyê. Bı wê ra tevayi navenda şerkariya dıji "têrorizmê" tevi 50 hezar eskerê xwe jı Diyarbekırê anine Batmanê. Nêta van guhastınan ew bû, weki dıha berk şerkariyê bıkın dıji azadixwazên Kurd.[7]

Heta dawiya salên 80-i hukûmeta Tırk ne tenê pırsgırêka Kurda, lê hebûna Kurda bı xwe wek netewek inkar dıkır. Nıha êdi ew mecbûr e dı heyina wê pırsgırêkê da xwe mukur bê. Awa, destpêka meha gulanê sala 1990-i serokê partiya sosyal dêmokrat ya gel Erdal İnönü, wextê seredana xwe lı wilayêtên başûr-rojhılatê lı Diyarbekırê elam kır, weki "pırsgırêka Kurda, pırsgırêka dêmokratiyê ye.. Ne pêwist e, weki merıv gışk bı zımanêki xeberdın". Paşê ewi got, weki eger iznê bıdın Kurda bı zımanê xwe xeberdın, ew nade kıvşê, ku em ber PKK temene dıbın. [8] Nava axaftına xweye mayin da lı cıvina Diyarbekrê Erdal İnönü berbıri gel bû û got: "Derd-kulên we, derd-kulên me ne... Ez gıli dıdıme we, weki eger em bên ser hukmê, emê weke hev (bê varveşi) nêziki her bıneliki bıbın û tu fırqiyê nakın nava wana. Lı vê herêmê her kes goti rehet bı zımanê xweyi dê xeberde, bıstrê û sıtranê kurdi bıbhê. Em nıkarın merıvên usa hesabkın çawa "sêparatist". Paşê ewi gıli da, weki gava ku hukûmet kete destê partiya wi, ewê kapitalê bona pêşdaçûyina herêmên Kurda zêde

Institut kurde de Paris

bıke, lê wêra tevayi dıji wan merıva şerke, ên ku dıxwazın welêt perçekın. Paşi van gıli-gotına bona hurmeta wi nanxwarın hat amadekırınê û Bedri Aysel bı kurdi stra. Seva vê yekê dengbêjê Kurd avêtıne hebsê. [9]

Dı seredana wilayêtên başûr-rojhılatê sêkrêtarê gıştı yê Partiya Sosyal Dêmokrat ya gel, Deniz Baykal ji hazır bû. Nava axaftıneke xwe da ew pırs dani, ku lı welêt institûta Kurda goti bê çêkırınê û ew gerekê bı dirok û çanda Kurda va mıjûlbe. Paşi vê seredana xwe lı Kurdıstanê serokatiya vê partiyê raporek çêkır û dı wır da dıhate gotınê, weki rewşa vê herêmê pır xırab e û pırs dani, ku lı idarên xwendınê tırki ra tevayi usa ji bı zımanê kurdi dersa bıdın. [10]

Xên ji wê, serokatiya partiyê got, weki hazır e qırara xwe bıguhêze, ya derheqa wê yekê da, ku bona tevgeliya nava konferansa navnetewi (Paris, sala 1989-a) "Kurd: mafên çarenûsi û xwexwetiya çandi" dêpûtatên Kurd jı meclisa Tırka derxın. Nenıheri vê yekê diwana Tırka pey wan dêpûtatê Kurd ketıbû û dıxwest wana cezabıke bona karê wan lı wê konfêransê. Bı vi awayi komisiya destûr-huquqetiyê despêka sala 1990-i bıryar da, ku çar dêpûtatên Kurd (Tewfiq Koçak, Adnan Ekmên, İbrahim Aksoy û Mehemed Eli Erên) jı extiyariya destnedayinê mehrûmke û gunekariyê dıji wan rake bona propaganda separatizmê, karê parçekırına welêt. [11]

Meha adarê sala 1990-i prêzidênt Turgut Ozal bıryar da, ya ku bı izbati kart-blanş (izın) dıda qaymeqaymê herêma Kurda bona her tışti bıke dıji tevgera Kurda: izna wi hebû mal û malbata jı ciyê wan sırgûnke, çapxana dade, cezakırına bona gunekariya sêparatizmê du cara zêde bıke û tıştên mayin.

Nenıheri kırınên dıji Kurda, pırsgırêka Kurdaye netewiyê bı firehi lı Tırkiyê dıhat enenekırınê. 5-ê tirmehê sala 1990-i dı nava hevpeyvina xwe da bı rojnama "İzvestiyayê" ra prêzi-



Institut kurde de Paris

dênt Ozal derheqa pırsa Kurda da got: "Ev pırsgırêk kevn e û geleki çetın e. Vê gavê ne tenê cıvaka Tırkiyayê, lê usa ji ya cihanê dina wan lı wê ye. Em bı wê baweriyê ne, weki ew pırsgırêk tenê bi riya dêmokratiyê dıkare bê helkırınê. Ew rê goti bıbe riya heqi û aşıti, ne ya dıjihevtiyê, terorizmê û anarşiyê..." Nava temamiya diroka komara Tırkiyê da cara pêşin serokê dewletê xwe mukur hat bona pırsgırêka Kurda û xwestına xwe diyar kır weya bı riya aşıti hel bıke. Wera tevayi prêzidênt disa berk got, weki her tışt wê bê karaninê bona parastına yekitiya welêt. Ewi got: "Merıv goti zanıbın: tu qewetek nıkare yekitiya komara dêmokratiyê bıterıbine, ya ku dı goveka sinorên netewi da jı aliyê Ataturkê mezın da bı xuna gelê Tırk va hatiye çêkırınê. Û ez agahdariyê dıdım, weki yekitiya komarê wê bê parastınê bı hemû mecala va, hılbet dı sinorê destûrê da". Dawiya axavtına xwe da ewi got: "Bona herêmên başûr-rojhılatê pêwist e demeke dırêj kapital bê xerckırınê, zêdetır pera berdın bona pêşdabırına ekonomikayê. Bı izbati temamiya dew-doza lı herêma başûr-rojhılatê jı paşdamayina wê tê. Eger halê wê xweş be, dereca wê ya çandê bılınd be ez bawer ım, pırsgırêk bı xwe wê helbıbe".

Bı vi teheri serokên Tırkiyayê wek berê, pırsgırêka Kurda hesab dıkın wek pırsgırêkeke aboriyê. Serokên Tırka diyar kırın, weki ew nıkarın pırsgırêka Kurda hel bıkın. Tenê meha Çıriya Pêşin sala 1990-i lı herêma Kurdıstanê jı hezareki zêdetır Kurd hatın hebskırınê. Wek berê diwana Tırka Kurdên ku bı zmanê xwe xeberdıdan ceza dıkırın.

Awa, dawiya Çıriya Pêşin sala 1990-i cıvina şêwra gışti ya komela mafên mırovan derbaz bû. Dı vê cıvinê da nûnerê Diyarbekırê Wêdat Aydin, abûqat Ahmed Zeki Okçuoxlu, serokê organizasiya Diyarbekırê ya partiya gelê xebatkar

Institut kurde de Paris

Mıstefe Ozên bı zımanê xweyi dê, bı kurdi axıvin û bona wê yekê ew avêtıne hebsê. Dı ciyê dadê da Wedat Aydin got, weki kurdi zımanê wi a dê ye û lema ji vır ha da ji ewê bı wi zımani bıaxive. Dadxazê İdara bêqeziyabûnê yê Ankarê angori nuqta 142 (beşê 3-a) ya kodêksa Tırka, gunehkariya bona "propaganda dıji yekitiya hısina netewiyê" hebskırına 10 sala lı wan ra kıvş kır. Paşê Mıstefe Ozên hat azakırınê. Meseleke mayin. 13 Çıriya Paşin sala 1990-i nıviskar û rojnamevanê Kurd a navdar, Mûsa Enterê 80-sali axaftınek kır, bı TV Angliayê ra ser rewşa wilayêtên başûr-rojhılatê. Bona vi kari mehkemê bêqeziyabûnê ew hebskır, çımki, bı gotına wê, "kırına wi hısina netewi ya mılet, sıst dıke". 12-ê Çıleya Pêşin sala 1990-i lı Diyarbekırê lı dadxana bêqeziyabûnê dest bı bersivdana 44 mıletperestên Kurd bû, ên ku hesab dıbûn endamên organizasiyên "bêqanûni û dıji dewletê". Dadxwaz xwest, weki jı wana 7 merıva ra qırara kuştınê derxın, yên mayin hebskırın jı 3 heta 15 sala. Evê neheqiya mezın şıkyat pêş da ani. Cara yekemin sendika welêt bı vê pırsê va mıjûl bû. Serokê sendika "Pêtrol-İş" Mûnir Ceylan got, weki bona dêmokratizasiya welêt ew pırsa kurdi hesab dıke şerteki ferz.[12]

Dı vê rewşê da hukûmeta Tırk mecbûr bû xwe mukur bê, weki extiyariyên hemû bajarvanên Tırk ne weke hev ın. Ewê name şand Şêwra Avropayê. Dı wê namê da dıhat gotınê, weki bajarvanên wilayêtên başûr-rojhılatê (Elazig, Bingol, Tunceli, Wan, Diyarbekır, Merdin, Sêrt, Hekari, Batman, Şirnaq) nıkarın wan extiyariya bıkar binın, ên ku bı "Qayilnıvisara parastına extiyariyên merıva û azadiyên himli" hatıne kıvşkırınê û Tırkıyayê ew qol kıriye.[13]

Hukûmeta Tırk dıxwest xwe bı wê yekê va efû bıke. Bı ditına wê lı herêma başûr-rojhılatê rewş gıran û nerehet e jı

Institut kurde de Paris

rûyê kırınên "têrorista da" vê derê haleki xeter çêbûye. Bı wê ra tevayi hukûmeta Tırk dest jı hınek kırınên xwe ye hışk kışand. Awa, paşi enena du sala ra serokê berê ê bajarê Diyarbekırê Mehdi Zana, ku bona "parastına zmanê kurdi" hatıbû hebskırınê, azad bû.[14]

Gelek dêpûtatên partiya weteniyê, ku lı ser hukûm bû, jı vê bıryarê acız bûn. Wana dıgot, weki politika "yekitiya zman, ol û çandê, wek bıngeha yekitiya dewletê" goti neyê sıstkırınê, çımku ew yek dıbe ber bı perçebûna axa welêt.

Bı vê pırsê va gırêdayi dawiya meha Çıleya Paşin sala 1991-ê Turgut Ozal lı meclisa Tırkiyê rasti 50 nûnerên Partiya Weten hat. Wextê vê rasthatınê da ewi got: "Guhêrandınên qanûndariyê, ku iznê bıdın bı azadi zmanê kurdi bê karaninê, wê rê vekın jı bo Rohılata Navin Tırkiya ber textê guftegoya rûnê. Rasti ew e, ku iro ki dıxwaze bı zmanê kurdi dıaxıve. Zagona ku zımanê kurdi qedexe dıke, sala 1983-a wextê hukûmdariya eskeriyê hatiye qebûlkırınê. Bıra tu kes berxwe nekeve: zmanê resmi, wek berê tırki ye, lı dıbıstana wê bı tırki bıaxıvın..." Dawiyê da Ozal got: "Kurd eslê xwe va (koka xwe va) jı qebilên Turani ne... Demdema ewana dı bın bandura Midya û Farısa bûn. Bı vê meniyê zımanê wana dıghije malbata zımanên Hındi-Avropiyê. Lı Sûriyayê milyonek Kurd dıjin. Nenıheri vê yekê ew pıştgıriya wan dıke (dıde karaninê). Lı welatê me 10 milyon Kurd dıjin. Dıha baş dıbe em wana bıparêzın, ne ku ewana (diwana Sûriyayê, M. H.). Em goti nehêlın, ku ew Kurda jı xwe ra bıdın xebatê".[14 a]

Destpêka meha Sıbatê sala 1991-ê lı meclisa Tırkiyê projêkta zagonê derheqa zımanê kurdi hat enenekırınê, lê meha Nisanê ew zagon hat qebûlkırınê. Angori vê zagonê zımanê dewletê hesab dıbû zımanê tırki, lema ji temamiya organizasiyayê dewletê û cıvakê goti tenê bı zımanê tırki karê xwe

Institut kurde de Paris

bıkın. Her kırıneke dıji vê hesab dıbe bêqanûni û bona wê ceza tê kıvşkırınê bı çapa 2-5 milyon lira. Merıvên ku bona van kırına cabdarın ceza dıkşinın bı çapa 5-10 milyon lira.

Wê ra tevayi nuqta 6-a ya wê zagonê izın dıda bona bı aza karanina zımanê kurdi û ên mayin. Dı wê da dıhat gotınê: "Bajarvanên Tırkiyayê bêy ku qanûnên tırki bıterıbinın, dıkarın bı zman û zaravên cuda bıaxıvın. Bı van zımana ew dıkarın musik çêkın, kasêtên sıtrana hazır bıkın û tıştên wek wan." Dı radyo, TV û ên ciyê mayin da axaftına bı zmanê kurdi qedexe ne. Ew kesên ku vê qanûnê bıterıbinın wê bên cezakırınê bı 25-50 milyon lira. Ew kesên ku bı zmanê kurdi dersa bıdın, wê bên hebskırınê jı 6 meha heta 2 sala û ceza bı çapa 25-50 milyon lira.[15]

Bı vi teheri evê zagona hukûmeta Tırka qedexa zmanê kurdi wek berê hişt û disa varvêşiya dıji çand û zmanê kurdi ma. Bı vê bıryarê hukûmeta Tırk dıxwest cıvaka welêt û jı welêt der bıxalıfine, nerazibûna Kurda kêm bıke û ciyê lıngê xwe lı Rohılata Nêzik û Navin qaim bıke (bı taybeti xwe nişan bıde wek pıştovanê mıletên İraqiyê bıçûk) û cıvaka navneteviyê agahdar bıke, weki ew extiyariyên Kurda naterıbine. Bı izbati hukûmetê izın da weki bı kurdi dı mal da, hewşa xwe da bıaxıvın. Û lı vır tu tışteki nû tunebû. Derheqa vê bıryara hukûmetê da prêzidênt Ozal got: "Eger em zmanê kurdi aza nekın, paşi şerê lı deftenga Farısa da emê dıjwar ber textê guftegoya rûnên".[16]

Buroya der welêt ya Partiya Sosyalist a Kurdıstan, PSK, derheqa vê qırara hukûmetê da 1-ê sıbatê sala 1991-ê agahdari belavkır. Lı wır dıhat gotınê: "Em jı hêzên kolonizatoriyê rıca nakın, ku iznê bıdne me bı aza dı mala xwe, hewşa xwe û baxçê xwe da bı zmanê xwe bıaxıvın. Ev û tıştên wek wan, tıştên parsê û pêkeninê ne. Emê aza û serbıxwe bıjin. Û emê

Institut kurde de Paris

bona vi kari şerkariyê bıkın. Bıra derheqa vê yekê da dost û dijmın zanıbın".

14-ê adarê sala 1991-ê parlamênta Bêlgiyayê rêzolûsiya qebûlkır, ya ku politika hukûmeta Tırkiyê dı pırsa Kurda da gunehkar dıkır û derdıket dıji qebûlkırına Tırkiyayê nava hevalbendiya Avropayê. Dı bıryarê da dıhate gotınê:

"Nûnerên parlamêntê jı hukûmetê hêvi dıkın, weki bı destê hevalbendiya Avropayê, Şêwra Avropayê û Organizasiya Netewên Yekbûyi eşaretiyê bıdne hukûmeta Tırkiyê, weki ew goti Kurdê ku lı herêmên Başûr-rojhılatê dıjin, ciguhasti neke, qanûna halê sırêder, ku lı van herêma heye, bıde hıldanê. Extiyariyên Kurda û mıletên bıçûk ên politikiyê, cıvakiyê û çandê hılde ser hesab, û usa ji pêşniyarê dıke, weki Belgiya dıji qebûlkırına Tırkiyayê lı hevalbendiya Avropayê derkeve, heta ku dı vi welati mafên çarenûsi tên pêpeskırınê û extiyariyên Kurdaye çandi neyên naskırınê. Ew ser wê fıkrê ye, weki Bêlgiya wek endama şêwra bêqeziyabûnê ya ONY goti her tışti bıke, weki problêma Kurda dı konfêransa navnetewi da bê enenekırınê".[17]

Ev qırara parlamênta Bêlgiyayê serokên Tırkiyê geleki acız kır, hıneka jı wana pêşniyar kırın, weki Tırkiya pêwendiyên xwe bı Bêlgiyayê ra bıguhêre, gıli gıhişte wê yekê, weki xwestın baylozê Tırkiyê jı Brûksêlê paş da gazikın. Lê, hılbet, eva gışk derew bû. Hukumeta Tırkiyayê ku dıxwest bı temami bıkeve prosêsa hemavropiyê, mecbûr dıbû hınek tışta bıke bona dêmokratizasiya emırê weleti cıvaki-politikiyê. Awa mesele, parlamênta Tırkiyayê paşi cıvineke dırêj (11-12 nisanê) projêkta ku hukûmetê pêş da kışandıbû, qebûlkır. Angori wê "qedexa karanina zmanê kurdi" dıhate hıldanê, usa ji nuqtên qanûnnema gunedayinê yê 140, 141, 142 û 163 hatın hıldanê. Ev nuqtena derheqa qedexa bir-baweriyên opozisyon da bû.



Institut kurde de Paris

Pêwist e bê gotınê, weki angori nuqtên 141 û 163 ên qanûnnema gunedayinê 100 hezar merıv hatıbûn cezakırınê. Serokwezirê Tırkiyê Akbûlût got, weki ser himê qanûna teze 43 hezar gırti hatıne berdanê.[18]

Destpêka havina 1991-ê lı Kurdıstana Tırkiyê hal disa xırab bû. Hukumeta Tırk elam kır, weki Kurd karê xırab dıkın û dıxwazın welêt perçe bıkın. Bı wê yekê va Ankarê dıxwest mena çêbıke jı bo têrorê destpêke dıji Kurda. Dı politika der da Tırkiyayê dıxwest tevi İraqê, İranê û Sûriyayê şerkariyê dıji tevgera Kurda bıke.

Hin destpêka salên 80-i nava Tırkiyayê û İraqê da hevraqailbûn çêbû. Angori wê hêzên Tırkiyayê eskeriyê izın stendın dı şerê dıji azadixwazêd Kurda da 10-15 km bıkevın sinorê İraqê. Bı vi teheri eskerê Tırkiyayê çend cara kete Kurdıstana İraqê. Bı wê ra tevayi Tırkiyayê zor lı Sûriyê dıkır bona pıştgıriya "têroristên" Kurd, ên ku jı sinorê wê êrişi ser Tırkiyayê dıkırın. Nûnerên hukûmeta Tırk çend cara gef lı hukûmeta Sûriyê xwarın.

Meha tebaxê sala 1987-a cara pêşın prêzidêntê Tırkiyayê bı seredana resmi çû Sûriyê. Bı saya vê seredanê hevraqailbûn hat destaninê derheqa hevkariya bêqeziyabûnê û êkonomikiyê. Ankarê jı Şam xwest, weki ew dı pırsa Kurda da politika berk derbaz bıke.

Destpêka Gulanê sala 1990-i serokwezirê Tırkiyayê Yildırım Akbûlût çû Bexdadê û Saddam Husêyin ra guftogo kır. Nava herdu welata da hevraqailbûna êkonomikiyê hat gırêdanê, lê usa ji pırsa Kurda hat enenekırınê.[19]

Wê demê deng-bes bela bûn, weki Tırkiya dewa herêmên Musılê û Kêrkûkê dıke, ên ku sala 1926-a bı desti Britaniya Mezın gıva bêqanûni jı Tırkiyê qetandıbûn û kırıbûn nava İraqê.

Ankarê ev deng-bes inkar kır. Wextê prês-konferansa Çıriya Paşin sala 1990-i Turgût Ozal dıji sazkırına dewleta Kurda derket û got, weki sinorê İraqê goti neyê guhêrandınê. Bı gotına wi Sûriye û İran ji bı vê bir û bawariyê ne. [20]

10-ê Adarê sala 1991-ê nûnerê wezireta derva lı Ankarê xwe mukur hat, weki hêzên Tırkiyayê eskeri daketıne Kurdıstana İraqê. Lê ewi got, weki gıva ew komeke eskerê ne mezın bû, "çend kilomêtre ketiye nav axa İraqê bona parastına penaberên Kurd" û bêqeziyabûna ser sinor. [21] Bûyerên lı Kurdıstana Başûr, İran û Sûriya ji bêsebır dıkırın. Hukumetên van welatan nedıxwestın, weki bûyerên Kurdıstana Başûr hukûmi lı ser "Kurdê wan" bıkın.

Dawiya Nisanê sala 1991-ê Prêzidêntê İranê Eli Ekber Haşemi-Rafsancani bı seredana resmi hate Ankarê. Wextê guftogoyên wi tevi Ozal, pırsa bı hezara penaberên Kurdên İraqê ku lı ser sinorê İranê-Tırkiyê cıviya bûn, hat enenekırınê.[22] Nivê meha Hezriranê sala 1991-ê cigırê serokwezirê İraqê Tariq Eziz hate Ankarê. Lê vê seredanê tu kar neda. Rojnamên welêt nıvisin, weki ew destvala jı Ankarê çû. Derheqa vê yekê da nûnerê prêzidêntê Tırkiyayê got: "Prêzidênt Ozal got, weki problêmên İraqê wê safi bıbın eger lı wır qayde-qanûnên dêmokratiyê esli bên sazkırınê". [23] Serokê Tırkiyayê ev gıli dıgotın, lê lı welatê xwe politika dıji Kurda berdewam dıkır.

Salên 80-i nava Tırkiyayê û Amêrikayê da qeilnıvisar hatın qolkırınê, derheqa modêrnizekırına bazarên Amêriki lı Tırkiyê, çêkırına obyêktên eskeriyê nû.

Nivê Tirmeha sala 1991-ê eskerên welatên tıfaqdar (ên dıji İraqê) jı axa Kurdıstana İraqê derketın û hatın herêma Silopiyê lı Tırkiyê. Lı wır bıngeha eskerên "Hêza çakûç" hat çêkırınê, 5 hezar eskerên DAY, Britaniya Mezın, Fransa û



Institut kurde de Paris

çend dewletên xerbi ê mayin. Xên ji wê hêzên dewletên tıfaqdar lı du balafırgehên leşgeri ya Tırkiyê, İncirlikê û Batmanê ci-war bûn. Armancên wan ew bûn, weki Kurda jı êrişên Bexdadê bıparêzın, qailnıvisara derheqa avtonomiya Kurda hazırkırın û bı temami rêjimeke dêmokrati lı İraqê sazkırın.[24]

Dı dema krizê lı vê govekê Tırkiyayê hêzên xweyê eskeriyê lı Başûr-Rohılatê dıha zêde kır. Reqema eskerê Tırka lı vê herêmê gıhişte 180 hezara. (Beri kriza lı herêma avtenga Farısa reqema eskerê Tırk lı Kurdıstanê dıgıhişte 65 hezara, 35 hezar cendırme û polês ji pıştgıriya wan dıkır). Waliyê herêma halê sırêder (lı Kurdıstana Tırkiyê) Kozakoxli got, weki hukûmetê ev gırani hılda sıtuyê xwe bona sinorê Tırkiyê-İraqê (350 km) bıparêze. "Lı van dera çiya û bani ne, çuyinhatın çetın e, lı wır nobedarê me yê eskeriyê kêm ın". Ewi gotına xwe bı vi awayi berdewam kır: "Bona ku mıqatiyê lı vê herêmê bıkın, gelek esker lazım e. Ew goti şev-roj, temamiya rojê lı vır bın". Destpêka Tebaxa sala 1991-ê lı Kurdıstana Tırkiyê nava eskerê Tırka û partizanên Kurda da, ku dıxwestın Kurdıstana serbıxwe çêkın, şer despê bû. Nêziki Çûkûrca 11 eskerên sinorxweyikır hatın kuştınê. Eskerê Tırk êrişi ser partizanên Kurd kırın û daketıne Kurdıstana Başûr, bona bıngeha partizana hılşinın. Gênêralê Tırk X. Tolon nunerê agêntiya Anatoliyê ra got, weki eskerê Tırk derbên ci bı ci dıdın partizanên Partiya Karkerên Kurdıstanê. Angori elametiyên rojnama, 20 hezar komandoyên Tırk, 132 teyarên eskeriyê û 1000 şervanên bı rezadıli jı Bedlisê tevi vi şeri dıbın. Esker û balafırên Tırkiyê ne tenê partizan, lê usa ji gundên Kurda ji gulebaran kırın. Gelek bıneliyên am-tam hatın kuştınê. Rojnama Tırk "Hürriyet" dınıvisi, weki paşi bombavitınê û gulebarana artilêriyê 20 hezar eskerê Tırka jı sinor derbaz

Institut kurde de Paris

bûn û ketıne axa İraqê û lı wır dıxwestın bıngehên xwe daynın bona şerkariya dıji Kurda. Hukumeta İraqê dıji vê yekê şıkyat kır û pırs dani, weki leşker û balafırên Tırka jı sinor derbazi nebe.[25]

Wezirê Tırkiyê ya derva S. Giray got, weki daketına eskerê Tırka lı bakûra İraqê, yekıtiya wi welati naterıbine û armanca wê ew e, ku kırınên Partiya Karkerên Kurdıstanê bıde sekınandınê.[26] Ankarê elam kır, weki lı ser axa İranê ji bıngehên PKK hene, lê Teheranê ew inkar kır.[27]

Paşi 15-ê Tebaxê lı herêma Diyarbekırê partizanên Kurda avtobûsa polisa Tırka gulebaran kırın, 3 jı wana hatın kuştınê. Lı vê herêmê nava partizanê Kurda û polês da şer despê bû. Jı herdu aliya merıv hatın kuştınê. Dı nava sê heftan da eskerê Tırka şereki mezın dıji Kurda kır, pênci Kurd hatın kuştınê, bı seda Kurd avitıne hebsê. Bı gışti nava 7 salên şerê çekdariyê da (jı tebaxa sala 1984-a heta tebaxa sala 1991-ê) lı Kurdıstana Tırkiyê 3 hezar partizanên Kurd, eskerên Tırka û merıvên sivil hatın kuştınê.[28] Nivê Çıriya Pêşin sala 1991-ê teyarên Tırka disa axa Kurdıstana İraqê dane ber bomba. 200 eskerên mayin tevi vi şeri bûn. Weke berê serokwezirê Tırkiyê Mesûd Yılmaz got, weki ew şerê xwe dıji "têrorista dıkın".

Dı dema gulebarankırınê û êrişên leşkeri lı Kurdıstana Başûr Tırka bombên napalmê bı kar dıanin û bı wê yekê gund, merıv heywan dıbûn xurê agır. Bı hezara Kurd jı ciyê xwe revin û lı Suléymaniyê sıtar bûn. Hukumeta İraqê bı formal şıkyat kır dıji Tırkiyê bona kırınên eskerêd wê. Lê bı izbati Bexdadê ra dest dıda, weki dıji partizanên Kurda şer bê kırınê. Evan kırınên eskerê Tırka qumandariya Amerikê û tıfaqdarên wê acız kırın. Nûnereki wan lı Kurdıstana İraqê elam kır, weki kırınên Ankarêye eskeriyê "dıkarın bı carekê va pêwendiyên

Institut kurde de Paris

hêzên pırmılet û ên Tırka xırab bıkın."[29]

Lê ev şıkyat formel bû û Tırka wek berê ev karê xweyi qılêr disa dıkır. Dı vê demê da destpêka Çıriya Paşin serokê Yekitiya Niştıman Celal Talebani gazi şand PKK ra, weki şer bıdın sekınandınê. Ewi baweriya xwe diyar kır, weki partizan wê şer bıdın sekınandınê. C. Talebani got, weki ew hazır e navbendiyê bıke nava Ankarê û PKK da, eger ew wê yekê bıxwazın.

Kurdên İraqê hêrs û eynata xwe diyar kırın dıji wehşitiya eskerên Tırk, yên ku ne tenê dıji partizana, lê usa ji bıneliyê edili çekên xeter dıdan bıkaraninê. Wê demê serokê Parti Dêmokrat Kurdıstana Iraqê Mesûd Barzani elam kır, weki eger eskerê Tırka disa êrişa Kurdıstana İraqê bıkın, ewê bı qeweta eskeriyê caba wan bıdın. [30]

Derheqa pêrspêktiva tevgera Kurda da pêwist e bê gotınê, weki rola wê çıqas here wê zêde bıbe bı van meniyên han:

1. Gelê Kurd çawa lı Tırkiyê, usa ji lı welatên mayin kompakt (bı hevra, ser hev) dıji. Eva yeka hesab dıbe faktoreke zor, ya xwedikırına (parastına) erf-edetê Kurdiyê, sıfetê netewiyê û bı wê yekê va alikariyê dıde pêşdaçûyina şerkariya netewiyê;

2. Dinamika reqema bıneliyên Kurd diyar dıke, weki çıqas ji politika asimilasyonê, sırgûnkırınê, têrorê dıji Kurda tê bıkaraninê, lê disa bı gıştı reqema Kurda zêde dıbe;

3. Rast e, dı vê demê da tevgera Kurda lı Tırkiyê perçe bûye û jı terefê çend partiya da tê şerkari kırınê, lê heyetiya wan partiya û organizasyona şedetiya bılındbûna femdariya Kurdaye mıletiyê, aktivtiya wane politikiyê dıde. Ew dıde kıvşê, weki gelê Kurd hazır e şerkariyê bıke bona mafê ça-

Institut Kurde de Paris

renûsi. Cerıbandına şerkariya Kurdên Tırkiyê nişan dıde, weki çıqas ji dıjwari hebın, şerkariya Kurdaye netewiyê-azadariyê wê pêş da here. Faktoreke qewata vê şerkariyê ji hesab dıbe şerkariya Kurdên İraqê, İranê û Sûriyê.

Vê demê pırsa sereke bona tevgera Kurda lı hemû parçên Kurdıstanê ew e, weki lı van dewleta her yekê da bona gelê Kurd mecal-mıkanê netewiyê dêmokratiyê tam bên sazkırınê.

Vê gavê parçeki rewşenbirên dêmokrat lı Tırkiyayê pêş da tên bona extiyariyên Kurdaye çandê, bona Kurd bı zmanê xwe hin bıbın, rojname û kovar û litêrarûra xwe çap bıkın. Evan tıştên han bı gışti pırsgırêka kurdi safi nakın, lê belê ew e rewşa politiki geleki bıdın pakkırınê.

Institut kurde de Paris

1) "Hürriyet", 11.05.1990.
2) "Tercuman", 18.05.1990.
3) Disa lı wır, 07.01.1991.
4) "Hürriyet", 10.05.1990.
5) "Cumhûriyet", 29.01.1991.
6) Disa lı wır, 09.05.1990.
7) "Hürriyet", 18.05.1990.
8) "Cumhûriyet", 06.05.1990.
9) Disa lı wır. 10.05.1990.
10) "Tercuman", 13.05.1990.
11) "Cumhuriyet", 11.05.1990.
12) "Yeni Ülke", 21.11.1991.
13) "Nokta", 14.04.1990.
14) "Cumhûriyet", 09.11.1990.
14 a) "Tercuman", 31.01.1991.
15) "Hürriyet", 05.02.1991.

16) "Riya Azadi", 1991, No:138, p.10-11.
17) "İzvêstiya", 13.04.1991.
18) Disa lı wır.
19) "Cumhûriyet", 07.05. 1990.
20) "Hürriyet", 14.11.1990.
21) "İzvêstiya", 11.04.1991.
22) Disa lı wır, 29.04. 1991.
23) Disa lı wır, 15.06.1991.
24) "Pravda", 18.07.1991.
25) Disa lı wır, 10.08.1991.
26) "İzvêstiya", 09.08.1991.
27) Disa lı wır, 28.08.1991.
28) Disa lı wır, 18.08.1991.
29) Disa lı wır, 14.10.1991.
30) Disa lı wır, 02.11.1991.

Institut kurde de Paris

# Kurdıstana İranê lı dewleta İslami de

Doktora zanıstiyên diroki
O. İ. Jigalina

Institut kurde de Paris

**Doza** kurdi lı İranê hesab dıbe pırseke gıring dı çarçeva vi welati de. Ew peywende bı wê yekê ve, ku Kurd mafê çarenıvisa xwe ya netewi dıxwazın. Şêweyê pêkhatına dewleta İrani lı ser bıngehê yekitiya islami xıstın jiyana praktiki, bê xelkên kurd wi peşınde bıkırın, mina zagoneke ku nıkare mafên wan ên netewi û cıvaki bısogırinın. Pıraniya cemawerên Kurd, çalak dı warê siyasi de, hevalbendên wan rêxıstın û partiyên kurdi bûn, ewên doza otonomıyê dıkırın dı nav sinorên İranê de; weke awaki heri optimal bo çareserkırına pırsa kurdi lı vi welati mina (PDKİ, "Komele" û bûro ya Ş. İ. Husêyni); hınek Kurdên İranê hevalbendiya (Rêzgari) dıkırın, çıma ku Azadiya Kurdıstanê dıxwast.

Doza kurdi lı İranê her wısa ji hesab dıbe parçeyek jı komplekseke pırgırêbend jı asteng û nekokiyên nav dewletên Rojhılata Navin. Xwestek jı vê gotarê ew e, ronikırına rewşa doza kurdi lı İrana komari ya İslami.

# Xusûsiyeta Kurdıstana İranê

Dı İranê de pıraniya xelkên bakur û rojavayê ostana Kurdıstanê, Kurd ın. Her wısa ji bı pırane Kurd dijin dı ostanê Azêrbêcana Rojava, Baxtaran (Kêrmanşah) û İlamê de. Bı awaki cemaweri Kurd dıjin lı Xurasanê (herêma Kûçan, Bocnûrd û Deregezê), Bêlûcıstanê û her wıha ji lı bajarên mezın, mina Tehranê, İsfahanê û t.d.

Herêmên ku pıraniya Kurdan lê dıjin, lı Bakurê-Rojavayê İranê dı weşanên zanısti de bı yek navi tên naskırın; Kurdıstana İranê (Rojhılat). Jımareyeke rast û bê hewedari bo Kurdan lı İranê nin e. Jımarên bıneliyên (xelkên) İranê, ku sala 1986 hesıbandın, bı awaki resmi eşkere nebûn. Lê nûçe dı çapemeniyê de bı tehereki diyarkırın, goya zêdebûna xelkên İranê, yên ne Farıs, dı salê de 3,3%. Eger mırov vê hejmarê qebûl bıke (bêguman kêmhatiye) mina heyina berçav û lı gor jımara beri vê, ku jımara Kurdan kırıbû 3,5 [1] gereke lı gor vê zêdebûnê bûbe 4,5-5 milyon mırov. Lê Partiya Dêmokrat a Kurdıstana İranê dı belavokên xwe de dınvisine, ku lı Kurdıstana İranê 8 milyon û lı Xurasanê ji 50 hezar Kurd[2] dıjin. Lı gor Texminên ku rûdan sala 1990 jımarê Kurd lı İranê 6,1 milyon mırov bû. Wa diyar e, ku jımara Kurd wê dı zêdebûneke berdewam de be, û ta sala 2 hezari wê jımara Kurdan bıghê 8,3 milyon, ango 11,2%. Jı eslê 73,9 milyon İrani[3].

Pıraniya Kurdên Kurdıstana İranê, 98% musılman ın. Çarika wan Şii ne lı (bajarên Baxtaran, Hemedan, Xurasan û lı herêmên wan dıminın). Pıraniya yên mayin Sunni ne. Jımareyeke ne hındık jı Kurdên Xurasanê Elewi ne. Bıli jı van, dı nav Kurdên Kurdıstana İranê de teriqetên sofıtiyê hene (Qadıri û Naqşebendi).[4] Sunnizma (sunnitiya) pıraniya Kurdên İranê, yek e jı sedemên heri mezın, ku navbera wan û rêjima

Institut kurde de Paris

islami yê irani nekokiyan dıjwar dıkın. Çımki Kurd dawa dıkın, ku hemi mezhebên oli û teriqên islami yeksa bın. Lê lı Kurdıstana İranê bı xwe ji zemin heye bo peydabûna dıjberiyên oli û etni, çımki lı wır ji, dı nav hev de dıjin (Ermen, Aşûri, Kurd, Cıhû, Azeri û Farıs).

Kurdıstana İranê hesab dıbe dı nav herêmên İrani yên paşvemayi dı warê cıvaki û abori de. Geşebûna wê ya etni-cıvaki diyar dıbe bı zagonê sırûşti yên pırosêsên hemta dı temamiya welat de. Têkeliyên êtno-sosyali dı salên 60-70 lı İranê qeware dıbûn bı karaktêrên gorandınên ku lı welêt dıbûn, beri her tışti, dı warê abori-cıvaki de, ewên navdar bûn bı "şorışa sıpi". Lı gor nêta şah û hıkûmeta wi, ew rêform gerek bû bıbın bıngeh bo sogırkırına geşebûneke berdewam a welat dı warê abori de, rê nedın nekokiyên cıvaki û rewşa siyasi dı hundurê welat de haştiyane bıparêze. Jı bo pêkanin û damezrandına wê rêformê modêla aboriya rojava bû delil û rêbaz. Bersıvdarên siyasi, yên welêt, wê demê xwestın wê rêformê wısa pêşan bıdın, wekû programa pêşveçûna İranê dı rêça geşebûnê, ya xweya taybeti re derbasdıbe. Danayên Rama "şorışa sıpi" hewldan, lı gor ditına xwe, bo pêşeroja İranê kûltûra du bajartiyan; şerqi û xerbi tevlıhev bıkın. Şexsiyeta şah Moxammed Rıza Pehlewi, weke mıroveke ewrûpi bı intellektûala xwe, dıbe sedemeki gıring bı hevgırtına "şahinşahitiya" İrani ya teze û dıbe nımûneyê pirozê "bajartiya payedar" û "rêjimê şahinşahi". Danayên wê ramê bêrawestan balkêşi wê dıkırın; weke "canê", himê hebûn, qehremani, serbesti û yekitiya netewi, gerek bûbûya bınyadê xurt "jı bajartiya payedara İrani re", parêzgereki nayab bo hemi hebûnên çandê û hemi qazancên wê, yên maddi. Her wısa ji dıdan dıyarkırın, ku têgeyıştına xelkên İranê û fêmkırına wan bo normên diroki û cameweri yên "rêjima şahinşahi" dıbe

vedestxıstına "hêjayiyên nemırên" ummeya (netewa) İrani, tacegula vê ramê ew bû "vejina gewherê canê netewiyê irani" û "kubariya buhayê wê" û "lêvegera bınyadê cameweriyê netewi". Bêtır balkêşi dıkırın bo wê yekê; da baweri bête kırın, ku gorinên cıvaki, yên têne kırın, vin jê ew e; "yekitiya netewa İranê" bıcebırinın. Nebûna faktorên veqetandın û lawaziyê hesab nedıbûn, çendi ku, dı praktikê de, geşetiya êtnocıvaki ya İranê qeware dıbû bı faktorên gewheri; çı yên hevkemlanê, çı yên hevnuqsanê.[5]

Surûşta têkeliyên cıvaki qeware dıbû bı "prinsipê beşdariyê", ewê pêkdıhat, tenha bı sogırandına "kêmtırin xwestekên jiyana rojane" jı her mıroveki İranê re û "jı gelê İranê re bı gışti"- parek jı dewlemendiya salane ya welat tevi[6]. Ev pırinsip dıkırın berberê "dıjayetiyê û nekokiye". Bûrokrata İranê bı vi awayi dıxwest meremê xwe pêkbine dı rêformên zevi belakırınê de û wısa ji dı guhastınên politiki û têkelıyên cıwaki de.

Dı qonaxa pêşiya rêforman de hınek lı hevhatın hebû dı navbera pıretniyê û pırawayên rêforman dı jiyana abori û cıvaki de. Dıgel wê yekê ji, şah bawer dıkır, ku rêformên wi, wê zeviyê bıde hemi cotkaran-gundiyan, û bı wi awayi prinsipê beşdariyê dı warê çandıniyê de pêktê. Hêviyeke wısa ji xıstıbû wê qulopaziya dı têkeliyên kar û sermiyan dı warê ındûstriyê de. Dane xuyakırın ku "karkır bı beşdariya xwe (hevalpare) dı sûda (fêda) karxana de, wekû danayên ramê dıwekılandın" sogırand. Sistêma "hevkariya cıvaki" gorandın xıste baweriyên derheqa dademeniya cıvaki bo gel û intêrêsên wi, ew pırs hıldıdan mılên pêşveçûna tekniki-abori û istıhlaka standartane. Bı wi awayi hewl dıdan, ku berberitiyên cıvaki êdi nehêlın û xwe jı hemi awayên xebata çinayeti rızgar bıkın.



Institut kurde de Paris

islami yê irani nekokiyan dıjwar dıkın. Çımki Kurd dawa dıkın, ku hemi mezhebên oli û teriqên islami yeksa bın. Lê lı Kurdıstana İranê bı xwe ji zemin heye bo peydabûna dıjberiyên oli û etni, çımki lı wır ji, dı nav hev de dıjin (Ermen, Aşûri, Kurd, Cıhû, Azeri û Farıs).

Kurdıstana İranê hesab dıbe dı nav herêmên İrani yên paşvemayi dı warê cıvaki û abori de. Geşebûna wê ya etni-cıvaki diyar dıbe bı zagonê sırûşti yên pırosêsên hemta dı temamiya welat de. Têkeliyên êtno-sosyali dı salên 60-70 lı İranê qeware dıbûn bı karaktêrên gorandınên ku lı welêt dıbûn, beri her tışti, dı warê abori-cıvaki de, ewên navdar bûn bı "şorışa sıpi". Lı gor nêta şah û hıkûmeta wi, ew rêform gerek bû bıbın bıngeh bo sogırkırına geşebûneke berdewam a welat dı warê abori de, rê nedın nekokiyên cıvaki û rewşa siyasi dı hundurê welat de haştiyane bıparêze. Jı bo pêkanin û damezrandına wê rêformê modêla aboriya rojava bû delil û rêbaz. Bersıvdarên siyasi, yên welêt, wê demê xwestın wê rêformê wısa pêşan bıdın, wekû programa pêşveçûna İranê dı rêça geşebûnê, ya xweya taybeti re derbasdıbe. Danayên Rama "şorışa sıpi" hewldan, lı gor ditına xwe, bo pêşeroja İranê kûltûra du bajartiyan; şerqi û xerbi tevlıhev bıkın. Şexsiyeta şah Moxammed Rıza Pehlewi, weke mıroveke ewrûpi bı intellektûala xwe, dıbe sedemeki gıring bı hevgırtına "şahinşahitiya" İrani ya teze û dıbe nımûneyê pirozê "bajartiya payedar" û "rêjimê şahinşahi". Danayên wê ramê bêrawestan balkêşi wê dıkırın; weke "canê", himê hebûn, qehremani, serbesti û yekitiya netewi, gerek bûbûya bınyadê xurt "jı bajartiya payedara İrani re", parêzgereki nayab bo hemi hebûnên çandê û hemi qazancên wê, yên maddi. Her wısa ji dıdan dıyarkırın, ku têgeyıştına xelkên İranê û fêmkırına wan bo normên diroki û cameweri yên "rêjima şahinşahi" dıbe

Institut kurde de Paris

vedestxıstına "hêjayiyên nemırên" ummeya (netewa) İrani, tacegula vê ramê ew bû "vejina gewherê canê netewiyê irani" û "kubariya buhayê wê" û "lêvegera bınyadê cameweriyê netewi". Bêtır balkêşi dıkırın bo wê yekê; da baweri bête kırın, ku gorinên cıvaki, yên têne kırın, vin jê ew e; "yekitiya netewa İranê" bıcebırinın. Nebûna faktorên veqetandın û lawaziyê hesab nedıbûn, çendi ku, dı praktikê de, geşetiya êtnocıvaki ya İranê qeware dıbû bı faktorên gewheri; çı yên hevkemlanê, çı yên hevnuqsanê.[5]

Surûşta têkeliyên cıvaki qeware dıbû bı "prinsipê beşdariyê", ewê pêkdıhat, tenha bı sogırandına "kêmtırin xwestekên jiyana rojane" jı her mıroveki İranê re û "jı gelê İranê re bı gıştî"- parek jı dewlemendiya salane ya welat tevi[6]. Ev pırinsip dıkırın berberê "dıjayetiyê û nekokiye". Bûrokrata İranê bı vi awayi dıxwest meremê xwe pêkbine dı rêformên zevi belakırınê de û wısa ji dı guhastınên politiki û têkelıyên cıwaki de.

Dı qonaxa pêşiya rêforman de hınek lı hevhatın hebû dı navbera pıretniyê û pırawayên rêforman dı jiyana abori û cıvaki de. Dıgel wê yekê ji, şah bawer dıkır, ku rêformên wi, wê zeviyê bıde hemi cotkaran-gundiyan, û bı wi awayi prinsipê beşdariyê dı warê çandıniyê de pêktê. Hêviyeke wısa ji xıstıbû wê qulopaziya dı têkeliyên kar û sermiyan dı warê ındûstriyê de. Dane xuyakırın ku "karkır bı beşdariya xwe (hevalpare) dı sûda (fêda) karxana de, wekû danayên ramê dıwekılandın" sogırand. Sistêma "hevkariya cıvaki" gorandın xıste baweriyên derheqa dademeniya cıvaki bo gel û intêrêsên wi, ew pırs hıldıdan mılên pêşveçûna tekniki-abori û istıhlaka standartane. Bı wi awayi hewl dıdan, ku berberitiyên cıvaki êdi nehêlın û xwe jı hemi awayên xebata çinayeti rızgar bıkın.

Prinsipê "hevalpariyê" bûbû xala heri navendi dı programa "şorışa sıpi" de, ewê ku du prinsipên diger pêvegıhan "hêjayiyên bıngehi" netewa irani û "dûredestiya şahinşahitiyê". Danayên wê doktrinê (ramê) İran dıdan xuyakırın mina "yekgırtiyeke" bêhemta, weki gelek gel tê de hene, ku xusûsiyetê wan, yên heri taybeti, wan dıkın yekgırtiyeke gırti, hevkarın bıhevre bo gıhaştına armanca tebayi.

Çendi ev rêform gerek bıbûna hoyê nehıştına paşmayina İranê dı warên abori û cıvaki de, wan nekari wekhevıyê têxın têmpê (wetirên) pêşveçûna cıvaki lı navenda welat û gelên kenarên wi. Newekhevi dı nav wan de, mina berê berdewam ma. Paşmayên pêwendıyên fêodalizmi, mina caran, tesira xwe lı hewayê cıvaki û politiki dıkır lı wan herêmên ne farısi. Dı wan herêman bıxwe de ji opozisya politiki dıji rêjimê şah bı xurti kete xebatê, ku erteş û polisê diktator bı hemû tıwana xwe rê lı wan teng dıkırın, çımkı wan baş fêm dıkırın mebesta dêmokratiya ku şah pêşniyar dıkır; şah dıxwest mırov bıbe "iraniyeki rasteqine" bı hemû mebest û xwesteka vê peyvê, ango qebûlkırına serbest bı peyxama ku diroka kevnareya vi mılleti, kûltûra wi ya edebi û nemır ku daniye ser mılên her wetendaşeki û wısa ji urf-adetê wi. Lewra eşkere bû, çıma "şorışa sıpi" bı "serbesti" nehat qebûlkırın, nemaze dıjayetiya wê, kê bıkıra dıbû dıjmınê welat û jı gel nedıhat jımartın.

Politika şah, Kurdıstana İrani kıre şıkarte û warê tıştên xam jı İranê re. Rêformên bûrjûvazi lı vê herêmê ji pêkhatın, lê ne yeksa û zor derengane. Bı hoya wan, tenha zêdebûn hat ser yên ku hê jı pêş de hebûn dı warê geşebûna cıvaki-abori de lı Kurdıstanê.[8] Hê corên cıvaki bı awaki fereh jı bûrjûvaziya bıçûk, gundiyan û nivkoçeran ın. Dı pêşveçûna navçeyên kurdi de rola gundiyên dewlemend gıring bû.[9]

Institut kurde de Paris

Dı navçeyên çıyan de hê nımûneyên jiyana koçeriyê peyda dıbın, havinan û zıvıstana xudan pez bı keriyên xwe re hıldıkeşın çiyan û dadıkevın. Lı gundan hê esnafên teqlidi yên cıvaki xurtın "axa", "şêx", "rispi", "kedxor" û h.w.[10] Lê bı awaki gıştı lı herêma kurdi, jiyana Kurd ketiye rêça pêşveçûn û geşebûnê, bes hê dı qonaxa guhastınê de ye.[11] Lê dı warê senêt (destdurusti) de, hukûmeta Tehranê jı qesta rê neda, ku lı Kurdıstanê pêşda here. Lewra ji çina karkeran lı vê derê hındık e bı jımara xwe, lê lı Kurdıstana İranê gêrên bazırganiyê û sımsariyê baş bı hêz ın. Jı ber ku rêformên salên 1970 ne bı gıştı serkevtın, nûjentiya xanedanên nivfêodali lı ser himê pêwendiyên aboriyên taze berhemên rınd û hêja nedan, bızor têra xwesteka hundurê Kurdıstana İranê dıkırın.[12]

Çendi lı İranê programên herêmi yên taybeti amade bûn bo pêşveçûna cıvaki-abori û dı wan de bıryar hebûn, ku jı navçeyên Kurdıstanê re sermayanê hukûmi bo geşekırına herêma kurdi û alikariya sermayanê kesani bête kırın,[13] disa ji paşmayina Kurdıstana İranê, ne tenha kêm nebû, lê dı salên 1980 de deha zêdetır bû. Bêguman, Kurdan xeyda xwe dıyar kırın. Dı vê rewşê de çewsandına intêrêsên (berjewendiyên) netewiyên kurdi ditın.

Bûrjûvaziya kurdi, nivfêodalên Kurd û pıraniya cemawerên hejar û bê mafên gund û bajarên Kurdıstanê dı armanceke yekane de bûn; dıji Tehran, "rızgari" yan otonomi. Lewra Kurdıstana Rojhılat bû yek jı herêmên heri dıjwar û ne hêsa lı İranê. Bêguman, tesira xebata kurdayetiyê jı aliyên bakur û rojava de ji lı geşebûna têkoşina Kurdên İranê xurt bû. Tehran hesabeki mezın dıda vê rewşê. Jı bo perçıqandına vê têkoşina kurdi dezgayên İranê dıgel çewsandınên sert, hê mêtodên tesirên (bandoriyên) cıvaki, qulopazıyên siyasi bıkardanin û qebûlkırına hın şırûtên kurdi yên sıvık û nehimi dı

Institut kurde de Paris

pırsên pêlûka duwemin de.[14]

Wergorinên cıvaki dı nav kenarên "şorışa sıpi" de, mezınbûna lebata cıvaki û ferehbûna wê dı nav cemawerên welat de û hın faktorên diger rewşek jı kultûrên netewi re dıyar kırın, goya ew netewe hev kemlan dıkın lı ser bıngeheki farısi, wısa dıhate ditın, ku normên kûltûri yên jiyana her malekê û yên cıvaki dı İranê gıştî de standartekê werdıgrın. Lê ew tenha dimeneki derveyi bû.

Standartên "kûltûra şarıstani" bı awaki fereh lı kenarên İranê veweşiyan. Lê standartiya normên jiyana cıvaki nıkarın dıjberıyên cıvaki, ku hatıbûn hûnandın bı dıjberiyên çinayeti ve, jı holê hılinın, yan sıvık bıkın. Berevaji, wan lı Kurdıstanê xwenaskırına netewi berztır û dıjwartır kırın.

Ne yeksayetiya geşebûna abori û cıvaki dı navbera netewa Farıs û netewên diger da, (wergêr), rêbazên çewsandınê dı politika dezgayên fermi, xusûsi, derheqa Kurd de bûne sedemê berxwedaneke xurt dıji pêvajoyên intêgrali (hevkemlani), vina wan dı serxwebûna netewi de deha xurttır bû.

Lı Kurdıstana Rojhılatê balkêşi bo zanina rabori (ya diroki û kûltûri) ya gelê Kurd gelek ferehtır bû, pêwendiya vê rewşê hebû bı pêşveçûn û geşebûna rewşenbirên Kurd ve, ewên dı lêkolin û xebatên wan yên wêjeyi û zanyari de pırsa netewi bêhtır eyısi û roni bû. Dıyar e, ku balkêşiya xwendevanên Kurd ber bı naskırına raboriya gelê xwe protesta xwe dıji serdestiya dewleta Farısan eşkere dıkırın. Rama kurdayeti, geh nehini, geh sert û dıjwar, dıji çandına idêolojiya fermi-paniranizm. Çeyrewê wê ramê xebata nehini dıkırın dıgel hêzên oppozisyon dıji damezrandına sistema yek parti û ibadeta şahiyeta serberdayi.

Rast e, hınek serbesti dı warê kûltûrê de bû semedê sıvık-



Institut kurde de Paris

kırına dıjwariya rewşa cıvaki. Mina nımûne, dıgel qebûlkırına çendan cejnên cıvaki, jı destpêka salên 1970 dı rojnameyên İrani de êdi informasyon, nuçe û deng û basên "hefteyên" herêman dıhatın weşandın. Dı Tirmeha sala 1974 hefteya Kurdıstanê ilankırın. Dı rojnameyan de gotarên mezın hatın nıvisandın derheqa dirok, kûltûra Kurdıstana İranê û rewşa wê dı wê demê de. Zû fırawane basa avakırına Kurdıstanê dı çarçıvên "şorışa sıpi" de, ewa ku "geşebûnê" tine vê herêmê dı pêşerojên nêzik de. Derheqa Kurdan de, hınga, nıvisandın: "ku perçeyek nayête cudakırın jı ´netewa irani-Kurd´, kûltûra wan perçeyeke dı avayê diroka İranê de" û h.w.

Bı saya mêtodên kûltûri û cıvaki dı nav gelên ne Farıs de, nemaze jı wan, Kurd, ewên ku hıneki jiyana cıvaki-politiki dı welat de vejiyandın, dezgayên İranê xwestın wan têxın coka rêformizmên cıvaki û bın sıya nasyonalizma irani de. Paniranizmê kırasê libêralizmê lıxwe dıkır, lê cewherê wêy dıji dêmokratiyê jı berê ve serttır dıbû. Hê dı dawiya salên 70 de, ew nermayetiyên kûltûri û cıvaki, ku hebûn, xıstın bın qedexekırıneke sert. Hin bêhtır, hemû çapemeniyên ku berê bı zmanê kurdi derketıbûn, cıvandın û tev şewıtandın. (wısa ji yên gelên mayin, ên ne Farıs). Beri hılweşina rejima şah, bı demeke hındık hiç çapemeniyek bı zımanê kurdi nema vedesdıket. (ne pırtûk, ne rojname, ne kovar). Ki dıji vê rêbaza şah rawestıya, zebaniyê Savak zanibûn çı binın serê wan, bı sedan dı zındanan de êşkence dıbûn. Tenha çend programên kurt, yên radyo man, ewên ku "bı zaravên navxweyi" nûçeyên xwe dıweşandın (hukûmetê bı fermanê wısa programê gelên ne Farıs qeware dıkır).

Dı salên pêş ınqılaba islami de 1978-1979, lı İranê çavdêriya hukûmetê bı wi awayê sert û dıjwar dı herêmên ne Farıs de pêşveçûna protêsta cıvaki ya gelê Kurd ragırt. Dema ser-

Institut kurde de Paris

hıldaneke cıvaki dıji şah lı İranê despêkır, Kurd dı nav pêşewayê têkoşinê de bûn, bı taybeti xelkên bajaran, dıgel hemi gelên İrani daxwazên xwe yên netewi navêtın holê. Antidêmokratizma politika şah dı warê pêwendiyên netewi de, dıgel sedemên mayin krizeya cıvaki-politiki kûrtır kır dı herêmên netewi de heta demeke nêziki, pêş herıfandına rêjimê şah. Kurdên, ku aktiv dıji şah hevalbendiya hêzên demokrat kırın, hêvi dıkırın, ku wê mafê wan yên netewi û cıvaki bêne sogırandın. Belam teqlên bûyeran, pışti serkevtına inqılabê, ew hêvi pûç kırın. Lewra ji Kurd ketın cengeke dıjwar dıji rêjimê islami.

## Doza Êtnopolitiki Lı Kurdıstana Rojhılat Pışti İnqılaba İslami

Institut kurde de Paris

Hılweşına rêjima şah rê da bo damezırandına awayeki nû jı hıkûmetekê re, ku stûna wê ya êtno-politiki bûn şii. Şiiyan pıraniya dezgayên fermi xıstın destên xwe, ango serpereştiya abori, politiki, erteşi, emniyeti û h.w. kete destê wan.

Rêberên şiiyan ji hemi hêzên mayin tawantır û birewertır derketın, wan serokayetiya tevan kırın û prosesên wergorinên cıvaki-siyasi tev xıstın destê xwe. Wan programa "islamizeyê" û şorışa kûltûri pêşda anin, bı nêta ku mezhebê şii lı tevaya İranê belavkın (û lı deri İranê ji), û gelên ne Farıs tevan nehêlın, (hebûna wan lı İranê ne gerek e). Ev bû sedemê peydabûna oppozisyoneke xurt dı nav gelên mayin de, çunke wan pêşeroja êtnokûltûra xwe gırênedan bı hebûna dewleteke Şii-pıretni ve. Protêstên gelên mayin dıji ferzkırına şiitiya ku jı mezhebê wan dûr, fıtne û berberiti xıstın nav pêwendiyên netewi û olitiyê tevi de. Yên ketın vê rewşê; Kurd,

Azer, Ereb, Turkman û Bêlûc bûn. Vê rewşê newekheviya pêşveçûna êtni û ya cıvaki, ya van gelan û hın gelên tır û xusûsıyêtên her yeki ji wan eşkere kırın.

Raperina dıji rêjima şah bû sedemê xurtbûna netewa sereke (farısi-şii), lê şênbûna xebata dêmokratik dı nav hêzên cıvatên êtni, êtno-oli û êtno-herêmi de, ewên ku şerê çekdari kırın jı ber mafên xwe yên netewi de. Jı wan, mırov dıkare bêje, ku Kurd "pêşawa bûn". Beraber modêla şiiyan bo pêkhatına dewletê û avakırına pêwendiyên cıvaki û netewi, rêberên Kurd xwestın, ku welat ava bıbe lı gor prinsipên dêmokratik, yên Ewrûpa Rojava. Ev baweri bûn bıngehê pırsa kurdi lı İranê, dı salên 1980-1990 de.

Institut kurde de Paris

## Saloxên bıngehi yên siyaseta hıkûmeta İslami ya İranê dı pırsa netewi de

İdêologiya islami, ya ku Xumeyni û şêwırdarên wi kırın destûra kırınên xwe dı dema derkırına şah jı İranê, ne şeripaneki têoriya sıyasi ya sıpêdiya şiizmê û pêşveçûna amedegeha muctehidê oli, yên sedsalên navendi bû. Ya van idêologiyek nû bû, têkelhevek jı baweri û ramên Ayetulla Xumeyni, Celal Ale-Ahmed û Ali Şerieti, heta raddeyeki kûr têr bû jı çewsandınên politiki û serpereştiya dewleti, cewr û sıtemkari dı warê parvekırınên cıvaki de. Jı amadekırına vê alternativê xuya bû, ku danayê wê ne tenê dıxwastın neteweyeke islami pak damezrinın. Têoriya wan dıjê idêologiya dewleti ya ku jı mêj da hebû. Hê xırabtır, ewê ku navê idêalê dewleta islami lê dıkırın, bı cewherê xwe redbûyer bû dıji wan tıştên ku şah bı başi dıditın bo hukmê xwe.

Ayetulla Xumeyni têoriya dewleta islami himkır, lı gor prin-

sipê "welayeta Feqih", guncane bı daxwaza "hejaran" dıji modêla xerbiyan, ya ku welatên Rojava kırıne bıngehê pêşveçûna gel[15]. Dı rêçerama bawerıyên xwe de Xumeyni navê "neteva İrani" daxıste holê, bı cemawer re dıpeyıvi, her weku hemû İrani, şii ne. Bı awaki fıreh hevoka "netewa İraniya payedar", bıkartani, gava berê xwe bıda şieyan û gelên İranê.[16]

Bı vi awayi diyar dıbe, ku Xumeyni politika rêjimê tazeyê komara islamiya İrani (kii) damezrand dı warê pêwendiyên gelên İran de bı awaki wısa, ku imkan dıbû pırsa gelên welat bavêje pıştguhên xwe; ew gelên ku xwe nahejmêrın şii. Lema ji berjewendiyên wan ji mirat dıminın, çımki teji nasiyonalizm ın. Ev helwesta Ali Şerieti bû ji. Jı ber ku, dı şırovekırına wi de ji, islam "idêologiya neteweyekê ye". Mina Şerieti, Xumeyni şırovekırınên taybeti dıkırın jı van cûreyên cıvakıre "netewe", "dêmokrati" û h.w, lı ser himê logika "tewhidê" (yekitiyê), û dı gotına "tewhidê" de dıdan dıyarkırın; halê hevkemlane ya mırov, gel û sırûştê, pêşveçûna idêal û haştiyane. Lı gor vê baweriyê, peyva "netewe" dıbe bı wê mebestê-cıvatek mırovên yekgırti. Şırovekırına "tewhid", sınfeki hevkemlana gışti ye ya mırov bı gel û sırûştêre, ya zanıyariyê û olê, evinê û sewdan, baweriyê, aqıl û h.w. Şerieti dıgot, ku bılındtırin "tewhid" ew e, gava sinor naminê dı nav can û gewde de, ango "tewhid", beri her tışti baweri bı yek "hêzê" ye, hebûnek yekta, bızav dı yek rêbazê de, têkeli bı yek hêzê û qebûlkırına yek dezgayi.[17]

Xumeyni bawer dıkır, ku şii dı pêşveçûnê de gıhıştıne raddeyeke bılınd, lewra ji bı xurti dıxwest kûltûra "islami", ku şiiyên İranê damezrandıbûn, jı nû ve vejine. Bı baweriya wi tenha şiizmê rê da iraniyan (Farısan, Azeran, Turkmenan û digeran) ku dimenê xweyê caneweri (rûhi) diyar bıkın -serxwebûna awayê fıkrê, exlaq, politikê û sedemên diger, ku ber-



Institut kurde de Paris

dewam pêşveçûna wan ew gıhandın "kûltûreke rasteqine"-kûltûra islami, şii. Lı gor ditına Xumeyni, vê kûltûrê wısa kır, ku mıletên musulman lı İranê bıbın xudanê "xwe" û rêça pêşveçûna serbıxwe jı wan re vekır. Lewra ji "şertê yekemin ê serxwebûnê -Xumeyni dıgot- serbestiya ramê û kûltûrê ye", kûltûra islami, ya ku berê û nıha ji yek e jı kûltûrên heri dewlemend. Wi dıgot, ku nerxên caneweri yên rasteqine dı İranê de pêkhatın; kengi İran bû dewleta şii dı kultûrê, politikê û idêologiya xwe de.[18]

Ewletiya kûltûra islami dı ser kûltûra paşmaweyê İrana pêşi islamê re, eşkere diroka nêziki sê hezar sal ya İranê temırand. Ev ne tışteki badihewa bû, çımki dı dema beri islamê de İran şêndıbû wek dewleteke netewi û kûltûra İrani têkelhevekbû jı gelek êlêmêntên (enasır) ên êtni, cıvaki, kûltûri û diger; çı yên rojava û çı yên rojhılat. Lê Xumeyni têkeliyên bı rojava ra hesabkır weke neserbestiya İran û dûvıktiya wê, ku bı awaki nêgativ tesir lı ser jiyana bexteweriya gel dıke. Baweriya rewşenbirê İrani yê navdar Ali Alê Ahmed ji wısa bû. Wi dıgot ku, peyrewiya besti bı rojavayê ve, ku rewşenbirên İrani bıhêztır kırıne xetereke heri mezın jı paşmayên kûltûra İranê re. Baweriya xwe derbırri, goya İran gereke serbest û azad be dı warê abori û kûltûri de.[19]

Navdarên rama ceweriya islami lı İranê dıgotın, ku urfên islami yên cıvaki dıkarın wekheviyê çêkın hiç cawazi niye dı navbera mırovên reşik û sıpi, jın û mêr, xanedan û hejar, paşa û parsekan, bıhêz û lawaz, Asyawi û Ewropi, xwenda û cahıl, kal û cıwan... Ev wekhevi bı islamê tê qewarekırın[20]; eger na, herkes wê lı gor pivana xwe prinsipê xeşmê û serbestiyê bo xwe dayne. Ramyarên İslami prinsipên diger, ku naverokek mırovayeti dı wan de ci dıgırt, dan xuyakırın.

Pıştì hılweşina rêjima şah, hevalên Xumeyni û peyrewên

Institut kurde de Paris

wan xwestın dı praktikê de hın ramên xwe yê felsefa şorışi, ku wan bı xwe dani bûn, bı ci binın. Dı eynê demê de ji, pıranıya alikarên idêologiya teze, gava dest bı cianina vê borca nehêsan kırın, dı destpêka rêforma gelê İranê de, çendi propagandeke aktiv jı bo felsefa islami dı hemi hoyên ragıhandınê de, wan nızanıbû wê çawa rama "şorışa islami" bı ci bıkın dı warên cıvaki û komelayeti de. Dı praktik de eserên kûltûra cemaweri ya rojava, ku herıkibû hundurê İranê, jı kok ve hılavêtın, çunke wê kûltûrê "rê vekırıbû bo herıfandına exlaqi". Baweri hebû, ku rızgariya musılmanan dı xwedikırın û parastınê de ye û dı cıstûcoya rêbazeke islami û serbıxwe de bo pêşveçûn û geşebûnê.

Ewên ku dı praktikê de xwestın felsefa şorışgêr bı ci binın, bı hemi kar û kırınên xwe ve ketın pırava şovinizma islami, tewşiti û teterufê, ku bı awaki nêgativ tesir kır lı politika hukum û bersıvdarên pêşeroja welat dı helwesta wan de jı cemawerên ne şii, ewên ku xwestın kûltûra xwe bıparêzın û şênbıkın, ew kûltûra ku rola wê hebû dı pêşveçûna kûltûra tevaya İranê de. Kurdan pêşnıyar kırın, ku tecrûba Ewrûpa Rojava bıkarbinın dı warê avakırına nıştımani de lı İranê. Lê ew kesên ne mina şiiyan baweriyên xwe eşkere bıkırına, navê wan dıkırın dıjmınê şorışê. Çendi ku şerieti inkar nedıkır imkaniyeta nevistına dûriyê jı kûltûra rojava bı awaki gıştı, lê xebat ji dıkır dıji "rojavayê impêryalistê xudan kûltûr"[21]

Kurdan doza otonomiya netewi-herêmi û kûltûri kırın. Ev xwestek bû programa bızava kurdi û rêbaza wê ya yekta. Otonomiya netewi, şırovedıbû bı nehıştına hemi awayên sıtembariyên netewi û cıvaki, wekheviya zıman, hılbıjartına nıwênerên netewi bo beşdariyên dı hukum de, yarmetidan bo geşebûna abori û kûltûri lı herêmên kurdi. Dı encama xebata hevrayi de, ku bı hêz bûbû dı rêbaza şorışa dıji şah de,

Institut kurde de Paris

bızava kurdi ya netewi lı İranê êlêmêntên parvekırına welat hiç dı baweriyên xwe de xwedi nekır. Armanca wê damezrandına otonomiyek netewi-dêmokratik dı nav çarçıva İranê de bû.[22]

Dıgel wi awayi ji, disan bızava otonomixwaza kurdi hesabkırın mina "ewrûpiyet" û bı mêtodên çekdariyê perçıqandın.

## Xebata Kurdên İranê Ya Otonomixwaz Pışti Herıfandına Rejima Şah

Nivçêkırına rêformên cıvaki dı dema "şorışa sıpi" de ayineke cıvaki pırgırêbend dı nav gelê Kurd de hışt.[23] Cudabûna rêbazên cıvaki yên çendan grûpên kurdi bandori lı awayê xebata wan ji dıkır. Çendi, ku pıraniya Kurdan serxwebûna xwe dıxwestın dı nav qewara İranê de, lê dı xebata otonomixwaza Kurdan de çend rêç û rêbazên core-core daketın holê. Hınekan kırasê islamiya-sunni lı xwe kırın, hın di, xebata xwe kırın dı bın perda idêologiya rama geleri ya Ewrûpa Rojava de. Dıgel wısa ji, dı hundurê wan grûpan de dıjberi dıyar bûn. Hınek rûhaniyên sunni bûne rêberê grupên politiki, yên slogana "azadiya" Kurdan hıldabûn. Grûpa "rızgari", wek nımûne, bı serokatiya şêx Osmanê Neqşebendi sloganê "veqetandına herêma Kurdıstan jı İranê" hıldabû. Çendi hevalbendên vê rêxıstınê bı awaki aktiv bı Xumeyni re şerê şah kırın, lê wê xwest, bı awaki gışti, jı nû ve sinorên dewletên Rojhılata Navin bêne temaşakırınê û Kurdan gıştıkan bıghênın hev, bıyekkın dı çarçıva welatê wan de, ango Kurdıstan bıbe dewleteke netewi-serbıxwe. Xebata vê rêxıstın raste-rast bû dıji prinsipên idêologi û politiki yên rêjima İraniyê teze. Rêjim tıwanayên xwe tırxan kırın bo nehıştına vê rêxıstınê.

Institut kurde de Paris

Dı novembera sala 1981 wezareta navxweyi ya Îranê serbestiya xebata politiki ya vê rêxıstınê qedexe kır.[24]

Rêberên rêxıstınên mina "rızgari" ne wısa pıjyayibûn dı politikê de, ku karıbın rınd fêm bıkın xusûsiyeta bızavên netewi û rewşa objêktiv lı Îranê. Wan jı helwesta idêologiya cıvata gelêri, ku hê dı pêla guhertınê de ye, bûyer û nûçêyên Îran fêm dıkırın. Logika (mentıqê) êvolusyona vê forma nasyonalizma islami pêşde dıçû ne bê bandoriya (tesira) berberitiya radikalan, jı rexeki ve û mûxamırên eşkere jı yê dive, û wısa ji tesira politikê û idêologiyê. Helbet, xebata grûpên wısa lı hesabê Tehranê nehat.

Herêmên kurdi lı Îranê, weke me lı jor ji got, dı qonaxa guhertınê de bûn (jı pêwendiyên teqlidi yên cıvaki û abori ber bı yên nû ve). Îdêologên Îran ev rewş lı ber çavên xwe danin, û wısa ji moralên mezhebê sunni, modêla "tewhid"a gelan, ku rêjimê islami yê nû pêşnıyar dıkır nepıjırandın, lı gor baweriya wan, vê modêlê wê krizeya cıvaki, abori û siyasi kûrtır bıkıra, ew krizêya ku hemi herêmên musulmanên sunni nemaze Kurdıstana Îranê gırtıbûn. Şêx Îzzeddin Huseyni, wek nımûne em bêjın, ku lidêreki rûhani yê Kurdên sunni, lı Mehabadê bû, dıgot; şerteki gıring e bo pêşveçûna jiyana cemawer û geşebûna wê, ku dêmokratiyeke rasteqin lı Îranê bête danin. Baweriyên wi xwesteka wê çina kurdi derdıkır, ewa ku dıji perçekırına Îran bû. Vina wan ew bû, ku otonomiyeke kurdi dêmokratik dı Îraneke demokratik de damezre lı ser himê fêdêrali. Dı eynê demê de ji, wi qebûl dıkır, Îran komareke islami be, lê berjewendiya gelên ne şii tê de parasti be. Ango, Huseyni qebûl nekır, ku Îrana pırêtnos lı gor felsefa şii bıji.[25]

Dı rewşeke wısa de, gava Kurdan dıxwestın otonomiyek politiki bıghê wan dı hundurê Îraneke serbest û azad de, de-



Institut kurde de Paris

stpêka rama Huseyni, idêologê sunniyan red bû jı wê yekê re, ku bı awaki mikaniki dogmê islami bıkarbên. Wi dıgot, gereke ew dogma ne tenha nebın asteng lı pêş pêwendiyên taze, lê bınyadeke idêologi rasteqine ava bıkın.

Dı nav liderên rûhani de yên sunni jı Senendecê Şêx Axmedê Muftizade navdar bû. Ew bı baweriyê xwe hınek nermtır bû. Û meyldariya lıhevhatınan dıkır dı pırs û dozên politikicıvaki de. Jı aliki ve wi mafên neteweyi bo Kurdan dıxwest (bı awayê otonomi), jı aliyê di ve pıştgıriya rêjimê şii dıkır, bı nêta ku otonomi bê damezrandın bı prinsipên islami. Dı eynê demê de dıgot; ku sê ocaxê dıji şorışa islami lı İranê henın; Kurdıstan, Xûzıstan û Bêlûcıstan, ango cıyên ku sunni lê dijin.[26]

Belam liderên şipê sunni dı bızava kurdi de nıkaribûn hevbıgrın û rêbertiyê bıkın. Çımki (dı nav Kurd de hebûn partiyên dunyewi -zanısti, kevnar û xudan dirok, û xebata 50 salane dı nav gelê Kurd de kırıbûn û bûbûn xudan rûmet, û baweriya cemawerê Kurd bêhtır bı wan dıhat -wergêr) mina Partiya Demokrata Kurdıstana İranê (PDKİ) û Komele.

Jı destpêkê PDKİ programa xwe, ya sala 1973 pêşniyarkır bo çareserkırına doza kurdi lı İranê. Dı programê de ewleti hatıbû dayin bo rêça sosyalizmê ku Kurd bı saya wê pêşva herın. Dı hesabê danayên wê programê de, ku Yekitiya Sovyet û welatên peymana Warşo wê pıştgıriya xebata wan bıkın. Jı ber ku Yekitiya Sovyet yekcar bûyerên Kurdıstanê dı ser guhê xwe re avêtın, rêberên bızava netewi-demokrati yên Kurd neçar bûn dûbare temaşa prinsipên xebata xwe bıkın. Liderê PDKİ A.Qasımlo rêya pêwendiyê vekır dı nav xwe û partiyên sosyal-dêmokrat ên Ewrûpa. Wan, lı gor programa parastına mafê mırov destê yarmetiya maddi û morali jı Kurdên İranê re dırêj kırın. Ev bû sedemeki himli bo guhartına rêbaza PDKİ, prinsipên wê bûne eynê yên sosyaldemo-

Institut kurde de Paris

kratan.

PDKİ dıxwest dı Kurdıstana İranê de politikek cıvaki, aktiv û fereh lıdarxe. Lewra, rêbarên wê balkêşiyek mezın dan kar û barên cıvaki, abori, tecrûba serpereştiyê ya sosyal demokratên Ewrûpa, vedesxıstınên wan, nemaze dı warê parastına rewşa maddi ya mırovên kar, berzkırına jiyana wan û amadekırına karûbarên vejina abori.

PDKİ û partiyên sosyal-demokrat dıghêne hev lı ser têgeyıştına mırovayeti ya sosyalizmê, ku mırov hısab dıbe weku armanca pêşveçûna her welateki, şırovekırınek gışti bo rama azadiyê, dadê, dêmokratiyê; mina wesile û armanca vedestxıstına sosyalizmê.

PDKİ ditına xwe bo têoriya mafê mırov cawaz dıke. Bı ditına rêberên vê partiyê rama "mafê mırov" tışteki dunyewi ye. Mebest jê ew e, ku her mırovek, kê hat rûyê dunyayê, mafê wi heye, bera lı ser çı olê yan bê ol be. Ne mebest, ne asta bıkaranina mafên himi yên mırov nabe gırêdayi bın bı olperestiyê ve. Bı awaki vekırı ji, hiç hukûmetek dı serpereştiya rêkûpêkkırına jiyana gel de nıkare garantê (gıravê) bıde ku wê dadê, şahi û kameraniya mutleq (obsolût) jı mıllet re bısogırine.

Kurdên İranê û hın rêberên siyasi-rûhani yên sunni şırovekırına mafê mırov bı vi awayi qebûl dıkın çendi gelleki dûr e jı baweriyên rûhaniyên şii.

Helwesta PDKİ rê dıda, ku programa xwe amade bıke bı awaki, ku tê de bıryarekê wısa dıgot: "Armanca heri serekeavakırına şêweyê sosyalizma dêmokratik lı Kurdıstana İranê" (xal-2 programa PDKİ). Avakırına cıvateke sosyal-dêmokrati parti bawerdıkır, ku dırake bıci bıbe bıhoya duruşma: "dêmokrati bo İran û otonomi bo Kurdıstan". Danayê rama "so-

Institut kurde de Paris

syalizma demokratik"; sekreterê gıştî yê parti A.Qasımlo bû. Wi naveroka vê ramê şırovekır dı kongreya 6 ya PDKİ ya sala 1984. Naveroka vê ramê dı gewherê xwe de ew bû: "lı Kurdıstana İranê modêla bajariyek indûstriyal ava bıbın, lı gor pırinsipên sosyalizma demokrat", ev bı awaki fereh Qasımlo dı pırtûka xwe de "nıqaşeke kurt derheqa sosyalizmê" nıvisandiye.

Rama A.Qasımlo "sosyalizma demokratik" bestiye bı rêbaza politiki ya PDKİ, ya ku hê dı adara 1979 de weşandi bû, dı nav gel de. Lı gora vê programê pêşnıyar dıbû, ku bı awaki eşkere û roni sinor bête danin dı navbera wezifetên hukûmeta navendi û dezgayên hukmê herêmi (navçeyi). Pırsên pêwendiyên navnetewi, parastına welat, maliyet û planên abori yên pêşerojê; ev dımının wezifa hukûmeta navendi. Ew ji gereke mafên netewi, yên hemû kêmaniyên-êtnosan bısogırine. PDKİ wekheviya mafên netewi dıxwaze jı hemi eqelliyên etni re lı Kurdıstana İranê, mafê bıkaranina zıman û ûrf û adetên netewi, azadiya peyvê û çapemenıyê, azadiya çalakiyên komel û neqabatên herêmên êtni-wezifa dezgayên herêmê ne.

Dı programê de wısa hatıbû diyarkırın: "Jı wezifa hukûmeta herêma Kurdıstanê ye pırsên kûltûri; inan bı fermitiya (resmi) zımanê kurdi bo hukûmeta navçeyê, û hinbûna bı kurdi dı hemi dıbıstan û xwendegehan de; dı zangoyan de fakûlteyên zıman û wêjeyên kurdi damezırın; sinorên resmi yên Kurdıstan bêtın danin lı gor pivanên diroki, abori û gêografi; damezrandına parlamana kurdi, nıwêner bên hılbıjartın jı ali gel ve; hılbıjartına dezgayên navçeyi; cendırme û polis jı xelkên navçeyê pêkbên; problêmên cıvaki; kar û barên karxanan û serpereştiya berhema û dokûmentên van waran hemi dê bıbın bı zımanê kurdi; lê peyamên navbera dairan wê bı

zımanê farısi bın.[27]

Rêberên PDK-İ bawer dıkırın, ku pêkanina armanca xebatê dıkare bıbe heqiqet dı çarçıva İraneke dêmokrati de, hukûmeta taze ya İranê nıkare vê rewşê pêkbine. Lewra ji, bo pêkanina vê armancê wan bıryar da bı xebata çekdari, lê çareserkırına aştiyane jı hesabê xwe navêtın.

Bı dırêjaya salên 80 PDK-İ berdewam xebat dıkır bo çareserkırıneke aşti bo pırsa kurdi lı İranê. Nıwênerên wê ketın gellek guftûgoyan bı liderên resmi û rûhani re, ewên ku bawerıyên hukûmetê temsil dıkırın dı pırsa kurdi de. Yek jı cıvinên paşin bı wan re ew bû, ku Qasımlo lı Vıyanê bı şandiyên hıkûmeta Tehranê re cıviya bo guftûgoyê, da ku çareserkırıneke aştiyanê bıbinın jı pırsa kurdi re lı İranê. Lê kuştına A.Qasımlo bı wê xedrê havina sala1989 rêça guftûgoyan bı Tehranê re gırt.[28]

Dı kanûna dawiya sala 1989 de, lı quncıkek çıyayên Kurdıstana İraqê plênûma PDK-İ pênc rojan karê xwe berdewam kır. Dı plênûmê de Dr. Sadiq Şerefkendi hılbıjartın sêkretêrê gışti dı şûna Qasımlo de, navê wiyê nehini Seid Bedıl bû. (Ango Seidê mêrxas) Her wıha 5 endamên diger plênûmê hılbıjartın bo komita navendi. Plênûmê bıryar da, ku rêça palitika parti dımine mina berê; xebata xwe, parti, mina caran, wê bıke dı rêça "sosyalizma demokratik da", ku Qasımlo jı parti re vekır; "berdewama xebata çekdari heta pêkhanina otonomiyê bo 6,5 milyon Kurd lı İranê". Wısa ji bo komita navendi ya PDK-İ hat hılbıjartın Selam Aziz, serokê hêzên çekdar yên parti.

Heta dawiya salên 1980, lı Kurdıstana İranê nêziki 1500 nuqtên leşkeri yên hukûmeta İrani peyda bûn. Kurdan dest bı taktikê partizaniyê kırın. Bı şev bûyerên çekdari dıkırın, keminên leşkeri û kozıkên wan dıpeqandın, aliyatên erteşi

enbarê çek û bomba dıpeqandın lı çar hawêri Kurdıstana İranê.

Dı wê demê de endamên PDK-İ bı dehan hezar bûn. Parti sloganê xwe "xudmuxtari dı İran de" ne guherand. Lê dı eynê demê de terrorizm rıswa dıkır bı gıştı û her awayeki têrrorizmê, ku dıji endamên wê bıkar bıhata. Dıgel wê yekê ji, Parti, mina prinsipên himi bo xebata xwe dan diyakırın:

- Têkoşan bo İraneke rasteqine dêmokratik, azad, û siyaseteke aşti û dest dırêjnekırına nav karên welatên diger;

- Lı İranê mırov azad be;

- Sogırandına mafên cıvaki-abori yên çinên karkır.

- Sogırandına garantên mafê jınan û parastına kulfetan;

- Cudakırına mızgeftê jı serpereştiya dewletê;

- Dı xebat û çalakıya politika derve de PDK-İ hêviyên xwe lı ser sosyal-dêmokratên Ewrupi ava dıke (Fransa, Nêmsa, Swêd û yên dın), lê sırûşta xwe, ya serbıxwe, qet jı destê xwe berneda.[29]

Jı ali xwe de serokên sosyal-dêmokratên Ewrupa mıqate ya xwe lı bızava netewi-dêmokrati ya Kurdên İranê kır. Hevpeyvin, bıhev şêwırin bı rêberên Kurd re berdewam bûn. Deftera siyasi ya PDK-İ pêwendiyê fırawane dıke dıgel hemi dezgeyên sosintêrnê lı Ewrupa, hemi hêz û rêxıstınên siyasi yên diger, ku bıxwazın bı wan re hevkariyê bıkın.

Rêbaza siyasi, ku PDK-İ da ber xwe dı salên 80 de, ne mina hev, endamên wê dınerxandın. Hıneka jı wan berê xwe dane têoriya markısiya sert. Munaqeşeyên dı pırsên politikê de, bûn sedemên gellacıyên mezın, dı encamê de hın jı kadrên wê dı salên 1980, 82, 88 de jê dûr ketın, mina Xeni Bılûryan û Kerim Husami û h.w. Weke bersıva pırtûka A.Qasımlo "Diskûsiyoneke kurt derheqa sosyalizmê", dı bın

Institut kurde de Paris

vi navi bı xwe de Kerim Husami pırtûkek derxıst dı eynê salê de, ango sala1984. Dı pırtûka xwe de rexnên tund lı Qasımlo kır dı warê hılwest û rêbaza teze ya PDK-İ. K. Husami dıxwest, ku şorışeke bûrjûvazi-dêmokrat amade bıbe, bı serokatiya proletaran û çinên kesebe lı bajaran. Ewên, ku dıkarın rêjimeke şorışger û demokratik dı welat de bı ci binın û rêjimeke wısa dıkare programa çêkırına Kurdıstana otonomi bı ci bine.

Hevalbendên vê grûpê hewl dan bo pêkanina partiyek nû, lı gor baweriya wan, wê bıba pêşewayê xebata Kurdên İranê dı rêça vedestxıstına mafên netewi. Lê belê, jı destpêkê de, bı sedemên ne hındık, ew xwestekên wan badihewa çûn, çımki cemawerên Kurd lı dû baweriyê PDK-İ dıçûn û idêologiya markısi hê dı nav wan de cıyê xwe nagıre. Şırovekırına têkoşina rêxıstıneke kurdi, ya diger, ku lı Kurdıstana İrani xebat dıke, (mebesta me pê "Komele" ye) rastiya vê peyvê dıyar dıke. "Komele" daxuyaniyek belavkır, got, ku dıxwaze pırsa netewi gışti û ya kurdi bı taybeti çareser bıke bı rêça şorışa proletari. Dı programa wê de wısa hatıbû: "Parti alikarê wê yekê ye, ku pırsa heri sereke ya wergırtına dezgahên welat ın û pırsa netewi bı awaki dialêktiki, konkrêt diroki gırêdaye bı ya proletari çini ve û tewandiyê pırsa serekaneyê-wergıtına hukmê welat.[30]

Pışti ku hevalbendiya programa otonomiya kurdi dıyar kır, komele dıgel hêzên oppozisyonên kurdi, yên otonomixwaz, propagandeyeke fırawane dıji rêjimê İran kır, gazi Kurdan û gelên mayin dıkır, da bı hevra dakevın cenga çekdariyê lı İranê gışti. Lê efsûs, ku dı hundurê vê partiyê de ji fıtneyeke dıjwar hebû.

Sala 1982, angori bıryara kongra sêyem, Komele kete nav "Yekitiya têkoşerên Komûnist", ev yekiti pêkhat jı "Komelê",



Institut kurde de Paris

Peykaran û perçeyek jı Fedaiyan. Pıştî vê yekitiyê komelê navê xwe kır "Rêxıstına kurdi ya partiya komûnistên İranê" (lê hiç pêwendıyên wê yê partayeti dıgel partiya "TYDE" nebûn). Vê partiya nûhati dı mehên Çıleyê Paşin-Sıbatê de sala1984 kongra xwe lıdarxıst. Hınga bıryar dan, ku Komele bıkeve nav hêzên Encumena Berxwedana Netewi (EBN) ew encumena ku dı sala 1981 de pêkhatıbû bı saya rêberên benda "Mucahıdên Xelqê İranê" (BMXİ), mina Mesûd Recawi û A. Beniserd; serokê komara islami yê berê. Dı doza otonomiya Kurdi de pırsek daket holê, ku prensipên nû jı otonomiya kurdi re bêtın danin.

Dı programa xwe de "Komelê", xalek nû zêde kır "hevkari û hevalti bı hemi hêzan re, yên ku dıji rêjim têdıkoşın". Xebat û lebata xwe "Komele" avakır lı ser prinsipê xwe amadekırınê bo raperina çekdari lı pê navê:

- Hılweşina rêjimê islami, çunke bê vê yekê qet rewşa proletaran, karkeran û sıtembaran çêtır nabe.

- Damezırandına komareke dêmokratik bı serpereştiya dezgayên proletari û avakırına sosyalizmê û pıştre, avakırına komûnizmê lı cıhanê gışti.

"Komele" jı bo proletarên İranê, ya rast, proletarên Kurdıstanê, programeke marksi pêşneyarkır. Programeke wısa, ku naveroka wê, bı xebateke sert, bê nermi û dılovani dı demeke kurt de jı xebata idêologi wê bı ci bıbe. Bextê xwe girew dıkır, ku ewê zû-zû proletaran amade bıke û wê hukum lı welat tevi bıgre û şorışa, sosyalizmê bıserkeve. Programa dûrdırêja komelê, ku perpeyek bû jı ya partiya komûnista İranê (ya nûhati-werger) ev xalên jêrin dıxwestın:

- Serbestiya gelan, lı ser himê "dêmokratiya encumena".

- Netewekırına hemi banka û yekkırına wan.

Institut kurde de Paris

- Karxane û berhemên wan gereke bıkevın bın kontrola encumenên karkıran (çı yê xas û çı yê dewletê bın).

- Netewekırına zeviyan.

Çendi ku "Komelê" çendan car xwe rexne ji kır, xwe tawanbar kır bı "xudperestıyê", disa ji vê partiyê nekarıbû jı idêologiya xwe ya teng derkeve û jı êkstrêmizma xwe dûr bıbe. Jı aliki ve dıgotın berê proletar û cotkar agadari xwe bın, dı pêşveçûna xwe de neghên bûrjûvaziyan, jı aliyê di ve baweriya xwe tani, ku mumkın e bûrjûvazi perwerde bıbın û bêne ser baweriya proletaran. Ev ramana bı baweşina rêalên jiyana İranê re hatın, dı dema "şorışa sıpi de" û gorrinên salên 1960-1970.

Çendi ku bıryarên siyasi û idêologi yên xebata vê partiyê ne rêk û rewan bûn ji, lê lı Kurdıstana İranê hın programên cıvaki bı ci anin. Mina nımûnê; dı gelek gundan de encumenê gundiyan durust kırın, wan encumena serpereştiya hemi kar û barên xelkên gund bı ci dıkırın, nexweşxanê koçi jı gundiyan re peyda kırın, jı zarokên gundan û cahılên wan re dıbıstan vekırın, her wıha jı partizanên xwe ra ji dergehê xwendınê vekırın, ew hini xwendın û politikê dıkırın û h.w.

Dı politika xwe ya derve de komele baweriya xwe bı hiç partiyeke komûnist yan sosyalist netani û bı tundi êrişi bûyerên, ku salên 80 rûdan lı Yekıtiya Sosyalistê Sovyeti ÛSS. Gelek balkêşi dıda propaganda "şorışgêrane", bı zımanê kurdi û farısi rojnama xwe ya navendi "pêşrew" dıweşand. Bıli jı wısa, da ku bıbe rêberê kurdayetiyê, "Komele" rexnê tûj dıkırın lı karûbarên PDK-İ, gelek caran fıtne dı nav wan de dıgıha raddê cenga çekdariyê û kuştınê.

Lê belê, Komele wısa ji nebû rêxıstıneke kemlan û bı rûmet dı nav cemawerên Kurdıstana İranê de. Bereva ji, hın-

dık-hındık rûmeta wê ya siyasi dı nav Kurdên Iranê de daket. Weke xuya dıke, ev rewş peyda bû pışti perçıqandına Tûdêh û bızava komûnistên Iranê, û her wıha ji pûçkırına marksizm-lêninizmê bı tevayi paş hılweşina Yekıtiya Sosyalistê Sovyeti ÛSS û benda sosyalist, ku bı serokatiya Sovyêt bû. Jı hıngave "Komele" xwe jı berê bêhtır dıspêre peyrewkên cıvaki- siyasi yên komûnistên Çinê.

Hemi hêzên politiki yên Kurd û rêbazên wan lı Iranê ferman bı wan derket, ku dıji qanûna welat ın. Leşkerê Iranê, Pasdaran û cendırme êrişeke dıjwar bırın ser oppozisyona kurdi. Eger pışti herıfandına rêjima şah, Kurdan demekê karıbûn sûd jı bêpergaliya rewşa welat bıbinın û lı Kurdıstana Iranê "Herêmên azad" peyda bıkın û Kurdan serpereştiya hemi kar û barê xwe bı xwe dıkırın, lê pışti kû islamiya dezgahên hukûmetê xıstın destê xwe, hêzên berxwedana Kurdan neçare ketın çıyan. Baregaya serpereştiya cenga çekdariya Kurdên Iranê êdi jı Iranê derket û kete Kurdıstana Başûr (Iraqê).

Dı nav kenarên bıcianina programa "musulmanti û çanda şoreşgeriyê de" rêjima islami yê teze lı Iranê hewl da ku hınek libêralizmê-serbestiyê têxe politika xwe ya jiyana kûltûri. Jı destpêka buhara sala 1985 lı Kurdıstana Iranê kovara "*Şiva*" hate çapkırın û weşandın dı bın bersıvdariya hozanê Kurd ya navdar Hêmin. Ev bûyer dı nav Kurdan de bû şahiyeke nayab. Gaveke hê gıringtır rûda, yekem kongreya edebiyat û kûltûra Kurdan damezra dı 25-27 ilonê sala1986. Bı sedan nıviskar û zanayên Kurd tev lê bûn, ew jı hemi etraf û eknafê Iranê hatıbûn. Serokwezirê Iranê, yê wê demê Mir Husên Mûsewi, nameyek şand jı kongrê re; tê de piroz dıkır ew bir û baweriyên ku dıkarın bıbın bınyad jı bo pêşeroja geşebûna kûltûra kurdi. Kongrê bernameyek bı bıryara gışti

wergırt. Ew bername jı 10 xalan pêkhatıbû: Dı wan de diyar bıbûn rêbazên heri gıring û sereke yên pêşveçûna kûltûra kurdi dı pêşerojê de. Yek jı wan xalan, wek nımûnê, wısa hatıbû; Bıkaranina zımanê kurdi bı awaki deha fırehtır dı warê literatûrê (edebiyetê) dı dıbıstanên kurdi de, damezrandına akadêmiya zanısti ya Kurdi. Kovara "Şiva" bıbe mehane (berê her 3 meha carek derdıket-werger).

Çendi, ku kar û barê çapemeniyê û veweşandınê rêkûpêk bıbû ji, bo weşanên nıviskarên Kurd, lı Şınoyê navenda zanıstiya Kurdi ava bû bı navê "Selaheddin", disa ji dı warê geşebûna kûltûra kurdi de kar bı sısti dılıviya. Hın istgehên radyo lı İranê programê xwe kırın bı zımanê Kurdi. Wısa ji ıstgeha têlêvizyona navendiya irani û lıqên wê yên herêmi lı Kurdıstanê bı zımanê kurdi parek jı programên xwe vedıweşandın.

Belam, yê heri sereke dı doza Kurdan de, helbet, pêk nehatıbû; xwendına zımanê kurdi dı dıbıstanan de, çendi ku pırtûken şagırtên wan êdi çap bıbûn û amade bûn, û çendi ku diroka gelê Kurd dı wan pırtûkan de hatıbû lı gor propaganda şiiya û awayê jiyana musulmantiyê. Wıha ji dezgeyên islami rê nedan intelligênta kurdi, ku rêxıstınên xwe yê serpereştiya kar (nıqabe) û komeleyên hevkariyê durust bıkın. Gelek jı wan aware û penaber bûne, çunke lı İranê warê jin û nıvisina normal hiç niye, yan jı tırsa zındanên ku dergehê wan vekıriye jı wan mırovan re, ku serbest dıfıkırın, yan ramyariya wan lı ya rêjimê islami nagunce. Pırsa xwendınê bı zımanê kurdi, dersên dirok û edebiyatên kurdi dı dıbıstan û zangoyê de tev avêtın pışt guhan.

Dıgel hemi soz û bextên hukûmeta islami, disan bı hukmê qanûnê mûzika kurdi qedeqe ma, û ew kûltûr ji bınpê bû. Stran û sırûdên çendan dengbêjên Kurd dı ahengan û radyo



Institut kurde de Paris

de qedexe bûn. Kasêtên wan jı hemi fıroşgahan hılanin. Jandermê islami berdewam çavdêri dıkın da ku ew kasêt lı cıyeki neyên fırotın û bıhistın.

Paş ku peymana aşıtiyê hate danin dı nav İraq û İranê de havina sala 1988, hın rêberên sereke dı dezgahên bılınd de haya xwe dane doza Kurd û Kurdıstanê. Dı payiza 1988 dêlêgasyonek jı bersıvdarên iranıyên bılınd çûn Kurdıstanê. Yek jı endamê wê dêlêgasyonê serokê komara islamiya İrana wê damê Xamaney bû, serokê parlamanê û serokê hêzên erteşi KİI-A. Rafsencani, serekwezirê İran Mûsewi, wezirê agahdari û sogırandına jiyana cıvaki Rêyşahri. Çendi ku ev dêlêgasyon tu mafê wê nebûn ku pırsa kurdi, kêm-zêde çareserbıke ji, wê bıryar da, ku hemi der û warên ku zıyan gıhaştiye wan, dı dema cenga nav İran û İraqê de, gerek bêtın avakırın û bı têmpên zû aboriya vê herêmê pêşde here. Encumanê, wısa ji, bıryar da, ku pêwist e bı zûtırin wext rewşa pızışkiyê û tendurustıyê normal bıbe û her wıha ji dı warê xwendegehan de. Lê ev hemi ne cewherê doza kurdi bûn.

Çareserkırına siyasi ya doza kurdi lı İranê tûşi gelek astengan dıbe, mina hılwestên core-core yên grûpên siyasi û hın rêberên komara islamiya İrani derheqa vê problêmê de. Hın jı endamên bersıvdarên bılınd meyldar ın, ku hısab jı pırsa kurdi re ji gerek bê kırın dı nav bırra problêmên hundurê welat de. Hınên di bı tundi û serti pıştgıriya bıryarên Xumeyni dıkın dı idêologiya islamiya dewletê de û şerietên wê. Lıgor vê rêbazê, herêmên kurdi jı nıjadê kurdi paqıj dıkın (vala dıkın) bı daxwaza ku bızava otonomixwaza kurdi jı bıni ve hılqetinın û politika têrrorizmê dı Kurdıstanê de bı kar binın û tinın. Dı sala 1992, lı Berlinê, sekreterê gıştı yê PDKİ Sadıq Şerefkendi û çend hevalên wi şehid çûn. Bı rasti, gelek dıjwar e êdi peydakırına pêwendiyeke aşti dı navbera herdû rexan

dı pırsa kurdi de; rexê şiiyên dewleta pır netewi û hêzên azadixwazên kurdi. Kurd qebûl nakın pêşnıyara hukumeta İrani, ewa lı gor naveroka wê, gerek wılayeta feqih dazgah be. Kurd, sunni ne, lewra ji dezgahê heri bılınd, gereke yê şêwrê be; serpereştiya encumeni hevrayi dıkare dezgaha bılınd bıxwe bıgıre. Şiizm, ku dıbine mırov dı aqılê xwe de ne kemlane, nemaze dı warê oli de, qebûl nake ku (icma) dıkare bıbe bınyad. Ev xılaf, ta pêlûkeke dıyar, xuya dıke dı xwestekên otonomiya kurdi de, çunke Kurd dıxwazın, ku rêbaza resmi ya komara İrani jı bıngehê xwe ve bête guhertın bı rêbazeke taze, ku hemnışinên welat, wetendaşê İran yeksa bın dı hemi borc û mafên niştımani de, bêy temaşabûna koka mırov ya oli. Dêmek Kurd dıxwazın din ji hıkûmetê cuda bıkın. Wısa dıyar dıbe, ku ew bête avakırın mina welatên Rojava, lê rêjimê İrani bı serti dawa "dêmokratiya islami" dıke. Kurd, wısa ji, kok qebûl nakın prinsipê heri sereke yê politika dervey welat "Êksporta şorışa islami".

Bızava kurdi lı İranê û rêberên wê xebat dıkın dıji bıkaranina formê sedsalên navendi dı warê cezakırınê de, mina destjêkırınê û her wısa ji dıji wê yekê ne, ku qanûnên welat mafê jınan dı warê cıvaki de bınpê bıkın û bı çewsinın. Dı qanûna taze de gavên berbıpaşve hatıne avêtın angori qanûna sala1967, ku heq dabû jınan, xwe jı mêran berdın; mafê telaqdana jına, jı jınê re hınek şırûtên qanûni jı mêr dıhatın xwestın, bêy wan şertan izna mêr nebû, ku hema wesa jına xwe berde. Jınên Kurd dıji pûşiyê ne. Bı awaki gıştı jınên Kurdıstanê xebateke aktiv dıkın dı jiyana cıvaki-politiki ya Kurdıstana Rojhılat de. Û ya dawi, eger Kurd dı programa xwe ya otonomi de pêwendê dıkın bı prinsipên beyannameya mafê mırov, ku Encumena Netewên Hevgırti (ENH) bıryar pêdaye, jı alıyê di dezgahên şii berê xwe dıdın şerieta (çewt-



Institut kurde de Paris

werger).

Bı vi awayi, heta despêka sala 1990 pırsa kurdi wısa ma bê çareser. Jı ber hêzên hın faktoran -çı objêktiv û çı sûbjêktiv-, ev problêm derbasi hundur bû. Astengên objêktivê têkoşina Kurdên otonomixwaz gırêdayi ne bı mirata gıran ve, aboriya wan: Paşketına aboriya herêmên kurdi û hemi warên jinê, jı hemiyan xırabtır warê çandi û çêlikên wê; cahıli, jı hev perçebûn, germiya tekoşinê, pırê caran, ne lıpê navê armancên siyasi û cıvaki ne, belkû lıpê navê yeki navdar ın.

Astengên sûbjêktiv ji, gırêdayi ne bı baweriyên paşvemayi û hogıriyên kevnar ve, ku cemawerên xelqê, û liderên Kurdan bıxwe ji, û hın rêberên rêxıstınên sıyasi jı diroka kevnar wergırtıne. Hin faktorê tradisyonalizmê (teqlid) rola sereke dıbine dı pêkhatına partiyên siyasi de.

Çareserkırına pırsa kurdi tûşi rewşeke nêgative diger bûbû, ew ji astengiya rewşa Kurdıstana İranê bı xwe bû: Mayina leşkereki mezın bı jımarê xwe û çekên xwe ve lı Kurdıstanê pışti rawestandına cenga İran-Iraqê, wêran kırına gelek herêmên Kurdıstanê, hejari û bırçitiya ku bıser Kurd bariya, penaberên bê jımar, ku jı Kurdıstana İraq û Tırkiyê bı ser ên İranê de revin û h.w.

Lı gor raporta "encumena efûya" cıhani û raporta salanę ya encumena Amêriki ya hukûmi dı warê parastına mafê mırov ya sala 1994, rewş lı Kurdıstana İranê hê gelek dıjwar bû.[31] Dezgayên resmi dıxwazın ku endamê partiyên kurdi, yên nehıni, tevan bıkujın çı lı hundurê İranê çı lı dervey wê. Sêkretêrê gışti yê teze a PDK-İ Mıstefa Hıcri, mehkûm bûye bı kuştınê û carekê hewl dane wi bıkujın. Dêportamenta Amêriki ya mafên mırov dınıvise raporta xwe ya sala 1994 ku bı kêmani 56 mırov bı tuhmeta endamên PDK-İ jı meha 6

sala 1993 ta meha 3 sala 1994 lı jêr eşkence û têrrorê de bûn. Dı 8 ilonê 1993 bêtıri 70 mırovi bersıvdar bûn, û têr dıjûn kırın çıma ku cılê kurdi lı xwe kırıbûn. 10 kes ji betaweta bûn yekser, 100 hezar Kurd zından kırın lı herêma Kurdıstanê bı sedemên pûç. Jı temûza 1993 ta dawiya salê 100 gundên der û dorên Serdeşt, Banê, Şıno, Saqız, Bokan û Mehabadê jı kok ve hılweşandın û xelkên wan bı zor berdan nav zeviyên luxumkıri, min bı wan da peqin, mırovên bê guneh tev şehid çûn, nemaze lı herêma lı ber sinorê Kurdıstana İraqê[32]. Dı hevpeyvineke xwe de M.Hıcri got, ku "PDK-İ kete rewşek nehini, û pêşmerge ketın şerê partizaniyê. Bızava kurdi lı İranê hewl dıde, ku rêjimê islami lawaz bıke, ruswa û bê rûmet bıke. Jı dema rêjimê islami hatiye hukum 500 gundên Kurdan wêran kırın. Em jı dewletên cıhanê dıxwazın agahdari vê pırsê bıbın, û destê yarmetiyê dırêji İran nekın, tû tışteki nekın bı nêta sıvıkkırına borca rêjimê islamiyê lı İranê". Hıcri wısa ji got, ku dostani dı nav wan û kurdên İraqê de PDK û YN û yê mayin de ji heye, û her wıha ji, dıgel hemi hêzên oppozisyonê İranê ji bıli jı "Mucahidinê xelq" û monarşistan (hevalbendên rêjimê şah).

Lê Tehran bı awaki fermi dıbêje, ku hılwesta dı pırsa kurdi de nayête guhartın û İran mılleteki tenha ye, ne pıretnos e. Cigırê serokê welat dı Encumena Berza parastınê de Dr. Hesen Rûhani vê hılwestê bıci û cıvan dıke dı peyva xwe de dı rojnama "RİSALÛT" de -tirmeh-1994. Wi got "ferqi tune dı navbera Kurdan, Tırkan, Farısan û grûpên mılletên diger", her Kurdek dıkare bête hılbıjartın bo endamtiya meclisê, serbest dı zangoyê de bıxwinın lê axayê rûhani nani serzımên, ku gereke Kurd mılletiya xwe jıbir bıkın û bıbne şii.

Dı dema sala1993-1994 de, çar caran gundên Kurdan bombebaran kırın, ew gundên, ku hê mabûn bı dırêjaya sinorên



Institut kurde de Paris

İran-İraqê ve. Hukûmeta İranê van êrişên xwe wısa dıde dıyarkırın, goya bersıvên dıji êrişên partizanê Kurdan ın, ku ew dı rûyê erteşê me de radıbın lı wan navçeyan. Dı encama wan bombebarana dexl û danên gundiyan tev şewıtin. Cemawerên gundiyan jı neçari reviyan, çûne nav Kurdên İraqê; herêma otonomiya kurdi. İran wısa ji dıxwaze, ku dıji partizanê PDK-İ wan eşiran bıkarbine, ewên ku beri vê demê hevalbendiya Saddam Huseyn dıkırın. Jımarê leşkerê İrani lı Kurdıstanê jı 200 hezari daket 150 hezar. "Lê em dıbêjın, ku tu asteng ninın lıber hukûmeta İranê da ku rêça dêmokrasiyê bıde ber welat û em tev bı aşiti bıjin" bı baweriya M. Hıcri.

Dıvê em bêjın, ku İran dı kırizeke abori ya kûr da derbas dıbe, ku wê neçar dıke destê parsê dırêji ne tenha welatên rojhılat, lê yên rojava ji bıke. Almanya, mına nımûne, bazırganiyeke fereh bı İran re dıke, behrek jı wê bazırganiyê çek ın, ku İran dıji kurdan bı kartine.

## Gıringiya Herêmi û Navnetewi Ya Doza Kurdi lı İranê

Yek jı sedemên ku rêjimê İrani têvedan, da ku mêtodên cengê bıkarbine dıji bızava kurdi dı welat de, ew bû, ku yekitiya welatê İrani bıparêze. Kurdên İranê, çendi sloganên otonomiyê hıldıdın dı nav parkenarên İranê de, lê gırebendiya wan hebû bı Kurdên İraqê û Tırkiyê re, ewên ku dawa parenıvisa netewi dıkın; çı bı awayê otonomi, çı bı serxwebûn û azadi. Lewra ji bızava otonomixwaza Kurdên İranê naveroka wê dıbe navnetewi-navherêmi. Dıyar e, jı ber vê yekê, İran û Tırkiye dıgel Sûriyê ve; yekser jı despêka damezırandına "herêma azad" lı Kurdıstana İraqê her şeş meha carekê

Institut kurde de Paris

kar û barên xwe bı hev re rêkûrewan dıkın. Faktorê yekane ku rê nade hukûmeta İranê, da bıhevrayi şerê bızava kurdi bıke, ew e, ku hesara lı ser İranê, yan ji problêmên têkeleyên abori û bazırganiyên bı welatên Rojava re ne. Dı buhar û payiza sala 1993 û 1994 leşkerê İrani bombebaran kırın gund û şeherên, ku lı herêma fêdêrativa Kurdıstana İraqê ne, ango ew ciyên ku dezgeya otonomixwazên Kurdên İranê lê dıhêwırin, jı sinor 5 km. dûr ber bı qada Kurdıstana İraqê ve. Dı naveroka protokola navbera İran û Tırkiyê de, ku imze bûye sala 1993, erişên İran, wısa hatıne qeware kırın: goya redbuyerın dıji êrişên partizanên Kurdan, ku jı xakê İraqê tên.[33] Dı wê demê de ji destê yardemiyê da rêxıstınê islami lı Kurdıstana İraqê, berjewendiya xwe dıbinın dı ferehbûna rola van islamiyan de beramber hêzên kurdperwer. Lewra ji, gava jı despêka 1994 çend rûdanên çekdari dı nav YNK û islamiyan de bı serokayetêya Mella Osman Abdul-Eziz, İran yekser xwe amade kır bo navciti û lıhevhatına wan bıke.

Helwesta xwe dı Kurdıstana İranê de rêjimê welat temaşe dıke bı dıleki xurt. Ne badihewa Dr. Ruhani dıgot, ku "lı İranê hiç problêm tunın dı warê doza kurdi de, jı pêl hınek grûpên tek-tûk, ku bı Bexdadê ve gırêdayi ne, nexasım jımarên wan hındık ın û rewşa welat bı wan kêm û zêde nayête guhertın. Em tev şahıd bûn gava bı çalaki xelkên bajarên kurdi derketın numayışgeha 11 sıbatê 1994 bı hoya yadgıra salane ya serkevtına şorışa islami. Lı van şeheran hılbıjartın dıbın bı çalakiyên ne kêmtır jı cigeheki dın lı İranê. Lewra ji, em hiç tuxeterê nabinın jı ali herêmên ku Kurd lê dıjin".[34]

Rêjima Komara İslami ya İran, ku rewş lı Kurdıstana İranê xıstiye bın destê xwe, tu car xafıl nabe jı rewşa perçeyên Kurdıstan yên mayin, destê hevkariyê û alikariyê dırêji Sûri û Tırkiyê ji dıke, lı dıji bızava kurdi dı herêmê de tevdir û karên

xwe bı hevre rêk û rewan dıkın. Dı çarçıva van peymanan de, bı awaki dewri cıvinê xwe dıkın dı pırsa kurdi de lı ser asta wezirên karûbarê derveyi yên İran, Sûri û Tırkiyê. Wek nımûne em bêjın; cıvinên wısa pêkhatın dı meha 11 sala 1992 de, havinê û çılê sala 1993 û sala1994 de ji [35]. Bıli jı vê, dewletên ku Kurdıstan lı hev parvekırıne, dı nav wan de peymanên dûali ji imze bûne, ku rolên wan dı politika kurdi de dûz dıkın. Dı meha 11 sala 1993 İran û Tırkiyê protokola emni imze kırın, dı naveroka wê de hatıbû: "nekes, jı herdû terefan mecal nade bûyerên têrrorizmi jı welatên wi destpêbıbe." Jı wê bêhtır, berdevkê serokê İranê A. Refsecani, Çulan Huseyn Bolandicyan eşkera got, ku İran wê şerê çekdari bıke dıji PKK. 13 heziranê 1994 Ankera jı wezirê navxweyi yê İrani Muhemmed Beşareti xwest, gava mêvanê Tırkiyê bû, ku İran gereke rê bıde, da Tırkiyê bombebaran bıke wan cigehên ku kampê PKK lê hene lı Araratê û Tendûrekê. Dı 14 heziranê de serokê Tırkiyê S. Demirêl got, ku em û İran bı hev re şerê PKK dıkın. 16 heziranê 1994 İranê rê da Tırkiyê hêzên xwe bıkarbine dıji PKK lı ser xaka İranê. Bı vi awayi sê xalên taybeti kıfşkırın: Rêgırtın, da ku endamê PKK jı Kurdıstana İraqê û İranê derbas Tırkiyê (Kurdıstana Bakûr-Wergêr) nebın; Rêgırtın lı pêş endamê PKK, da neçın Armêniya û hê wêdatır Rûsiya; xırabkırına wan rê û rêçıkên ku PKK lı İranê bıkartine bo bırına zexire û çekan jı kampên xwe re û jı wır pelamarên xwe dı bın Tırkan.[36]

Protokoleke mina vê imze bû dı navbera Tırkiyê û Sûriyê de ji. Dı wê de ji herdû teref xwe burcdar dıkın bıhevkariya dıji PKK û lıqên wê yên lı Almanya û Fransa. İmzekırına van dokûmentan dı nav wan dewletên (ku Kurdıstan lı hev parvekırıne-werger) dıbe şahid, ku geleki dıtırsın jı serhıldana nıştımanperweriya kurdi dı herêma Asiya Rojava de. Hevka-

Institut kurde de Paris

riya Ankara, Tehran û Damask dıji (bızava azadixwaza Kurd, û pêşi hemiyan, dıji hebûn û berdewamiya Kurdıstana fêdêrativa Başûr, ne tenha Bexdad dılxweş dıke, lê dıbe hevalbendê parem bo dawerıvandına doza kurdi dı politika herêmi de - werger).

Dı warê gırıngitiya doza kurdi de ya herêmi, dezgayên fermi yên İran bala xwe dıdın rewşa Kurdên Gurcıstanê, Armenıstanê û Azerbêcanê. Tehran gellek balkêşi vê herêmê bû dı havin û payiza sala 1993, gava, ku Armênya kete navpeyeke fırawane jı xakê Azêrbêcanê, (nêziki 29% xakê wê). Tehran hınga gellek hısab dıkırın, ku bızava kurdi wê lı vê navçê bılınd û çalaktır bıbe, wê pêlên wê Kurdên İranê ji werbıgre. Belki ev tışt ji dıkete hesabê Tehranê, gava protokola hevkariyê bı Tırkiyê re qûl kır.

Qûlkırına protokolên, bû mina redbûyerek lı hember politika welatên Asya Rojava de, ta raddeykê, bû mina redbûyerek lı hember politika Wilayetên Amerika Yekgırti WAY û politika welatên Ewrûpa Rojava dı pırsa kurdi de, pışti cenga Delavê Farısi, dema ku wan rasterê pışgıriya Kurdên İraqê kırın dı damezırandına otonomiya rasteqine lı Kurdıstana İraqê.

Dı wê demê de ji, bızava otonomixwaza Kurdên İranê alikari jê re tê, jı organizasiyonên derve yên ne fermi (hukûmi). Pêşmerge, wek nımûne, yarmetiyê dıstinın lı nexweşxana "Azadi", lı wê derê doktorên Ewrûpi kardıkırın. Alikariya menewi û matêryali bı sogırandın jı Kurd re tê jı fondê Libêrtê, bı serokatiya Danyêl Mittêran (Xanıma serokê Fransa jı 1981-1995), rêxıstına yarmetiyên pızışki ya navnetewi û wısa ji jı ali gellek rêxıstınên cıvaki û fondên welatên Ewrûpi.

Dı rewşeke wısa de, PDK-İ, hewl dıde, ku koma mılletan

"ENY" balkêşi doza Kurd lı İranê bıke, her wıha ji dezgayên resmi lı Amerika û welatên Ewrûpa. Bı hoya vê yekê, M. Hıcri peyxamıne taybeti şandın jı wan re, dı wan de dıyar kırıbû xûsûsiyeta doza kurdi lı İranê, nemaze, hê pırsa Kurdên İranê nebûye naveroka rojevan lı ser asta navdewleti.


1. İran Almanac. Tehran, 1989

2. People Without a country: The kurds and Kurdıstan. L.1979.

3. Le movrement revolutionair du Kurdıstan d´İran. Tehran.s.3.

4. The international journal... 1994.p.136.

5. Jigalina O. İ. "Hın xusûsiyetên prosêsên êtnocıvaki lı İranê" (dirok û nûdem) pırtûka "Asya Rojava" Mosko,1993 rûp.104.

6. Polonskaya L .R. Vefa A. X. Rohılat: Ram û ramyari, Mosko, 1992.rûp.66.

7. Lı wır bı xwe.

8. Jigalina O. İ. "Bızava demokrat a netewi lı Kurdıstana İranê jı 1960 ta 1970". berhevoka Walat û gelên Rohılata Nêz û Navin. XMMM, kurdologi. Erêvan 1985 rûp. 24-26.

9. Qasemlou A. The kurds and Kurdıstan. Prg, 1966.pp.165-166.

10. Garthwaite Gene A. Reimagined İnternal Frontiers tribes and Netionalism- Baxtiyari and Kurds.- İn "Russion Muslims", ed by D. F. Eickelman. İndıana univ press. 1993. rûp.140-141.

11. Demin A.İ. İranskaya dêrêvnya. M.1977.

12. Tsûkanov V. P. newekheviya pêşveçûna herêmi lı İranê. Abori û politika selên (1960-70) Mosko-1984. rûp. 39.

13. Agayev C. L. İran dı navbera rabori û pêşerojê de. M.1987 rûp.11.

14. Trûbetskoy V.V. Derbarey pırsa bangora rêformên bûrjûvazi salên 60-75 lı prosêsên netewi dı İranê de. (Berevok-prosêsên netewi dı Rojhılata nûdemi de Mosko.1977. rûp.94.)

15. Şorışa islami 1978-1979. Mosko.1989. rûp.56.

16. News ans views. Tehran.1979. No: 125

17. Şerieti A. Mezheb eleyhê mezheb rûp.16.


Institut kurde de Paris

18. Xumeyni P. Hukumeta Cumhûriya islami,(b.c.b.s.)

19. Ali Ahmed Celal. Xerbzadeyi. Tehran. 1962.

20. News ans views, 1979. No: 125 rûp. 13.

21. Malûşkov V. G. Bawerıyên Ali Şerieti yên felsefi û cıvaki-politiki dı pırtûka Malûşkov û Xromova K. A. de: venêrina rêçên rêforman dı islamê de, serpêhatiya İrani: rûp 113.

22. Şurışa İrani. rûp. 267.

23. Mensûr Mûeddil. Class, Politics, and ideology in the İranian Revolution. Colombia univ Press. New-York 1993 rûp. 131.

24. Jigalina O.İ. Rola islamê dı pêşveçûna idêologiya bızava netewiya kurdi lı İranê - dı berevokê de bı navê: "islam dı welatên Rojhılata Nêz û Orte de" Mosko. 1982. rûp. 122-23.

25. Lı wır ji.

26. Lı wır ji.

27. Programa PDK(İ). Paris. 1987. (bı zımanê farısi).

28. Actualite de Kurdıstan. Numero spêsial. Tirme-ab. 1989.

29. Le mûvoman Revolutionnair du Kurdıstan s.3.

30. Programa partiya "Komele". Tehran. 1989.

31. İranian Kurdıstan, July- August 1994.

32. İranian Kurdıstan, septembêr-oktober 1994.

33. Olson Robert. the kurdish question and geopolitik and geostrategic changes in the middle East After the Gulf War. ın: "journal of south Asian and Middle Eastern Studies. vol. XVMM" No: 4. Summer 1994.

34. Rısalet -Tirmeh, 1994.

35. Olson R. The Kurdish Question... rûp, 67.

36. Kurdihs life. Number 10, spring. 1994.

37. İranian Kurdistan, July-August- 1993.

Institut kurde de Paris

# Faktorê Kurdi Dı Sûriya Nûdemi Da

A. H. Bagirov

Institut kurde de Paris

Lı gor ku Kurd dıbêjın, hejmara Kurdên Sûrıyê nêzi 10% gelê Sûrıya ye. Jı dawiya salên 50-an û heta iro berevokên hejmartınê yên fermi (resmi), her wıha ji destûra Sûri xwe dûri pırsa hebûna cemawerên Kurd lı Sûrıyê dıkın. Dıgel wê yekê ji, hejmara xelkên Cızirê (mûhafeza Hesekê) jı sala 1941-1955 duqat bû, bı awaki sereke, lı ser hesabê zêdebûna sırûşti. Wê demê hejmara xelkên Kurd 14% bûn.

Kurd bı awaki sereke lı muhafeza Hesekê, Helebê û Dımeşqê dıjin, bı awaki belav ji, Kurd lı bajarên Reqayê, Laziqiyê, Hamayê û Dêra-Zorê dıjin. Lê lı herêma bajarên Efrin, Serê-Kaniyê û Hesekê, Kurd yan lı xwerû yan pıraniya xelkên ci ne. Herêma Muhafeza Hesekê (Cezirê) 22170 km$^2$.

Lı Dımeşqê Kurd lı Rukneddin (Heyıl-Akrad) dımının û bajarên herêma ku Kurd bı awaki sereke lê dıjin ev ın: Hesekê, Qamışli, Tılkoper, Tırbesıpiyê, Amûdê, Derbasiyê û Efrinê.

Lê herêma Helebê, Kurd lı navçeya çıyayê Kurdan, Kûbanê û Cerablûsê dıjin. Lı gor reqemên fermi jımara Kurdan sala 1960 bı vi awayi bûn: Qamışlê 45 hezar, Heseke 22 hezar, lı Amûdê, Derbasiyê, Rasûl-Aynê, 30 hezar lı her bajareki dıjin.

Lê lı Dêrıkê, Tırbesıpıyê û Tılkoçerê, zêdeyi 5-8 hezar Kurd dıjin. Lı alıyê rojava, nêzi 15 hezar Efrin, 5 hezar Azaz, 9 hezar herêma Cerablûs û 3 hezar ji Kûbanê.

Jı sala 1960-1970 jımarê xelkên herêma kurdi bı 28,7% lı xwe zêde kırın. Ev nısbet lı gor Sûrıyê gıştı gıha 7,4%, lê zêdebûna gelê welat dı sala 1970 de gıhaşte 32,8%. Wê salê hejmarê cemawerên bajari yên herêma Hesekê gıhaşte 300 hezari, lê yên gundan gıhaşte 373 hezar mırovi. Lê hejmartına resmi nexıstın nav hesabê xwe bêhtır jı 150 hezar Kurd yên ku mafê hemwelatiyê wenda kırın lı gor "hejmara taybeti" ya xelkên Cezirê ku dı sala 1962 da derbaz bû.

Pêvajoka şênbûna hejmara xelkê berdewam mina xwe ma heta sala 1980. Angori hejmarên resmi, dı sala 1980 lı bajarê Hesekê nêziki 74 hezar mırov, lı Qamışli 93 hezar, lı Efrinê 20 hezar, lı Dêrıkê 14 hezar mırov dıjiyan. Pırosêntê zêdebûna danışmendanê bajarên Kurda jı sala 1970 heta 1980 gıhaşte 47,6 % - 51 %, lê lı Sûriyê gıştı gıhaşte 40,9 %.

Lı gor weşanên kurdi yên derveyi welat, jımarê Kurdan lı Şamê (Dımeşqê), sala 1980 bêhtıri 80 hezar mırovi bû, lê sala 1990 jımarê wan gıhaşte 170 hezari. Dıvê em bêjın, ku sedemên wê zêdebûna bêhemta ew bû, ku gelek Kurd jı herêmên kurdi yên Sûri lı paytextê hêwırin û zêdebûna sırûşti ya bılınd dı nav Kurdan da. Lı gor hejmara resmi jı 1980-1985 lı muhafeza Hesekê zêdeyi 700 hezar mırovi dıjıya, ango pêlûka 5 an dı Sûriyê da; pışti Şamê, Helebê, Hımsê û Hemayê. Eger em bêjın Kurd jı sedi dehê xelkê welat ın 10% wısa

Institut kurde de Paris

dıbe - ku sala1960 jımarê Kurd lı Sûriyê 450 hez mırov bû. Lê sala 1980 gıhaşt yek mılyon mırovi. Angori vê zêdebûnê, sala 2000 jımara Kurd lı Sûriyê wê bıbe 1,5 mılyon mırov.

Pıraniya Kurd lı Sûri gundi ne. Xanedan û bûrjûwaziyên gundan jı çina xudan zevi û axa nın. Dı navbera salên 1960-1980 gundiyên halxweş gelek zêde bûn. Karkerên warê sınet lı herêmên kurdi geleki zêde bûn, her wısa ji dı warên bazırganıyê û xızmetên mûnıtsipali da. Bûrjûvaziya şehrên kurdi hê hûr, orte bûn, lê yê hıneki mezın ji hebûn.

Karkerên Kurd lı ser rêka hesın, kargehên pêtrolê û karxanên dewletê û diwanên wê da dıxebıtın. Jımarê karkerên jar û rût lı bajaran berdewam zêde dıbe jı rex gundiyên bê zevi û hejar. Lı rohılat û bakurê Sûriyê Kurd lı kargehên petroli lı Qereçoxê, Rumêlanê, Suwêydiyê û Çıbisê kar dıkın. Dı salên 80an da, jımarê Kurdên ku lı Rûmêlanê dıxebıtin, dıghaşte 7 hezar mırovi. Gelek Kurd lı bajarên Dêra-Zorê, Reqê û Tabqê dıxebıtın. Lı Şamê jı warê xızmetên gıştı pêve, Kurd hê lı kargehên (nesic-cıl û caw) dıxebıtın. Lê lı pêş Kurdan, dı ditına kar da, astengên birokrati herdem hen ın, ew siyaset ji lı ser himê sıtemkariya netewi hatıye holê. Kurd lı gunda dı warê xızmeta aletên çandıni û çınınê da dıxebıtın.

Dı encama gorrinên cıvaki-abori da lı Sûriyê gorrinın wısa dı cıvata kurdi da ji peyda bûn. Sermiyan kete hemi warên jiyanê. Êdi awayên serpereştiya fêodali hêdi-hêdi mırın û bûrjûvaziya Kurd dı warê avakırınê, bazırganiyê û maliyê da peyda bû. Hevkariyek eşkera kete nav sermiyandarên Ereb û Kurd. Ev gorrinên goti, lı nav Kurdên Qamışli, Amudê, Dêrıkê, Kobanê, Efrinê û Helebê rûdan.

Lı Sûriyê pıraniya Kurdan musılmanên Sunni û Elewi ne, her wısa ji jımareki nepır hındık Êzdi ne. Dı salên 1980 an da jımarê Êzdiyan dıgihaşt 20 hezar kesi (pıraniya wan lı çıyayê

Institut kurde de Paris

Seman, Kurdaxê û lı çend gundên Cezirê dıjin).

Serdarên rûhi yên Kurdan; şêx ın, melle û feqih ın. Şexê teriqetê totelışka rûmetê ye dı warê olperestiyê da. Dı nav Kurdan da teriqetê "Neqşebendi" û lı dû wê "Qadıri" heri navdar û bı rûmet ın. Melle lı gundan bı daxwaza şêxan yan ji axan têne pıjırandın.

Cıvata Sûri mina neqşê mozayik e, jı grûpên etni û olperesti yên cûre-cûre. Lı gor nıvisinên zanayên Ewrûpa Rojava jımara wan grûpên goti dıghê 15 % lı Sûriyê. Lı her navçeyeke Sûri taifeke olperesti heye, ku dı nımûneyeke xwe ya tektenha da dıji. Peyrewê her taifekê, dı nav hev de, hevkari û yarmetiya hev dıkın. Musılmanti dinê 85% ê gelê Sûri ye. Baweriyên olperesti yên taifên Sûri jı hev cuda ne, lê hemi bawer dıkın bı canê pak û ewliya. Cemawer dıçın pirozgahan.

Qanûn lı Sûri qedexe dıke (rê nade) ku propaganda gellaci û fıtne dı nav taifeyên etni û olperesti da bêne kırın. Kêm caran, lı gor propaganda oli, ku jı derveyi Sûri dıjmın belav dıkın, hoyên ragıhandınê û rojnamê welat, weke bersıv, pırsên olperestiyê lı wan vedıgerinın, eger serokên welat wi tışti bı pêwısti bıbinın.

Rêberên sê ınqılabên Sûri, bı pirani Kurdê Sûriyê bûn, mina Husni-Zeim, Muhsın Berazi û Edib Çipekli. Jı bo parastına xwe Zeim û Çipekli zabıtên (efserên) Kurd lı dor xwe datanin. Dı demên van serokan da wezifên bılınd dıketın destê Kurdan. Dı pêlûkên leşkeri zû Kurd pêşve dıçûn. Pışti yekitiya Sûri û Mısrê sala 1958 politika dûrkırına mırovên Kurd jı pêlûkên efseri destpêkır.

Politika asimilekırınê, ku hukûmetê despêkır, rama xoybûna sırûşti ya Kurd lı Sûriyê xıste xelekê. Pêkanina hemi şertên pêwist bo assimilekırina êtnosan dı netewa erebi da,



Institut kurde de Paris

hê zû da dı programa Bees da hatıbû. Partiya Bees, hê dı sala 1947 da, eşkera gaziya xwe veweşandıbû bo "avakırına nıfşeki erebi taze dı welat da".

Dı bıryarên Bees da pırsa erebayetiyê hatıbû bınyad kırın "avakırına çandeke yekta bo netewa erebi û geşkırına", rêxıstınên cûre-cûre yên cıvaki, ku xebata wan lı gor prinsipên xızmeta idêolojiya erebi be. Bees dıgot, ku ewê "xebat bıke bo belavkırına rama erebi ya netewi dı warê idêoloji, politiki, abori, hunermendi û avayi da", dıji hemi dezga û navendênê ne erebi dı sıstema xwendın û perwerdekırınê da.

Nehatına navê Kurd dı van veweşanên Bees da, tenha "xelkên ne Ereb", ku ew ji hatiye zımên dı basa sogırandına mafê nıştımani û serbestıyên mırovi da, dıde xuyakırın, ku naveroka pırsê ew e: "Sûriya gereke bête jımartın çawa dewletek erebi "saf". Bı vi awayi erebizm û nasyonalizma erebi bı qeweta destûrê baweriya Bees dı pırsa netewi da sogırandın. Dı vi welatê pıretni da helwest pêkhatın, ku gazi weşandın bo yekitiya hemi taife û gelên welat û wervandına wan dı nav netewa erebi da.

Dı encama sıyaseteke wısa da cemawerê Kurd bı awaki efsûsane hatın êşandın. Payıza sala 1962, jı Kurdên Cezirê ra hejmareke "xususi" yan, weke tê bınavkırın "İSTİSNAİ" çêkırın ku bû sedemê bêparkırına 120 hezar Kurd jı mafê nıştimani lı Sûriyê, navê wan kesan kırın "ecanıb". Çendi ku pıraniya wan kesan lı ser xakê bav û kalên xwe hatıne dûnyê, jiyane û xebıtine beri ku Sûriya bıbe dewlet.

Hejmara resmi eşkere şaşiyên beloq û çewt xısıtın pırsê. Nivê endamên kulfeteki kırın Sûri, nivê di kırın ecnebi (biyani), bav û dayik, Sûri; zarokên wan "ecnebi". Ew mırovên ku kırın "ecnebi" jı mafên nıştımani bêpar man dı warên cıvaki, abori, sıyasi, pızişki, çandi da. Vê reng qedera çarenıvisê iro ji



Institut kurde de Paris

daye serpışta 200 hezar Kurd lı Sûriyê.

Sala 1963 Bees dest pêkır bı hılweşandına "planê avakırına, xwedêgıravê, İsraila dûwem, ku Kurdan dıxwest ava bıkın lı ser qada Cızirê" dı dimenê "Kurdıstana azad da". Lı herêma kurdi rêforma (ıslaha) zeviyan hukûmetê nekır û gellek gundiyên Kurd mane bê zevi û bê kar.

Hevaltiya Bees (ya Sûri û ya İraqi) serê xwe derxıst sala 1963, gava hêzên xwe yên çekdari xıstın hevkariya dıji şorışa Kurdıstana İraqê. Fırqa Yermûk -5 hezar nefer- û bı paşmêriya hêzên hewayi yên Sûri çû şer dıji serhıldana çekdari lı Kurdıstana Başûr, ewa ku dı êlûnê da despêkırıbû bı serokatiya Mustefa Berzani.

Dı pêvajoya dirokê da, carna hukûmeta Sûri hıneki politika xwe derheqa Kurdan de nerm dıkır. Dı dawiya sala 1971 da serokkomar Hafız Esed rê da, ku zeviya lı Kurdên Cızirê parvekın. Dı sala 1976 da Esed dı fermana xwe da bıryara Bees qedexekır, ew bıryara ku lı gor naveroka wê gerek bû Kurdan rakın jı herêma wan, da ku bıgıişti bıbe "*Kembera Erebi*" lı Cızirê, ya ku navê wê gorin û kırın "*kembera kesk*". Pışti van helwestên nû, Kurd hıneki bı aştiyê û hêmınıyê hesiyan. Kurd bûn endamê parlemanê (meclıs - Eşşeeb).

Bı awaki gışti, disa ji, pêvajoya çewsandına Kurd lı Sûriyê berdewam kır. Deshılatên Sûri, mina berê, napıjırinın ku pırseke kurdi lı Sûrıyê heye, lê hebûna wê lı İraqê, İranê û Tırkiyê qebûl dıkın. Paşmaweyên vê politikê gelek zıyanan dıghine Kurdê Sûri ji û yên welatên ciran ji.

Doza kurdi lı Sûriyê dıjwar dıbe, çunkê hûkûmeta Sûriyê ne Kurd û ne ji mafên wan lı Sûri napıjırine, ev jı aliki ve, jı aliyê di ve, bêrawestan hışyariya xwenasiya netewi û politiki dı nav Kurd da geş dıbe. Çı lı Sûri û çı lı herêma Rojhılata Navin tevi, û jıdandına daxwazê rêxıstınên politiki lı Sûriyê,

ku dıvên mafên gelê xwe yên netewi bı ci binın dı warên cıvaki, siyasi û kûltûri (çandi) da. Peydabûna rêxıstınên kurdi jı sala 1957 da, ferehbûna xebata siyasi ya kurdi naverokeke politiki taze xıste têkoşina kurdi jı bo mafên netewiyên wi lı Sûriyê. Bızava kurdi lı Sûriyê berevaji ya Kurdên Tırkiyê, İranê û İraqê bı awaki aşti pêş da dıçe. Xwesteka vê xebatê, bı awaki sereke, rakırına sıtemkariya netewi jı ser gelê Kurd lı Sûriyê. Bızava Kurd lı Sûrıyê çend qonaxê geşebûnê derbas kırın.

Qonaxa pêşin, jı 1945-1957: Dı vê qonaxê da gorinên nû, bı awayên xwe, dı cıvata kurdi da peyda bûn. Bı awaki roni pêvajoyên geşebûna bızava netewi pêvende bı ya kurdi lı Tırkiyê, İranê û İraqê. Xebata erebi ya azadixwaz û damezrandına hukûmetên erebi yên azad bûne, navtêdanın taze ku bızava Kurdan pêşda dan. Naveroka cıvaki-politiki û ramyari ya vê qonaxê ta pêlûkeke dıyar dı bın bandoriya serokên teqlidi-eşiri û oli da bûn (şêx, axa, beg, û paşa), ew kesên ku bir û baweriyên wan ne herdem dıgunciyan lı gor demê. Dı ronahiya rewşeke wısa da, helbet zemin peyda bû bo avakırına Partiya Dêmoqrata Kurd lı Sûriyê. Bêguman dı pêşewaya wê xebata nû da xwenda û rewşenbirên Kurd ketın rê, sloganên netewi hıldan, ewên ku gazi dıkırın bo xebata lı pê navê parastına nasnameya netewi ya Kurd û rêkûpêkkırına xebat û bızava Kurdên Sûriyê. Dı meydana hışyarkırına gelê Kurd da (dı politikê û xwenasiya netewi da) roleke balkêş hebû ya van mırovên ku em navên wan lı jêr berpav dıkın: Cegerxwin, Osman Sebri, Celadet Ali Bedırxan, Kamuran Ali Bedırxan, Ahmed Nami, Mella Hesen Kurd, Ahmed Nafiz û bırayê wi Nûreddin Zaza û diger.

Dı sala 1940 Kurdên Sûriyê dıbıstanê xwe vekırın û zarokên Kurdan bı zımanê xwe edebıyat xwendın. Yaneyên çan-

Institut kurde de Paris

dê, sportê û yên xêrxwaziyê kurdi pêkhatın. Hışyariya netewi ya Kurdên Sûriyê hê xurtır bû, dı bın bandoriya xebata politiki ya bırayên wan lı İraqê û İranê. Dı bın bandoriya komara Mehabad da xwendekarên Kurd lı Qamişliyê "komela xwendekar û cıwanên Kurdên dêmokrat" organize kırın. Wê komelê xebata rewşenbiri dı nav karker û cotkarên Kurd da dıkır. Rencdaranê Kurd hevalti û pıştgıriya rama xebata politiki kırın jı bo bı cianina mafên netewi, damezrandına komelên kar, mina (karkerên karxanên cıl û caw). Wê demê karkerên Kurd doza xwe ya çini û netewi anine holê. Çawa rojnama "El-Heyat" ya El-Parti, ku lı Sûriyê derdıkeve, nıvisibû "xebata wê komelê bû dimeneke hêja yê yekitiya netewi".

Heta nêva salên 1950 rewşenbirên Kurd, bı awaki nehini dıxebıtin da ku bı awayeki grûpên bela-wela yên çalak bıxın yek partiyeke siyasi a kurdi. Dı vi wari da rola heri xurt ya Osman Sebri, Hemid Derwêş, Cegerxwin, Nûreddin Zaza û Reşid Hemo bû. Dı encama wê xebatê da, havina sala 1957 kongreya avakırına "Partiya Dêmokrata Kurd, PDK" lı Sûriyê pêkhat. Dı vê partiyê da bûne yek "Bızava nıştımanperwerên Kurd", "komita çalaki û têkoşerên Kurd" û "Kurdên markısi" -kesên ku jı partiya komûnıstên Sûriyê derketıbûn-. PDK dı bın bandoriya PDK (İraqê) da heta demekê xwe dıdit. Çunke rola hın hevalên partiya Kurdıstana İraqê hebû dı avakırına PDK ya Sûriyê. PDK lı Sûriyê; partıyek netewi gışti bû. Çunke jı hemi grûp û çinên cıvaki dı nav rêzên xebat û têkoşinên wê da heval hebûn. Lê neyeksatiya çini û interêsên abori hêdi-hedi bûn sedemê dıjberi û perçebûna PDK-Sûriya û hılweşina yekitiya organizasyon dı nav bızava Kurd da.

Programa Parti sıloganek hılda "azadi û yekbûna Kurdıstan" û "serbestiya politiki", lê jı vi sılogana xwe zû-zû daket, çawa sıloganeke ne rêal û ne ya hola xebata PDK (lı Sûriyê). Ar-

Institut kurde de Paris

manca PDK, otonomi û mafên çandê jı bo Kurdên Sûriyê bû. Sala 1960 navê parti bû PDKS. Peyva Sûriyê lê zêde bû.

Qonaxa duwem; Hatnaskırın, çawa qonaxa dubendiyê, goya "çep", û "rast", çendi hêzên "rast" bêhtır nerm û objêktıv bûn dı hemi sılogan û awayên xebatê da, û "çep" bêhtır "rexperest bûn" û " ... zêde markısi-lênini bûn". Dı nav herdû şeripana da ji hê grûpên xudan rêçıkên ramyari yên cawaz hebûn.

Bıli faktorên navxweyi, bızava Kurd lı Sûriyê hê dıkete bın bandoriya rewşa bûyerên welatên Ereban û her wısa ji bûyerên bızava Kurd jı derveyi Sûriyê.

Dı sıbata 1958 Mısrê û Sûriyê yekitiya xwe çêkırın. Lê dı meha adarê 1958 da qanûna qedexekırına hemi partiyên sıyasi derket. Helbet PDKS ji kete ber hukmê wê qanûnê. Dezgayên Sûriyê dıtırsin, ku Kurdê Sûriyê hewedariya şorışa temuzê bıkın, ya dıji rêjimê meleki lı İraqê bû dı sala 1958, çunke rêjima nû ya Bexdadê rê da penaberên Kurd bı serokayeti ya Mustefa Berzani vegerın welatê xwe. Dı rewşeke wısa da, rêjimê Sûriyê xwest xetera bızava kurdi nehêle. Lewra ji ew bızav kete nehıniyeke kûr.

Lı Şamê sala 1963 serokê polisê muhafeza Cızirê Muhemed Teleb Hilal, pırtukek derxıst bı nav "Lêkolineke muhafeza Cızirê jı aliyên netewi, cıvaki û sıyasi ve. Weke aferinê jê re, pışti çapkırına pırtûka wi, hukûmetê ew kır Muhafızê Hemayê. Demekê şunda M. T. Hilal bû wezirê temwinê dı hukûmeta Zûêyin da. Dı wê wezifê da ma pışti Zûêyın ji. Ew pırtûka wi dagırtıye jı rûhê dıji kurdayetiyê. Gelek bir û baweriyên wi, ku dı pırtûka wi da hatıne nıvisandın, faşısti û nıjadperestiyeke eşkere dıyar dıkın. M. T. Hilal dıbêje ku ne dirok, ne zıman, ne çanda Kurdan nin ın, û heta esleki wan yê etni ji tune. Tenha Kurd jı xırabiyê û zordariyê ra jêhati ne.

Institut Kurde de Paris

Ev gotınên pûç û vi eqlê çewt wısa kırın, ku Hilal Kurd dı ditına xwe da kırın barûtên ku lı ser hesabê gelên dor xwe dijin. Lê ser bıngehê van baweriyên faşısti, Hilal planeke tam pêşneyari hukumeta Sûri kır, lıgor wi plani gerek bû pırsa Kurdi jı jina Sûriyê bıyekcarê hılata.

Xalên himi yên wi planê Hilal ev bûn:

1. Koçkırın, qewıtandın û guhestına warên Kurdan.

2. Gırtına dergahên xwendınê lı pêş zarûkên Kurd.

3. Gırtına dergehên kar û xebatê lı ber Kurdan.

4. Kurdên ku pıştı şıkestına şorışên Kurdıstana bakûr revin Sûri, wan tevan lı Tırkiyê vegerinın.

5. Fıtnê û gelaciyê têxın nav Kurdan, lı gor pırinsipê: "jı hev bela bıke û hukum bıke".

6. Bıcianina kembera erebi, ku sala 1962 destpê bûye.

7. Bıcianina politika kolonyalizmê, guhastına êl û eşirên erebi yên esil bo herêma kurdi.

8. Hêzên leşkeri (çekdar) têxın herêma kembera erebi jı bo ku hemû tevdıran bısogırine dı warê koçkırına Kurdan jı cıyê wan bo navçeyên erebi.

9. Dagırmanên komelane jı Ereban ra avabıbın dıgel hinkırına wan dı warê leşkeri da.

10. Qedexekırına beşdariyê dı hılbıjartınê da û xwe pêşnıyarkırın bo hılbıjartınê jı wan kesan re, ku zımanê erebi nızanın.

11. Şêx û melayên Kurd bêne guhastın bo herêmên erebi, û ruhaniyên Ereb bêtın dewsa wan.

12. Dı nav eşirên erebi da propagandeke fıreh bıbe û wan perwerde bıkın bı rama dıji Kurdan.

Lê cenga sala 1967 ku dı nav Ereb û İsrail da pejıqi, bû sedemê wê yekê, ku hukûmeta Sûri jı neçari çend bendên pırojeya M. T. Hilal bı ci neanin. Kurd mina Ereba xızmeta leşkeriyê mecbûr ın bıkın û bıkevın cengên bergıriya Sûriyê; wek "eniya Colan", lê eynê demê da ji sıtembar û tawanbar dıbın bı dıjitiya netewa erebi, û dıkevın zındana. Çendan car endamê PDKS hatın gırtın û ışkence bûn.

Perçebûna sala 1964 an ya ku kete rêzên PDK (İraq) bû sedemê perçebûna PDKS. Û ta nuha hê ew perçebûn berdewam e û fırehtır bû.

Dı encamê da, ew dılgermiya cemaweri ya Kurd û dagerandına bı ali xebatê ve pışti ku PDK pêkhat, wekû yekemin partiya Kurd lı Sûriyê dı salên 1950 da, jı berê ve sıst bû pışti sala 1965 û bê hêviti kete nav cemawerên Kurd. Dı praktikê da perçebûna xebata Kurdên Sûriyê awayê organize wergırt, gava 5 abê 1965 "Çepan" kongreya xwe kırın û bıryar dı wê kongrê da dan bı damezrandına "Partiya Demokrata Çepa Kurd lı Sûriyê" (PDÇKS). Wê kongrê daxuyaniyek derxıst, goya "parti perçe bû lı ser bınyadeke idêoloji dı nav du şeripana da."

Pışti 15 sala, Sallah Bedreddın jı rojnama El-İntifad ya Mısri ra dı hevpevinekê da got. "Dema me ´sılogana çepiti´ dı bızava netewi ya kurdi da hılda, me bı xwe hê mebesta çepitiyê xweş fêmnedıkır´ encumena rêdaksıyonê".

Bı vi awayi em dıkarın bêjın, ku jı sala 1965 da, lı Sûriyê du partiyên Kurdên nehini xebata politiki dıkırın: PDKS, Sêkrêtêrê wê Hemid Derwêş bû û yê PDKÇS ji S. Bedreddın.

Perçebûna partiya Kurd lı Sûriyê bı partiya Kurd ya Kurdıstana İraqê ne xweş hat. Lewra ji, sala 1971 lı Kurdıstana İraqê kadırên herdû şeripana (çep û rast) konfıransek bestin,

Institut kurde de Paris

bı wê hêviyê, ku yekitiya wan çêbıbe. Pêşnıyara Mustefa Berzani derheqa yekitiya herdû partiya da konfıransê pıjırand. Lê pêvajoya yekıtiyê demek dırêj nekêşa. Komita weqti, ku serpereştiya yekitiyê dıkır, hew di, ku her sekrêtêreki serxwebûna partiya xwe eşkera kır. Pêwist e em bêjın, ku rêberên PDKÇS dıgot: "em peyrewê ramyariyê marksizmêleninizmê ne". Ev yek bû sedemê wê helwesta hukûmeta Sûriyê, ku S. Bedreddin hejmart dı nav rêzên "mırovên xeter" da. Demeke dırêj nekışand PDKÇS bû dû parçe. Şeripaneki dıxwest ku xebata parti lı hundurê Sûriyê berdewem be heta Sûriya dıbe dewleteke demokrat û sosyalist. Lê pıraniya endamên bersıvdar bı xurti xwe dıkışandın ber bı rêjimê Beesa İraqê va.

Hemi partiyên Kurd lı Sûriyê (bı çep û rastên xwe va) nekarin dı nav xwe û partiya komunist hevkari û dostaniyê peyda bıkın. Çunke komparti lı doza Kurd qet nedıbû xwedi. Pışti ku Hafız Esed hate ser hukum, rewş hıneki hate guhertın. Sala 1972 eniya niştımani ya Sûriyê hate damezrandın û partiya komunist bû endamê wê eniyê. Kengi sekretêrê gıştiyê Bees yê yarmetdar Abdalla El-Ahmer eşkere got, ku em pıştgıriya xebata Kurd lı İraqê dıkın, hıngi, jı nû ve, partiya komunısta Sûriyê dane xuyakırın, ku pırsa gelê Kurd "pêwist e em berê xwe bıdınê ne pışta xwe". Jı wısa bêhtır komparti nedıkarıbû bêje, çunke lı gor benda eniya nıştımani, mafê komparti hebû rexnê xwe û xwestekê xwe, yên ku ne wek yê Bees bana, tenha dı cıvinê nav xwe û Bees da bêje, lê ne dı hoyên ragıhandınê da. Komunıstên endamên parlemana Sûri lı ber hukumetê pırs danin, ku pêwist e diskriminasyona Kurdan lı Cızirê bête hıldan, mina (Kembera Erebi û encamên hejmarê). Hın tıştên bıçûk dı vi wari da hatın pıjırandın (kar, xwendın û dabeşkırına zeviyan lı ser gundiyên Kurd; bı awaki

Institut kurde de Paris

ci-ci). Pırs wa lê hat, ku hın endamên partiya Bees lı muhafeza û mentiqa û şaxên eniya nıştımani û nıqabê karker û cotkaran daxwaz kırın, ku ew qanûnên hukûmeta kevn, yên diskriminasyona Kurda kırıne, gereke qedexe bıbın, neminın.[2]

Dıgel wısa ji helwesta komparti û partiyên kurdi, yên netewi, dı pırsa mafên Kurd da dûri hev bûn. Eger Kurdan dıxwest, ku qanûn mafên wan bıpıjirine dı warên çandê, abori, cıvaki û siyasi da, kompartiya Sûri, heta sala 1970 pırsa kurdi jı xwe ra nedıkır armanc. Belki carna, ku jê hatıbe xwestın, komparti tenha mafê nıştımani û çandê jı Kurdê Sûriyê ra pıjırandıyê. Bı awaki gışti kompartiya Sûriyê jı Kurdan dıxwest, ku pıştgıriya Bees û hevkariya wê bıkın bı wê nêtê, goya Bees wê bıbe partiyeke çep, pêşverû û wê mafê cıvaki û doza netewi ya gelê Kurd bıpıjırine.

Jı sala1972 xebata Kurd lı Sûriyê kete qonaxeke nû. Komita seroktiya muweqet (demi) xwe dıyar kır mina partiya Kurd ya heri rast û hevalbendê PDK İraqê. Navê partiya nû bı kurti kırın "El- Parti". Hêzên çep bûne parçe-parçe. Heta sala1980 gelek parti bı navê marksizmê-leninizmê xwe pêşan dıdan. Sala 1980 partiya Kurd ya Demokrata Çep lı Sûriyê navê xwe jı PKDÇS kıre Partiya Hevgırtına gel ya Kurd lı Sûri (PHGKS), û mina pêşin lı ser baweriyê marksizm-lêninizmê ma. Hêzên ku têkeli dıgel vê partiyê dıkırın PKK (Turkiyê), DPK (İran), El -Parti (Sûriye). PSK (İraq), Kuk (Tırkiye) û yên mayin. Her wısa ji PHGKS têkeli dı nav xwe û kompartiya İraqê da ji peyda kırıbû lı ser himê hevaltiya bı Beesê İraqê û Yekitiyê Sovyêtê ra.

Dı nivê salên 80 da lı Sûriyê nêziki 10 grûp û partiyên kurdi xebateke nehini û niv eşkere dıkırın. Xebata hemiya ne ewqas dûri ditına emnê Sûriyê bû. Gelek rêberên partiyên Kurd gaziya yekitiyê û hevkariyê dıkırın dı çarçıva eni û hevalbendi-

Institut kurde de Paris

yê da.

Jı bo ku rewşa parçe bûnê nemine û awayek jı hevkariyê dı nav Kurdan da peyda bıbe, jı adara 1985 heta Adara 1986 rêzek cıvin û pêvendiya dı nav partiyên Kurdên Sûri da derbas bûn (PHGKS, El-Parti û PDKÇS). Dı adara sala 1986 van partiya "Benda Dêmokratiya Kurd" (BDKS) lı Suriyê ava kırın. Vê Bendê programa xwe ji neweşand. Lı gor van bınyata "Encumena Berza Benda Kurdi" lı Sûriyê pêkhat. Jı her partiyekê endam du mırov ketın wê encumenê. Rojnama "El-tehalûf" bû zıman halê vê Bendê. Borca vê rojnamê; ragıhandına bir û baweriyên ne dıji programa politiki ya BDKS.

Hemi partiyên Kurd, ku xebat dıkırın jı bo pêkanina mafên netewi yên Kurd, bı pêwesti dıditın, ku yekıtiya xakê Sûriyê gerek parasti be, têkiliyên bırati dı nav Ereb û Kurdan da gereke geş û şên bıbın. Bı pıraniya xwe, Kurd dıbinın, ku dı dema H. Esed da hınek nermayi ketiye politika Sûriyê dı pırsa kurdi da, lê sıtemkariya netewi hê berdewam e û bı taybeti dı warê perwerdayetiyê. Nıwênerê gelê Kurd bı awaki resmi dı dezgahên fermi da, heta dı parlemana Sûri da, çendi ku Kurd bêhtıri 10 kesa bûn ji. Jı sala 1980 vır da, Kurd bı serbesti cejna xwe ya netewi "Newroz" piroz dıkın. Gelek caran dı ahengên Newrozê da Kurd, komunıst û endamên Bees lı herêmên kurdi bıhev re şahiyê dıkın.

Helwesta hukumeta Sûri dı doza kurdi da çı lı Sûri û çı lı İraqê û Tırkıyê çarçıv dıbe lıgor karaktêr (sırûşta) pêwendiyên navnetewi dı herema Rojhılata Navin û Nêz da. Dı sala 1963 da Şamê yarmeti da rêjimê Bexdadê bı hêviya perçıqandına şorışa kurdi. Lê dı sala 1970-80 û destpêka salên 1990 rewş berevaji bû: Şamê yarmeti dıda Kurdên İraqê. Baregehên Kurdên penaber jı İraqê û Tırkiyê, lı Şamê damezrin. Jı xakê Sûri hêzên pêşmerge çalakiyên xwe yên çekdari dıji

Institut kurde de Paris

İraq û Tırkiyê dıkırın. Dı abê sala 1971 kongreya netewi-gıştî ya Bees bıryar eşkere da bı pejırandına mafê gelê Kurd lı Kurdıstana İraqê dı otonomıyê da û wekhevi ya Kurd û Ereban.

Dema ku Bexdadê dı sala 1970 bıryar da bı pejırandına otonomiya Kurd, Şamê sala 1971 bıryar da ku zeviyên jı ber rêformên (ıslahê) mabûn lı Kurdan belabıke, çendi ku berê parvekırına wısa qedexe kırıbû. Dema Bexdadê sala 1974 otonomiya Kurdıstan eşkere kır, Şamê sala 1975 çend mırovên Kurd kırın endamê parlamana Sûri; çendi ne bınavê nıwênerên Kurd bûn.

Lı gor gorınên rewşa politiki dı navbera Şamê û Bexdadê da taktikên Sûriyê dı peywendıyên bı Partiya Dêmokrata Kurdıstanê ra PDK (İraq) dıhatın guhertın.

Helwesta dıjayetiya dıjwar dı heqê PDK (İraq) da Sûriya û İraqê dıyar kırın dı sala 1963, gava lı herdû dewletan partiya Bees hukum xıste destên xwe.

Hınga herdû partiya zû helwesta xwe kırın yek bı hêviya ku bı hevra serhıldana çekdari ya Kurdıstana İraqê bıperçıqinın. Lê rewş zû hate guhertın, dı mıjdara -november- sala 1963 ınqilaba dıji Bees ku lı Bexdadê serkevt, bû sedemê wê yekê, ku Şam, helwesta derheqa PDK-İraqê bıguhêre. Kurd dı hesabê wê da bûn mina hevalê xebata dıji "nasıriyên Bexdadê". Paş herıfandına serhıldana Kurdên İraqê sala1975 deshelatên Sûriyê rê dan hevalên Celal Talabani baregahên xwe lı Sûriyê çêkın, nemaze lı hêlên nêzi sinorê İraqê, ku jı wır pêşmerge dıkarıbûn êrişa bıbın İraqê. Lı Şamê, sala 1976 daxuyaniya damezrandına Yekitiya Nıştımanê Kurdıstan derket. Liderê wê bû Celal Talabani. Dı YNK da; "Komele" (çeprahbû), "Bızûtneweya Sosyalısta Kurdıstanê" û "Şeripana Fereh" bûn yek. Mayina Celal Talabani lı Şamê, hebûna baregaha YNK lı wır bûn sedemê bandorıya Celal bı awaki kûr lı ser hemi

Institut kurde de Paris

hêzên Kurdê Sûriyê, bêhtır lı yên bı Sûriyê ve bûn. Hê dı gulana 1976 pêşmergên YNK, êdi pelamar û êriş dıbırın ser leşkerên Bexdadê û bı pesendên Sûriyê.

Dı eynê demê da deshelatên Sûri rê dane encûmena amadekar ya PDK, ku baregahên xwe lı Şamê vekın. Sala 1979 Resûl Mamend û komiteya amadekar yekitiya xwe dıyar kırın û sala 1981 daxuyaniya damezrandına Partiya Sosyalista Kurdıstanê PSK (İraq) derweşandın. Bı vi awayi lı Şamê û bı razibûna hukmê Sûri hevkariya opozisyona Kurdên İraqê pêkhat.

Dı tebaxa 1977 da, lı Şamê "Partiya Sosyalista Kurdê Sûriyê" (PSKS) helquli. Ew kete nav hêzên dıji rêjıma İraqê, û hevkariya serhıldana Kurdên başûr dıkır, nemaze YNK.

Dı warê bıhêzkırına xebatê da, ya dıji rêjima İraqi, Dımeşqê pêwendiyên xwe xurt kırın bı Partiya Dêmokrata Kurdıstana İraqê ra, û dıgel vê yekê ji, pêwendiyên xwe bı opozisyona Iraqi - (ya kurdi û Şii) ra damezrandın bı rezamendiya serok H. Esed.

Jı destpêka cenga İlûna 1980 ya İraq-İranê lı Şamê baweri peyda bû, ku hukûmeta Seddam wê zû bıherıfe.

Dı temûza sala 1981 lı Dımeşqê "Eniya opozisyona İraqi" jı hêzên şorişgêr, islami û netewi yên İraqi pêkhat. Vê eniyê eşkere slogana hılweşandına Seddam Huseyn û avakırına İraqeke dêmokratik hılda, ku mafên netewi yên gelê Kurd bısogirine "Otonomiya rasteqine bo Kurd". Waşington Post nıvisi, ku Sûriya û İran lı pışt vê eniyê ne. Hêza heri berçav ya partiya Dêmokrata Kurdıstan bû. Pışt re YNK û PSK (R. Mamend). Lı gor ku rojnamê nivisi bû, jımara opozisyona Beesiyan ne wıqas mezın bû, lê Dımeşqê pıştgıriya wan dıkır dı "duberiya xwe ya berdewam bı Beesê İraqi ra".[3] Peywen-

Institut kurde de Paris

diyên vê eniyê bı komari ya İraqi ra hebûn. Dıjitiya navbera YNK û eniyê hın bandoriyek nêgativ lı planê Şamê dıkır. Dı warê dıjıtiya rêjima S. Huseyn, Sûri û İran û Kurd gıhan armanceke navpar. Deselatên Sûri karin vê paşiyê Erebiya Sûûdi razi bıkın, ku yarmetiyê nedın Saddam, helwesta Erebiya Sûûdi hevalbendiya İran û Sûriyê hê xurttır kır - lı gor baweriya "Waşington Post".[4]

Bı vi awayi, bı saya helwesta Sûriyê, bızava çekdar ya vê eniyê, ku Kurd bûn, dı salên 80 da êrişên çekdari yên xurt dıbırın ser leşkerên İraqê. Hê jı sala 1983 da êrişên Kurdan dı rêça Haci-Omran û Zaxo ra dıghan hundurê welat, bı taybeti herêmên Rewanduz û Amêdiyê. Dı eynê demê de êrişên pêşmerga dıghaştın herêma Helebçe-Sulêymaniyê.

Dı sersala 1983 da hevditınek çêbû dı navbera Saddam û Celal Talabani da. Talabani çû guftûgoyan bêy ku bı hêzên Kurdên mayin bışêwıre. Lema ji opozisyona Kurdıstani ew karê Talabani hesıbandın, mina kareki nêgativ û çarpekırına rêzên têkoşinê. Deselatên hukûmeta Saddam hawar dıkırın, ku gereke doza kurdi çareser bıbe û berjewendiya Kurd û Ereban herduyan wısa dıxwaze, lê ew tev dırew û tektik bûn.

Pıştì hılweşandına guftûgoyan dı nav Talabani û Saddam da, wezirê derveyê İraqê T. Eziz got; "Celal Talabani bendên lıhevhatınê bı ci nanin". Talabani jı ali xwe va hukûmeta İraqi tawanbar kır û go, *lema ji mın guftûgo bırrin.*[5]

Jı raporta encumena sênatorên kongrêsa Amêriki ya karûbarên derve dıhate xuya kırın, ku Saddam kete wan guftûgoyan daku rê nede fırehbûneke mezın û xeter lı Kurdıstana İraqê dest pêbıke dı rewşa nêzikiya navbera YNK û PDK (İraq). Lê YNK kete wan guftûgoyan, bı hêviya ku Bexdad wê hıneki xwe sıst bıke û 30% jı hatınên nefta Kerkûkê wê

Institut kurde de Paris

bıde Kurdıstanê. Dı dema guftûgoyan da, bı rasti ji çalakiyên pêşmergên YNK gelleki sıst bûn. Lê hılweşina guftûgoyan hevkariya PDK (İraq), YNK û İran deha xurt bû. Û ew eynê daxwaza hukûmeta Sûri bû.[6]

Bı vi awayi "hevkariya" Dımeşq û Tehranê bı objêktivi hêzên bızava opozisyona Kurd dıji İraqê xurt kır. Lê helbet eşkere bû ku jı "hevkariyê" her yek (İran, Sûriya û Kurd) berjewendiya xwe dıparêze. Dı daxuyaniyên YNK û PDK (İraq) van herdû partiyan hewedariya politika Sûriyê dı herêmê da dıkırın. Dema S. A. Xamaney bû mêvanê Şamê, opozisyona kurdi bı baweri gotın ku hevkariya İran û Sûriyê bandoriyeke pozitiv lı xebata dıji rêjima Saddam kır.[7]

Serokê komara Sûriyê Hafız Esed bı xwe balkêşi opozisyona iraqi û bı taybeti ya kurdi dıkır. Çendan car bı wan ra hevpeyvin dıkırın. 26 oktoberê 1984 Esed, bı liderên "Eniya Dêmokrata Nıştımani ya İraqi" (END) ra rûnışt, mina serokê PDK Mesûd Berzani, serokê Partiya Sosyalısta Kurdıstan (İraq) PSK Resûl Mamend û endamên encumena sıyasi ya kompartiya İraqê. Rojnama "*Rêça Azadiyê*" zımanhalê PSK nıvisand: "...serok Hafêz Esed ne tene balkêşiya xwe, lê pıjırandına xwe dıyar kır derheqa armanca tevgera dêmokrati lı İraqê - "Herfandına rêjimê İraqi". Jı ali xwe da END bı buhagırani nerıxand yarmetiya H. Esed bo hêzên İraqê yên nıştımanperwer, ewên ku xebat dıkın bo hılweşandına rêjimê diktatorê İraqê, vegera İraq bo rêza welatên erebi û bızava azadixwaza gelên Ereb". Dı wê cıvinê da jı nuwênerên END ra hate gotın, ku dıvê bı zûtırin wext ferehtırin cebhe durust bıbe, da ku ev xebat bıhêztır bıbe. Dimeşqê lı nêzikiya nav partiyên Kurdıstana İraqê, hevkariya wan dı END da temaşe dıkır mina "alikariyeke kurdi dı xebata gıştı lı dıji rêjima İraqê".[8]

Institut kurde de Paris

Dı dawiya sala 1984 ev eni fırehtır bû pışti ku endamên taze lê zêdebûn, mina Partiya Gel ya Dêmokratıye Kurdıstani (PGDK) û du rêxıstınên İraqi ne pır mezın; Partiya Sosyalısta İraqi (PSİ) û Komela Dêmokrati ya İraqi (KDİ).

Dı meha 3 sala 1985 cıvinek organize bû dı navbera cigırê serokê Partiya Beesa Sûriyê Ebdella El-Ehmer û liderê PSK Resûl Mamend da. Herdû aliyên hevbininê xwestın û hêviyên xwe dıyarkırın, ku pêwist e "hevkari berdewam bıbe" lı pê navê rûxandına "rêjimê İraqi yê noker".[9]

Dı meha 5 sala1988 eniya yekgırti ya Kurdıstana Başûr pêkhat, ew bû mina nişana kutasiya pêvajoya nêzikiyê dı navbera PDK û YNK û hezên mayin yê opozisyona İraqê. Lê ev bûyer kete holê dı wê demê da, gava ku dı cenga İran-İraqê da terazûya cengê bû lı aliyê İraqê. Lewra ji hêviyên ku berê dani bûn ser eniyeke wısa, hıneki sıstbûn jı herdû aliyên eniyê.[10]

Kovara "Midl İst" nişan dabû, ku Kurdan herdem dızanin, weki cenga İran-İraq raweste, wê leşkerê İraqê bı wehşitiyeke nayab lı Kurdıstan şer berdewam bıke.[11] (Û rasti ji pışti ku şer dı nav herdu dewleta da nema, cihan bû temaşevanê jênosideke bê hemta dıji gelê Kurd lı İraq û lı İranê. -Wergêr-). Dı 2. 8. 1988 da Sûriye jı raya navnetewi xwest, ku cezaki heri sert û jandar dıji hukûmeta İraqê bête kırın. Dimeşqê dı têlêvizyonê da film pêşandan, ku bı awaki dokûment bûyera Helebçê dıyar dıkır. E. El-Ehmer dı nişandana xwe da got ku Saddam Husên bı "êrişa çekên kimyawi nêta xwe eşkere kıriye, weki ew dıxwaze Kurdan lı bakurê İraqê qır bıke bı awayên hoviti". Dı meha 9 sala 1988 da lı Şamê 20 organize û partiyên pêşverû û azadixwaz yên welatên erebi cıvinek kırın û bıryar dan, ku siyaseta rêjima İraqê derheqa Kurd da "gênosideke rasteqine ye".[12]

Pışti kutasiya cenga İran û İraqê bersıvdarên Sûriyê alikariya xwe berdewam kırın jı Kurd û opozisyona erebi re dıji rêjimê Bexdadê. Hoyên ragıhandınên cemaweri lı Sûriyê herdem nûçeyên xebata wan bı awaki fıreh belav dıkırın û hevbininên serokên Sûri û liderên Kurdên İraqê (Mesûd Berzani, Celal Talabani, Resûl Mamend û Sami Ebdurrehman) pesınde dıkırın. Herdû alıyan, dıditın ku, ne tenha armancên wan yek ın, lê bı hêzkırına eniya anti-Saddam ji berjewendiya wan e. Bı gışti 17 organize û partiyên sıyasi lı Şamê xebata politiki dıji Saddam berdewam dıkırın.

Dı dawiya salên 1980, melikê Ûrdun û kurê melikê Erebiya Sûûdi, Ebdulla, xwestın dı nav Sûriyê û İraqê de lıhevaninekê çêkın. Lı baregeheke leşkeri-hewayi ya Ûrdûn cıvinek pêkhat bı beşdarıya Esed û Saddam. Agahdariyek jı cıvinê veweşandın tê da hatıbû gotın, ku İraq û Sûriya yekser destê yarmetıyê jı opozisyonên hev û ji Kurdan vedıkêşın. Kurd bı awaki gışti nıkarın pışta xwe bı xurti gırêdın bı wan dewletên ku Kurdıstan lıhev behr kırıne. Lewra ji, encamên wê cıvina Ûrdun lı nık Kurdan, eger ne dıhatın pıjırandın ji, lê ne ecêb bûn. Çunke, bı awaki gışti dı hevkarıyan da Kurd û hukûmetên herêmê ji, her yek berjewendıya xwe dıparêze.

Jı destpêka krizê ya Kuwêytê, dema ku leşkerê İraqê dı meha tebaxa 1990 kete vê dewletê, Şamê û opozisyona İraqê ji hêviyê xwe xurt kırın, ku jı nêzik wê rêjimê Bexdadê hılweşe. Tışteki sırûşti bû, ku dema leşkerê navnetewi ketın cenga dıji Saddam, hêzên kurdi û Şiiyan hêvi dıkırın ku gorinın pozitiv bıkevın welat.

Gaziya ku WEY (USA) kırıbû ku cemawerên İraqê dıji Saddam rabın, bê meded ma. Ne tenê wısa ji, jı tırsa bıhêzbûna hukmê şiiyan, hukûmeta Emeriki, Kurdên ku êdi Kurdıstan azad kırıbûn ji, lı pêşberê rêjimê wehşi yê İraqê destevala

Institut kurde de Paris

hıştın. Rojnameya emêriki "intêrnêyşnl hêrald tribûn" 5 nisan sala 1991 da nıvisi "Bûş sozên xwe bı ci nanin, alikariya opozisyonê nekır. Lewra ji leşkerê İraqê pışta wan şkenand". "Ev xıyaneta derheqa gelê Kurd ya hemi dewletên hevra bû dı cenga dıji rêjimê Saddam de".

Dêmek disan hêviyên Sûriyê û Şiiyan, wısa ji yê Kurdan dı hılweşina rêjima Saddam da bı ci nehatın. Hê zêdetır, dı pêvajoya çalakiyên opozisyonê da Kurda dit, ku Şii dawa hukum dıkın û hiç baweriya wan bı doza gelê Kurd nin e. Vê rewşê wısa kır, Kurd berê xwe jı neçari bıdın rêjimê Bexdadê. 7 gulanê 1991 dêlêgasiya Kurd, bı serokatiya Mesûd Barzani dıgel Saddam cıviyan. S. Husên wısa ji dıgel C. Talabani ji rûnıştın. Jı rex İraqê, dı guftûgoyan da, Tarıq Eziz, İzzat İbrahim û Eli Hesen Mecid beşdar bûn. Penaberên Kurd jı İran û Tırkiyê vegeriyan. 23.6.1991 Mesûd Berzani lı Bexdadê nişanda, go me û hukûmeta İraqi lıhev kır, ku hılbıjartınê parlamentê lı Kurdıstanê bıbın bı beşdariya PDK û YNK. Lê ew hêvi ji neçûn seri. Herdû teref jı hev dûrketın.

Dı pêwendiyên navdewleti da, yên Rojhılata Nêz û Navin bandoriya çalakiyên Sûriyê eşkere xuyadıbûn dı warê bıkaranina faktorê kurdi dı têkeleyên xwe û Anqerê da, lema ciyeki taybeti da rola PKK. Baregeha vê partiyê lı Şamê heye. Bandoriya wê xurt e lı Kurdıstana Bakûr. Wê barê xebata çekdari. Kurdıstana Bakûr hıldaye ser mılê xwe. Bıl jı kampên ku lı Sûriyê hene, çekdarên PKK lı kampên Lubnanê -Bıqaê-Hemrê, Merçê û Eynıl-Eynê, hin dıbın.

Çalakiyên çekdari yên PKK dıbın sedemên xwin rıjandınê dı wılayetên Başûr-Rojhılatê Tırkiyê da, bı taybeti gelek dıbın qurban dı nav "nahtorên gundan" da. Ew gundiyên ku ne bı xwesteka xwe bûne alikarê dewletê jı bo parastına gundên xwe. Bı navê xebata dıji PKK hukûmeta Tırk, leşker, koman-

Institut kurde de Paris

dos, polis û hemi aliyatên cengê, heta hêlikopter û fırokên bombardûman bıkartine dı wêrankırına Kurdıstana Bakûr da.

Tışteki balkêş e, ku çendi deshelatên Sûriyê derheqa çalakiyên PKK da lı dıji Tırkiyê nerm ın ji, lê herdû dewlet peymanên hevkariyê dı parastına hêmıniya xwe da dıji Kurd dıpıjirinın.

Dı 17.6.1987 serokwezirê Tırkiyê, T. Ozal û serokwezirê Sûriyê A. R. Kesım protokolek ımze kırın derheqa asayışi û hevkariya abori da. Rojnama "Mılliyet" dı 18.7.1987 nıvisand "Sûriya, jı nıha pê ve, wê nema çava dapoşe jı çalakiyên ku dıji Tırkiyê bıbın. Xala No: 1 û No: 4 yên wê protokolê dıyar dıkın, ku Sûriye û Tırkiye jı her ali da wê rê nedın her grûpên ziyankar, ku jı xakê wê here dıji ya hember û wısa ji hev agahdar bıkın jı çalakıyên zıyankariyê ku amade dıbın dıji terefê dın yê wê protokolê û kesên ziyankar dê teslimi hev bıkın. Dı protokolê da wısa ji hatıbû gotın: "Herdu dewlet dı pêşerojê da wê pêwendiyên nav xwe fırehtır bıkın dı warê asayışê û hevkariyê da."

Gelek falên reş derheqa PKK da hatın gotın, ya heri berçav ew bû ku, dawiya wê partiyê hat, yan ji wê bıcarekê kız bıbe. Çunke rêka Sûriyê-Tırkiyê lı pêş wê hate gırtın. Lê "egereke" mezın dı wan falên reş da hatıbû jıbirkırın. Dıvyabû bıhata gotın "eger" Sûriye dı praktik da bıbe pabendê wê protokolê bı hemi naveroka wê ve. Dı vi wari da tıştê balkêş ew bû, ku deshelatiya protokolê tunebû lı Biqaa Lubnanê û jı xwe berpırsyarên Sûri, gava pêwist bû, kampê PKK wê da dıbırın. Dema rojnamevanên Tırk pırsa vê yekê jı A. R. Kesım kırın, wi got, ku lı ser xakê Lubananê hukûmeta wê deshılat e, û rojnamevan ne rast rola Sûriyê lı Lubnanê fam dıkın. Dı meha 12 sala 1987 da Tırkiye bı Sûriyê û İraqê ra peymanek imza kırın, ku ava Ferêt wê bı herıkandıneke lı gor protokolê mı-

Institut kurde de Paris

soger bı awaki qanûni bıghê herdu dewletan.

Lê tevdirên ku Sûri lı ser sinorê xwe û Tırkiyê bı dırêjaya 550 km. pêk anin, lı hesabê Tırkan nehatın, wan dıdit ku wısa hındık e. Turgut Ozal got "rojekê wê Tırkiye ava Ferêt bıgıre, ınca Sûriye wê jı neçari yarmetiyê jı ser PKK bıgıre. Lê Ozal bı xwe ji got, ku qet nexıstiye hesabê xwe avê jı ser Sûri bıbıre, wekû tırs tê fırandın.

Çawa berê, Sûriye disa ne razıye bı wê rewşê, ku Tırkiye dıkare ava Ferêt jı ser bıbıre. Ev rewş berdewam dımine dı pêşeroja Sûri da. Bırina ava Ferêt, mırına hemi bax û baxçe û çandıniyên mayi ne û sıstkırına jêhatibûna kehrebê ye. Ev rewş xetereke berdewam e lı ser Sûri, leşkerê PKK hebe yan nebe. Balans iro dı navbera herdû dewletan da, dı warê hev xeydandınê da berdewam heye.

Jı despêka 1990 rewşa Kurdên Sûriyê hıneki baştır bû. Weke nımûne, dı dema hılbıjartınan da sê bersıvdarê sê partiyên kurdi yên heri bı rûmet, bûn endamê parlemana Sûriyê: "Kemal Ahmed, Hemid Derwêş û Fuad Eliko". Sedema serkevtına van lideran yekitiya karûbarê hersê partiyan bû, ku cemawerê Kurd bı dılxweşi dengê xwe dan wan, jı aliyê di ve, deshelatên Sûri asteng nexıstın hılbıjartınên wan.

Parlamênterên Kurd dı nav endamên parlemanê da naveroka doza kurdi lı Sûriyê roni û şırovekırın, wısa ji dı nav rewşenbir û rojnamevanan û endamên bersıvdar yên partiyên sıyasi yên erebi de ji.

Bı awaki rêk û roni, bı nıvisandın faktên xubna Kurdan, sıtembariya wan û encamên zulma netewi, wan parlamenterên Kurd berçav kırın, xwestın wê nehêlın û wekheviya mafên mırov lı welat bête danin. Sersala 1994 Hemid Derwêş got, ku bı saya wê jı hev fêmkırınê û hev lı berxıstınê, gelek parlamênterê Ereb ji êdi naverok doza kurdi fêmkırın

Institut kurde de Paris

û pıjırandın, û xwestın, ku encamên wê politikê dı jina Sûriyê da neminın.[13]

Dı destpêka sala 1994 da çarçıva hevkariya dêmokratiya Kurd lı Sûriyê (HDKS) fırehtır bû. Partiya Dêmokrata Pêşverû ya Kurd (Sûriya) PDÇKS kete nav hêzên "Tehalufê". Ev parti dı welat da xudan rûmet e. Bı vê hoyê dı Beyannameya HDKS, dı 14.1 1994 wısa hatıbû gotın: "HDKS, angori hêvi û xwesteka gelê Kurd û hêzên wi yên netewi û mina rêxıstıneke dêmokratik ya gelê Kurd, tevi û bızava wi ya netewi lı Sûriyê, dı maweya du sala da hevkarıyek dostane gırewkır dı navbera hêzên wi da, hoyên hevbaweriyê peydakırın dı xebata Kurd ya netewi da, û bı wi awayi dıkarıbû wê rewşa parçetiyê jı holê hıline. Xêrxwaziya HDKS û PDÇKS ew gıhandın serkevtın û hevfêmkırıneke tam. Dı encamê de bı bıryara herdû terefan beyanname, derheqa hevkariya wan hate weşandın. Ewê dı çarçıva "tehalufê" da mıl lı mılên hev xebata xwe bıkın. HDKS bıryar dıde, ku wê xebata xwe berdewam bıke jı bo pêkanina mafên qanûni yên gelê Kurd lı Sûriyê, jı bo bıhêzkırına yekitiya netewi lı welat hemi, jı bo wekheviyê, dadê, dêmokratiyê û aştiyê".[14]

Dêmek, jı destpêka salê 90, dı politika hukûmeta H. Esed da xuya dıke, ku nermayi û pıjırandına çalakiyên liderê Kurdan peyda bûye. Sedemê heri berçav ew e, ku hukûmeta Sûriyê, tu xeterê jı bızava Kurdên xwe nabine. Lê ne tenê wısa, ew naxwaze hoseyekê jı xwe ra peyda bıke dı pırsa Kurdên Sûri da, bı taybeti dı bın bandoriya hêzın dereke. Dı eynê demê da hukûmeta Sûriyê naxwaze ku rewşa Kurdên İraqê bıbe nımûne jı yên Sûriyê ra.

4. 2 1994 lı Stembolê cıvina wezirên derve yên Tırkiyê, İranê û Sûriyê çêbû, mebest; taqikırına rewşa Kurdıstana Başûr bû, pışti ku lı wır perlaman û serpereştiya federe dest-



Institut kurde de Paris

pêkırın. Wezıran gotın, erê, rewşa Kurdıstana İraqê bandoriyeke nêgativ lı emn û hêmıniya welatên wan ji kıriye. Helwesta dıji parçekırına İraqê pêşandan, û bı wê yekê rawestin dıji parçekırına welatê xwe ji lı gor berjewendiyên Kurd, yan her mılleteki diger". Dêmek politika Sûriyê eşkere ma wısa: rê nede, ku Kurd bıgıhê hiç mafi û Kurdan jı bo politika xwe bıkarbine.


1. "Teriq El - Şeeb" 1981, No:109.
2. "Dirasat İştırakiye" 1985, No:11.
3. "Waşington Post" 7.10.1982.
4. "Waşington post" 8.12 1983.
5. "Seyyad", gulan, 1985.
6. "Midl ist"1988, cotmeh - oktobr.
7. "Seda Kurdıstan" 1984. Êlûn.
8. "Teriq El - Hurriye", 1985 êlûn.
9. "Teriq El- Hurriye", 1985 gulan.
10. "Beyan El - Cebhe El - Kurdıstaniye El İraqiye", 1988, Gulan.
11. "Midl ist", 1988. cotmeh - oktobr.
12. "Exbar Kurdıstan", 15. 9 1988.
13. "El - Dêmokrati", 1944, No: 242. cılle - yanayêr.
14. Lı wır ji.


Institut kurde de Paris

## Paşgotın

Pêvajoyên politiki yên dûrbûyi lı Kurdıstana nûdemi dıbın maddeke hêja jı mêjiyên xurek ra. Beri her tışti tê bira mırov; gelo ev ne anarşiyeke diroki ye, gava mılletek hejmara wi bı milyonan be, xwûdan çandeke serbıxwe û dewlemendtırin teqalidên xebata azadixwaza netewi wusa bêmaf bımine. Doza kurdi ya netewi hê dımine faktorê sereke dı rewşa hundur û ya derveyi dewletên ku Kurdıstan lıhev parvekırıne û her wusa ji, welatên herêmê bı awaki gışti. Lewra ji bı hêsani mırov dıkare bıbine, ku programeke jı bo normalizekırına rewşa sıyasi, cıvaki-abori ya welatên ku Kurd parçe kırıne, hê bêhtır, jı bo hêminiya welatên Rojhılata Nêzik û Navin dı praktikê da ısbat bûye ku ne mumkın e bê çareserkırına doza kurdi, ango çareserkırına wê doza ezeli, ne tenha lıgor berjewendiya gelê Kurd e, lê ya hemi dewletên herêmê û cihanê ye ji.

Ev fêmkırına heqiqeti, çendi hêdi-hedi û nehêsan e, lê rê jı xwe ra vedıke. Mebasta me ew e; rewşa Kurdên İraqê ya netewi-qanûni û hın nişanên helwesta rêali ku van salên paşin çend rêberên fermi yên Tırkiyê dı pırsa kurdi da eşkere kırın (Rehmetiyê T. Ozal û d.).

Eger mırov dina xwe bıde pêşeroka vê doza ezeli û berdewam, bêguman dê bêje, ku bı darê zorê çareser nabe.

Institut kurde de Paris

Çawa dı praktikê da xuya bû, ku ne sıtemkariyên çarhawêr dıji Kurd, ne aware û koçkırına cemaweri û ne ji gênosida hov pırsa kurdi jı holê nehılanin. Dêmek, rêça heri rast û rêal bo çarserkırına vê dozê ew e; lıhevhatıneke dadewer û dêmokratik.

Bı vi awayi dı rojeva geşebûna nûdemi da pırsa netewi ya gelê Kurd jı berê va aktueltır dıbe. Û ev pêvajo gıhaştiye dereceke wusa, ku hukûmetên van welatan êdi nema dıkarın xwe jê bêdeng bıkın. Gıring e em bêjın, ku bûyerên rûdıdın ne lı ser qada Kurdıstanê ji bandori ya wan lı bızava netewi ya Kurd dıbe. Mina pêvajoya mezın, bı nav serxwebûna mılletên YSS (YSSR), bûyerên dırami lı Yûgoslavya berê. Û ev mıllet û netewe dıghên, ya gıhaştın hebûna xwe ya serbest. Gelek xoyên etni dı Rusya Fêdêre da qazancên mezın wergırtın dı vi wari da.

Ev hemi jı bıni ve hıldıweşının himê wê sıyaseta bêrûmet, du standarti ku hın dewlet "yên mezın ji" dı praktika cihani da bıkartinın.

Bı rasti ji, gelo bı çı mentıqi prinsipê parastına hukûmeta sinorên dewleti dıbe têza guftogoyê dema peyv dıbe derheqa Sovyêt yan Yûgoslavya, lê dıbe tışteki piroz û dûredest, dema pırsa Kurd û Kurdıstanê tê ser zman?

Heqiqeteke jineweri kevnar heye: Çı pırs dıbe, bıre bıbe, lê çareser dıbe tenha wê demê, kengi rast çareser bıbe.

Ne tenha berjewendiya gelê Kurd, lê ya hêmıniya Rojhılata Nêzik û Navin û xêrûbêra geşebûna aşıti ya gelên herêmên tevan dıxwaze, ku pırsa kurdi bı awaki dademeni û aşıti çareser bıbe.

Dıyar e ku pırsa kurdi êdi berdewam, dıbe pırseke navnetewi û lı gor ciwarbûna hêzan lı ser meydana cihani dûr nine

Institut kurde de Paris

rewşek wusa peyda bıbe, ku paranıvisa pırsa Kurd ya netewi bı xwe ra bine.

Çendi rewşa gelê Kurd zor dıjware ji, lê hêviyên geş hene dı paşeroja xebata wi ya azadixwaz da. Û ew hêvi lı ser du faktoran ava dıbe:

a) Lı Kurdıstanê û lı nav Kurdên penaber rama parenıvisa netewi berdewam fırehtır û kûrtır dıbe. Cemawerên kurd bı hemi awayên xwe ve bı vi rûhi perwerde bûne. Û ev êdi bûye hêzeke wusa, ku dıkare gelek guhertınên mezın bıke.

b) Pırsa Kurd êdi cıheki mezın dıgre dı "sıyaseta mezın" da. Û çendi ku cıyê şayıste û layıqê kurdi hê nehatiye dayin, lê lebat ketiye vi beri û mırov hêvi dıke, ku berê geşebûna vê rewşê ketiye xêrê.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Dı vê pırtûkê da gotarên zanyarên Rus û Kurd cih dıgrın; bı gotıneke dın ew, berhevokek e. Ilmdarên wek *M. S. Lazarêv, Şekıro X. Mıhoyi, M. A. Hasratyan, O. İ. Jigalina* û *A. H. Bagirov,* dı gotarên xwe da, bı çaveki ılmi problemên tevgera netewiya Kurd a nûdemi analiz dıkın; bir û baweriyên xwe dı vê derheqê da tinın holê.

Gotarên ku dı vê pırtûkê da cih dıgrın, berê bı zmanê Rusi hatıye amadekırın û dı nav weşanên Navenda Lêkolinên Kurdi da hatıye çapkırın. Û paşê ji hatıye vergerandın. Em ji vergera wan a zmanê kurdi çapdıkın.

**Weşanên Roja Nû**

Institut Kurde de Paris
IKPLIV107757